# DÎROK

# AMEDAYÎ

# 2

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya dîrokê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

NAVEROK


## BEŞA YEKEM........................................7

ISKENDER ........................................8
HELENÎZIM ........................................12
ROMA ........................................16
ROMA Û BERXWEDANA GELAN (1) ........................................20
ROMA Û BERXWEDANA GELAN (2) ........................................23
IMPERATORIYA SASANÎ (226-651 P.Z.) ........................................32
SERHILDANA MAZDEK ........................................37

## BEŞA DUYEM ........................................41

DEMA ISLAMÊ ........................................42
DEMA ÇAR XELÎFEYAN ........................................48
DERBASBÛNA ISLAMÊ YA NAVA KURDISTANÊ.........53
DEMA EMEWIYAN (661- 750) ........................................57
DEMA EBASIYAN (750-1258) ........................................62
EBÛ MUSLIMÊ XURESANÎ........................................67

## BEŞA SÊYEM ........................................71

TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (1) ........................................72
TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (2) ........................................76
TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (3) ........................................80
MÎRNIŞÎNÊN KURD (1)........................................83
MÎRNIŞÎNÊN KURD (2)........................................88
MÎRNIŞÎNÊN KURD (3)........................................92

## BEŞA ÇAREM........................................95

IMPERATORIYA SELÇÛQÎ........................................96
SEFERÊN XAÇPERESTAN ........................................102
DAGIRKERIYA MOXOLAN........................................108
SERDEMA OSMANIYAN ........................................114

SERHILDANÊN GEL LI HEMBER OSMANIYAN .......... 118
DEWLETA SEFEWÎ ............................................................ 122
ŞERÊN SEFEWÎ Û OSMANIYAN ..................................... 127
IDRÎSÊ BEDLÎSÎ Û BERBELAVBÛNA OSMANÎ DI KURDISTANÊ DE ................................................................ 133
SERHILDANA KELEHA DIMDIMÊ.................................. 137
PEYMANA QESRA ŞÊRÎN ................................................ 142
Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê .146

# BEŞA YEKEM

- ISKENDER
- HELENÎZIM
- ROMA
- ROMA Û BERXWEDANA GELAN (1)
- ROMA Û BERXWEDANA GELAN (2)
- ROMA Û BERXWEDANA GELAN (3)
- ÎMPARATORIYA SASANÎ
- SERHILDANA MAZDEK

WANE 1

# ISKENDER

## Rewşa Yûnanistanê Beriya Serweriya Mekdonyayê:

Beriya ku Mekdoniyayê desthiladariya xwe li ser Yewnanistanê ava bike, bajar dewletokên sereke yên Yewnanistanê (Esîna, Tîba, Isparta) di nava şer û pevçûnên desthiladariyê de bûn. Her bajarekî dixwest xwe wekî hêza herî xurt bide xuyakirin, hem ji bo aboriyê û ramiyariyê di destê xwe de kom bike, hem jî ji bo pêşengtiya netewa Yewnanî di şerên çarenûsî de li dijî dijminê derveyî, bike.

Lê tu bajar di van şeran de bi ser neket û rewşa ramiyarî, aborî û civakî xerabtir kirin. Vê rewşê hişt ku bajar dewletokên sereke lewaz bibin û hêzeke herêmî weke mekdoniyayê derkeve holê.

## Fîlîpê Mekedonî:

Ev pêvajoya bihêzbûnê ya Mekdonyayê bi Fîlîpê duyemîn re dest pê dike. Taybetmendî û serpêhatiyên ku Fîlîp têre derbas bûye (359B.Z) di temenê 20 salî de ew gihand textê desthiladariyê. Dema ku desthiladarî di destê xwe de girt, rewşa Mekedoniyayê ya hundirîn sererast kir, saziyên leşkerî ji nû ve bi rêxistin kirin û sîstema birêvebirina ramiyarî û aborî kir navendî. Bi vî awayî Fîlîp Mekedoniya ji dewletokeke lewaz kir dewleteke bihêz ku bikaribe serweriya Yewnanistanê bike.

Piştre Fîlîp bajar dewletokên yewnanistanê vexwendin kongireya Korinsiya ya ku bi armanca yekîtiya ramiyariya yewnanistanê hate lidarxistin. Di kongireyê de hevpeymana Helenî hate damezirandin û fîlîp weke serokê wê hate hilbijartin. Bi vî awayî Fîlîp yekîtiya Yewnanistanê pêk tîne û di sala 338 anB.Z de bajarên hevpeymanê vedixwîne civînekê ji

bo giftûgokirina kampaniyeke leşkerî li dijî Rojhilat. Lê pirojeya Fîlîp di dema wî de pêk nehat ji ber ku di sala 336an B.Z de li ser destê efserekî xwe hat kuştin. Piştî kuştina Fîlîp kurê wî Iskender cihê bavê xwe digire û pirojeya wî berdewam dike.

## Iskenderê Mezin:

Iskender di nîvê havîna 356an B.Z de li bajarê Bêla paytexta mekedoniyayê ji dayik bûye. Di temenê 13 salî de Arîsto dibe mamosteyê wî. Nêrîna Aristo ya ji bo netewên derveyî Yewnanê, cihê xwe di hizir û bîra Iskender de digire. Arîsto, ji bo gelên Rojhilatê digot: "Tiral û gêj in". Girêdayî wê, gotibû: "Pêwîst e ev netew, weke moriyan bên perçiqandin". Tevî ku dema Fîlîp hat kuştin temenê Iskender 20 salî bû, lê belê dikarîbû pêşengtiya Şanşîna ku bavê wî damezirandibû, bike. Dema bavê wî hate kuştin bajarên ku di bin desthiladariya Mekdoniya de bûn bi raperînan rabûn da ku xwe rizgar bikin, lê Iskender ev raperîn kontrol kirin û bajarê Tîba talan û wêran kir. Piştre bi ser Sûrye û Filistînê ve diçe û berê xwe dide Misrê. Dema van welatan bi dest dixe, berê xwe dide axa Persan. Di sala 331'ê B.Z de, Darîusê Sêyem di şerê Gawgemêla de dişkîne û dawî li Imperatoriya Persê tîne. Berê xwe dide Persepolisê (Şîraza îro) û wê deverê jî, dixe bin destê xwe. Piştre berê xwe dide Hindistanê û wê dixe bin destê xwe, dema vedigere Yewnanê li Babilê di sala 323 yê B.Z de weke ku hin jêder dibêjin bi tayê dimire. Di navbera fermandarên wî de şerên desthiladariyê çêdibe nêzî çil salî ev şer berdewam dike û di encamê de Imperatoriya Iskender dibe çar beş:

1. Yewnan û Makdoniya dikevin destê xanedaniya Antîgonos.
2. Anatoliya dikeve bin xanedana Atalît ku navenda wê Bergama ye.

3. Misir û derdora wê dikeve destê Patlîmos(Ptolemaîos) navenda wê Iskenderiyê ye.
4. Mezopotamiya û Asya jî dikevin destê Selefkos a ku navenda wê Entakiya ye.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Rewşa Yewnanistanê beriya serweriya Mekdoniyayê, şîrove bike.
2. Fîlîp çawa Mekdoniyayê bi hêz dike?
3. Piştî mirina Iskender imperatorî çawa dabeş dibe?

**Lêkolîn:**

Hevpeymana Helenî, lêkolîn bike.

WANE 2

# HELENÎZIM

Dema Iskender berê xwe dide Rojhilat, di nava artêşa wî de pir zaniyar, wêjevan, fîlosof, dîroknas, erdnîgarînas, wênesaz û endizyarên Yewnanistanê hebûn.

Iskender pir bi çanda rojhilatê bandor dibe. Êdî nerînên mamosteyê xwe Arîsto vala derdixe û digihêje baweriyekê ku gelê Rojhilat ne tiral û gêj in, lê xwediyê çandeke dewlemend in, ji ber vê yekê Sentezeke çandî nû ava dike bi dehhezaran leşkerên Yewnanan bi jinên Rojhilat ve dide zewicandin.

Ev senteza çandî weke Helenîst (hevîra çanda Rojhilat û Rojavayê), rave dike. Di salên 330 -150 yê B.Z de, bibandor bû. Tevahî Rojhilat di van salan de ket bin bandora Helenîstê de. Ev nêzîkatî muhra xwe li avahî, huner, wêje, felsefe, dîrok zanist, astronomî û hwd xist û bi navê Helenîstê, tê nasîn.

## Avahîsazî û belavbûna çanda Helenîstî:

Dema Iskender êrîşî Rojhilat dike û dagir dike guhertinên kokî di civak û bajarên wê de çêdibin. Iskender dixwest Rojhilat û Rojava bi hev û dû ve girê bide. Ji bo vê pirojeyê bi ser bixe, pêşî giringî da hevjîniya di navbera Grek û welatiyên resen de. Piştre mêtingeh ava kirin ta ku bibin jêdera çavkaniya şaristaniya Grêkê. Bi vî awayî Iskender nêzî 70 bajarî li gorî terzê Yewnanî li Rojhilat da avakirin. Di van bajaran de gelê Rojhilat û Rojava têkil dibûn û bi hemû aliyên xwe yên zanistî, civakî, aborî û wêjeyî dibûn Helenistî. Selefkosiyan jî li ser heman terzî meşiyan Selefkosê yekem gelek bajar li gorî terzê Yewnanî ava kirin (**7 bajar bi navê Selokiya, 16 bi navê Entakiya, 3 bi navê Efamiya û 5 bi navê Latakiya)**

## Xanedaniya Partê:

Partan di salên 249 ê B.Z û 228 ê Z de, li Îran, Mezopotamya, Anatolya û li Rojhilata Navîn, pêşengî kirine.

Part bi koka xwe ji netewên Aryen in. Berxwedaniya Partan li Îranê, herêma Xorasanê li pêş dikeve û êla Arşakan pêşengiya vê berxwedanê dike. Li dijî dagirkirina Qraliyeta Selefkosan a ku dagirkerî û koletî li ser civakan dabû sepandin, Êlên Arşakan bi şêweyê konfederasyona êlan xwe birêxistin dikin. Li ser bingehê vê sazûmaniyê, li dijî Selefkosan têkoşînê dikin û wan ji herêmê derdixin. Taybetmendiya êlan ew e ku li himberî metirsiyên ji derve xwe bi rêxistin dikin. Lê piştî metirsî ji holê radibe, an ew rêxistin belav dibe an jî digihêje asta navendîbûnê. Êlên ku li himber Selefkosan li ber xwe dan û bi ser ketin û piştî ku metirsî ji holê rakirin, xanedaniyek navendî ya bi navê part ava kirin.

Partan sîstema rêveberiya Selefkosan bingeh girtibû. Imperetoriya wan li ser mîrnişînan hatibû belavkirin, her mîrenişînek, mîrekî ku ji hêla qiral hatiye erkdarkirin, bi rê ve dibir. Tevî ku Partî tevlî gelên cûda bibûn û bandora şaristaniyên Rojhilat û Helenistî li wan bibû, lê belê kevneşopiyên xwe yên koçerî mîna siwarçakî, malbatperestî, êlperestî, nêçîrvanî û şer, parastin. Zimanê wan Pehlewî bû ku bi nivîsa Aramî dinivîsandin û ev zarava nêzî Pehlewiya Sasanî bû, artêşeke fermî ya Partan tune bû. Her beşek artêşeke wan ku bi giranî ji siwaran pêk dihat hebû û dema ku şer diqewimîn diketin bin xizmeta qiral de. Part ji bo ku giringiya paytexta Selefkosî ya kevin ji holê rakin, hin bajarên nû ava kirin mîna Tîsfûn, Olgaşiya nêzî Babilê û bajarê Elheder ji bo parastina rêya di navbera Babil û Nisêbînê de. Her wiha Ekbetan weke paytexta werzê zivistanê hilbijartibûn. Her wiha ji bo ku

veguhestina bazirganî bi azadî çêbibe aşîtî û aramî armanc girtibûn. Êdî gelek pere di rêya bac, ciziye û gumrikan re kom dikirin. Lê rêyên bazirganiyê yên Kevana Zêrîn bûn sedema şer û pevçûnên dijwar di navbera wan û Romayê de. Ji ber ku Romayê armanc kiribû ku vê herêmê dagir bike. Êdî xanedaniya Partan ji ber van şeran ji hêz dikeve û di sala 228 an Z de ji aliyê xanedaniya Sasaniyan ve tê hilweşandin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Helenîzim çi ye?
2. Ji bo ku Iskender çanda Rojhilat û Rojava bike yek, çi dike?
3. Şêweyê avakirina xanedaniya partan destpêkê çawa bû û piştre çi guherîn pê re çêbûn?

**Lêkolîn:**

Navê bajarên ku Selfkosan ava kiribûn ji ku ve tên? Hewil bide ku tu li ser nexşeyê diyar bike.

WANE 3

# ROMA

## Avabûna Romayê:

Bilindbûn û mezinbûna Roma, bingehê xwe ji konfederasyona Etrûskên ku ji 12 herêman pêk dihat digire. Di heman demê de ji çanda Neolîtîkê ya ku gihîştiye van deran û gelên ku bi koka xwe latînî ne, di sala 1000’î B.Z de, di karanîna hesin de pispor bûne. Etrûskî, bi rêya Anatolyayê berhemên Mezopotamya anîne Romayê. Çavkaniya ku Roma tîmar dike Etrûskî ne.

Li milê başûr Heleniyan Mêtingehên xwe ava kirine û rewşeke nû li Anatolya Rojava jî ava kirine. Li van deran bajarên dewletok ava kirine. Di milê aborî, bazirganî, çandî û bîrdozî de, desthilatiyek dane çêkirin. Di milê başûr de Qraliyeta Sîrakûza û di milê bakur de li Efrîqayê şaristaniya Qertacayê ku koka xwe ji Fenîkiyan digirt, dema xwe ya herî pêşketî jiyaye. Bandorên şaristaniyên Rojhilata Navîn hemû bi van rêyan dikevin nava çanda Roma û Roma li ser van heyîn û hebûnan, pergala xwe dide avakirin.



Imperatoriya Romayê di sê serdeman re derbas dibe:

## 1. Dema Şanişînê (753-510) B.Z:

Li gorî lêkolîn û nêrînên heyî diyar dikin ku di sala 1000 ê B.Z de, êlên bi navê Albayî ji stemkariya Etrûskan direvin û ji bo ku xwe biparêzin, Romayê ava dikin. Albayî piraniya xwe êlên koçer in ên ku bi lawirvaniyê ve mijûl dibin. Ji bo vê jî, dibêjin ku "Şivanan Roma ava kiriye". Piştre Etrûsk bi Albayan re şer dikin û Romayê ji destên wan derdixin. Etrûsk, Romayê li gorî têgihiştina xwe ava dikin. Li ser wan hîman jî, rêveberiyê didin avakirin. Lê, bi demê re Etrûsk lewaz dibin û Romayî bajêr digirin destê xwe. Piştî birêveberî dikeve destê Romayê, ji derveyî Etrûskiyan, pergaleke din didin rûniştandin. Di dema Etrûskan de birêverbirina Romayê bi pergala şanişînê tê meşandin.

## 2. Dema Komarê (510- 27) B.Z:

Bi demê re di şanişîna Romayê de perleman û encumenên gel jî ava dibin. Bi vî şêweyî bingehê komarê ava dikin. Dema ku komara Romayê tê avakirin, ev komar hemû gelan nagire nava xwe. Ev komar mirovên feqîr û belengaz ango çîna jêr a bindest nedigirt nava xwe. Ji van civakan re, Pleb dihat gotin. Weke hemwelatî li wan nedihate nêrîn.

Ev bêmafiya ku dihat kirin, rê li ber nerazîbûn û serhildanên Pleban vedikir. Pleb ji bo ku Roma baştir û demokratir were birêvebirin, têkoşînên pir mezin dan meşandin, tam negihîştibin encamên xwe jî, lê bi demê re hinek guherîn hatin çêkirin. Mînak: Di salên 450 yê B.Z de, zagonên "12 tablêtan" hatin avakirin. Ev zagon ji bo hemû hemwelatiyan bûn. Têkoşîn û berxwedana Pleban ji bo civakên demokratîk, gaveke bingehîn bû.

## 3. Dema Imperatoriyê 27 B.Z – 395 Z:

Komara Romayê roj bi roj mezin dibe û ber bi imperatoriyeke mezin ve diçe. Di sala 27`an B.Z de imperatoriya Romayê bi birêveberiya Oktafiyos (Agustus) hat damezrandin.

Di dawiya sedsalên berî zayînê de Yolyos Sêzer êrîşên xwe li ser Galya (Fransa), Rojhilatê Deryaya Spî û Anatolyayê ber bi dawiyê ve dibe û Misr dikeve bin desthilatdariya Romayê. Misr, weke herêmekê bi Romayê ve tê girêdan. Roma piştî demekê û bi şûn de, ji komarê derbasî imperatoriyê dibe.

Di sedsala 4`an de imperatorî dibe du perçe, parçeyê Rojava yê ku paytexta wê Roma ye (di sala 476`an de dikeve bin destê Almanan) û parçeyê Rojhilatê (Bîzans) ê ku paytexta wê bû Konstantîn ( Istanbola îro) di sala 1453`an de dikeve bin destê Osmaniyan de.

## Giringiya Danasîna Çanda Romayê:

1. lûtikeya şaristaniya koledar e.
2. Di warê berfirehî û kûrahiya çanda imperatoriyê de nûnerê herî mezin e.
3. Nûrertiya herî bi hêz ya sîstema qiral- xweda dike. Tu kesî xwe him mirov û him jî xweda bi qasî imperatorên Romayê nehesibandiye.
4. Welatîbûn û hiqûq bi komên mirovan dane naskirin.
5. Imperatoriya ku cara yekemîn rê li welatîbûyîna cîhanê ya navnetewî û pêve girêdayî rê li ber ola cîhanî ya Xiristiyaniyê vekiriye.
6. Şefeq û serê pira şaristaniya Ewrûpaya mezin e.
7. Demeke dirêj weke komar hebûna xwe dewam kiriye.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Pergala Romayê ji kîjan şaristaniyan sûd wergirtiye?
2. Kê Roma ava kiriye?
3. Çima peleb bi serhildanan rabûn?
4. Giringiya danasîna çanda Romayê bîne ziman.

**Lêkolîn:**

Roma di sê sîstemên bingehîn re derbas dibe, lê ev sîstem tu carî nabe bersiva civakan, çima?

WANE 4

# ROMA Û BERXWEDANA GELAN (1)

Li hemberî çewisandinên giran ên imperatoriya Romayê, li gelek deveran nerazîbûn, serhildan û berxwedanên gelan dest pê kirin. Beşek ji van berxwedanan ên koleyan e, beşek berxwedanên olî ne, beşek yê êlan û beşek din jî ya jinê ye.

## 1. Berxwedana Koleyan:

Di dema Imperatoriya Romayê de, mirov ji hemû deverên ku Romanan dagir kiribûn, dihatin dîlgirtin û ji bo xwe mîna koleyan bi kar tanîn. Ev kole di hemû karên giran de weke lawiran dihatin bikaranîn û li bazaran dihatin firotin.

Kole di kanzekariyê, pîşesaziyê, firneyan, çêkirina seramîkan û têkistîlê de, dihatin bikaranîn. Van koleyan rehetî neditîtin û her dem di bin lêdanê de bûn ta ku ji hêz diketin. Jiyana koleyên ku di çandiniyê û karên cûda de dihatin bikaranîn jî ji ya lawiran ne dûr bû. Bi hesinekî ku li ser agir hatiye sorkirin dihatin daxdan da ku bibe sembola naskirinê. Ji ber vê zordestiya zêde û hovane li seranserî Romayê gelek serhildanên koleyan ku azadiya civakî armanc girtibûn, hatin lidarxistin. Serhildana destpêkê di sala 198 an B.Z de ji mêtingeha Romayî Sîtiyayê rabû. Ev mêtingeh navenda dîlgirtiyên Qertaciyên malmezin û erîstokras bû. Rewşa jiyana wan pir xerab û tijî êş û azar bû. Ji ber vê yekê serhildanek li dijî serdestên xwe li dar xistin. Lê ji ber îxanet û sîxuriya ku hin kesan ji wan dikirin hewildana wan bi ser neket. Di sala 196 an B.Z de serhildaneke din li Etroriyayê hat lidarxistin. Vê serhildanê artêşek çêkir, lê serfermandarên Romayî ew di şerekî fermî de têk birin. Piraniya koleyan hatin kuştin, hin hatin çarmîxkirin, hin li serdestên wan hatin vegerandin û hin jî avêtin zindanê. Her wiha gelek serhildanên

din jî çêbûn, lê ya herî mezin ku navê xwe li dîrokê daye serhildana koleyan ya bi pêşengtiya Spartakos e.

## Serhildana Spartakos:

Di derbarê jiyana wî de beriya serhildanê agahiyên misoger tune ne. Hin jêder dibêjin ku ji biçûkaniya xwe ve, di dibistanên koleyan de mezin dibe û dibe zoranbazek, jêderên din jî dibêjin ku di artêşa Romayê de fermandarek bû, ji artêşê direve lê tê dîlgirtin û kolekirin, hin jêder jî dibêjin Trakyayî ye li himber dagirkeriya Romayê şer kiriye û hatiye girtin. Lê ya tekez ew e ku zoranbazek bû.

Di sala 73 yê B.Z de nêzî 70 koleyî ji dibistana Kabwa li derdora xwe birêxistin dike û dest bi serhildanê dike. Piştî ku cihê xwe di çiyayekî girtin gelek koleyên trakyayî, Sêltî û Cermanî ku di zeviyan de dihatin bikaranîn tevlî wan bûn. Van koleyan du kampaniyên ku senato bi ser wan de şandibûn têk birin. Êdî Ev serhildan belavî hemû deverên imperatoriyê dibe û hejmara wan zêde dibe ta ku dighêje 70,000 serhildêrî. Lê artêşa mezin bi serpereştiya Markos Lîkînyos bi ser wan de çû û serhildan ji holê rakir. Di şer de Spartakos tê kuştin û bi hezaran kole tên çarmîxkirin û bi vê şêwaza hovane, dawî li serhildanê tê.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Sedemên serhildanên koleyan li dijî Imperatoriya Romayê, bîne ziman.
2. Serhildana koleyan ya herî mezin kîjan bû û çawa berbelav dibe?

**Lêkolîn:**

Serhildaneke koleyan ji bilî yên di mijarê de, lêkolîn bike.

WANE 5

# ROMA Û BERXWEDANA GELAN (2)

## Berxwedana Zenûbiyayê:

Zenûbiya qiralîçeya Palmêrayê ye. Destpêkê bi hevjînê xwe Ûzeyna re serhildanek li dijî pergala Romayê li dar xist û tevahî Sûriyeyê xist bin kontrola xwe. Zenûbiya bi zîrekbûn û zanebûna xwe navdar bû. Di dema hevjînê xwe de wekî birêveber, pê re kar dike. Piştî ku hevjînê wê tê kuştin, şanişîna Palmêrayê ket destê wê. Li Sûriye, Misir û Asyaya navîn serwer dibe, bi awayekî berfireh çavdêriya xwe li tevahî herêmê dike. Imperatoriya Romayê vê berfirehbûnê weke metirsiyekê li ser hebûna xwe dibîne û artêşan dişîne ser şanişîna Zenûbiyayê û gelek şer di nava wan de diqewimin, heta ku imperatorê Romayê Orilyan Palmêra dorpêç kir, serhildana Zenûbiyayê têk bir û ew dîl girt. Dema ku tê dîlgirtin û di Qefesê de ta Romayê dibin. Hin jêder dibêjin ku di rê de jarê vedixwe û jiyana xwe bi dawî dike û hin jêder jî dibêjin ku dema li Romayê tê dadgehkirin şûrê leşkerekî jê distîne û xwe dikuje. Herdu jêder jî heman ramanê didin ku wê xweradestkirin nepejirand û xwe kuşt. Tê gotin ku Zenûbiya berî jiyana xwe ji dest bide wiha gotiye "Piştî ku Romayê welatê min dagir kir û xira kir wateya jiyanê nemaye, mirovê ku bêwelat, bêgel û dîlgirtî jiyan bike, mirineke bi rûmet ji xwe re hilbijêre wê çêtir be".

## Berxwedana Hz. Îsa:

Hz. Îsa, yek ji endamên terîqeta Eseniyan e. Di baweriya vê terîqetê de hemû mirov wekhev in. Koletî û cariyetiyê napejirîne. Kole û efendiyên wan, wekhev dipejirand û bi zanabûna cemaetê ve hatibûn birêxistinkirin. Ji ber sedema girîngîdayîna exlaqê civakî; dilnepakiya herî biçûk jî seza

dikirin. Dema ku kesekî bixwesta bibe endam, du salan di bin çavdêriyê de dihiştin û di ezmûnên cur bi cur re derbas dikirin. Li ser çêkera bingeha baweriya “hezkirina yahwe” bê dawîbûna giyan û baweriya axretê hatibûn avakirin. Ji ber ku Eseniyan bawer dikirin ku dilpakî; bi hizûr û aramiyê ve belav dibe. Ji ber vê yekê, li hemberî şer û gengeşiyan bûn.

Derketina Hz. Îsa, bêyî ku sînoran ji bo xwe nas bike, berteka hevbeş a hemû beşên civakê da der. Bi rastî, imperatoriya Romayê di serdema xwe de imperatoriya herî mezin e, ya ku hema bêje belavî sê parzemînên cîhanê bûye. Li gorî xwe desthilatdariya cîhanê dikir û her kes koleyê Romayê bû. Hemû beşên civakê yên ku zirar ji pergala Romayê didîtin, bi Romayê re di nava nakokiyan de bûn û hêviyeke wan ji Mesîhê rizgarker hebû. Di wê demê de Hz. Îsa weke rizgarker, di dîrokê de cihê xwe girt. Tişta ku ew mezin kiriye jî, dijberiya pergal û mercên dîrokî bûn. Hz. Îsa, li hemberî koletiya gerdûnî ya Romayê, bi şêweyekî navneteweyî (enternasyonel) ku karibe bi gerdûnê re pirsgirêkên hemû mirovan çare bike, ketibû ser rê.
Ola Hz. Îsa ronî nedît Lê piştî mirina wî, di rêya Hewariyên (navê şagirtên Hz. Îsa) wî de belav bû. Ji ber ku ola Hz. Îsa di nava civaka Romayê de belav bibû, imperatorî neçar ma ku bipejirîne. Bi vî awayî imperator Qestentîn, di sala 312`an de, bi fermana Mîlano xiristiyanîtî weke ola fermî ya imperatoriyê ragihand. Lê dema ku pejirand, li ser bingehê berjewendiyên desthilatdariya xwe pejirand.

## Berxwedana Qartaciyan (Hanîbal) 247-182 B.Z:

Hanîbal serfermandarekî Qartaciyan e ku bi koka xwe vedigere Fînîkiyên resen. Teknîkên ku wî bi kar anîne ta roja me ya îro weke hunera leşkerî tên zanîn û di vî aliyî de weke zanyarekî tê pejrandin.

Pir dîroknasan Hanîbal weke "kabûsa Romayê" bi nav dikir ji ber ku tirsa wî gihiştibû astekê ku di nava romayîyan de bê gotin ku " Hanîbal li ber deriyê me ye".

Di dema bavê Hanîbal de, gelek êrîşên roma li ser axa Qartacayê çêdibin. Ji ber vê yekê, tê gotin ku bi "hêrsa tolhildanê" bavê Hanîbal ew mezin kir da ku bersiva romayîyan bide.

Dema ku Hanîbal dikeve şûna bavê xwe, romayê dixwest desthiladariya xwe li ser gel û herêmên derdora xwe ava bike. Lê Hanîbal li himber vê yekê bê bersiv nema. Cara pêşî bi 9 hezar leşkerî kete rê û ber bi Pîrenê û bakurê Ispaniyayê ve diçe û ew dever kirin bin kontrola xwe de.

Piştre çiyayên Elb derbas dike û digihêje xaka Îtaliyayê û artêşa Romayê dixe rewşeke wiha ku ji hemû aliyan ve bi qertaciyan dorpêçkirî be. Piştî dorpêçeke zêdetirî 15 salan û şerên giran di navbera artêşa Qartaciyan û Romayê de ku Hanîbal di hemûyan de bi ser ket, lê Hanîbal derbasî bajarê Romayê nebû ji ber ku artêşa romayê êrîşê bakurê Efrîqayê kir û di şerê Zamba de Iskîbyoyê Efrîkî artêşa Hanîbal bi bin xist, êdî Hanîbal tê sorgun kirin û li gel selûfkosan û piştre li Ermîniyayê bi cih dibe. Lê piştî demekê xinizî lê dibe û dikeve destê Romayê de, lê ji bo ku hesab jê neyê xwestin jehrê vedixwe û dawî li jiyana xwe tîne.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1.** Mirov ji awayê kuştina Zenûbiya, çi tê dighêje?
**2.** Baweriya terîqeta Esenî, rave bike.
**3.** Bi çi awayî Hz. Îsa li himber koletiya Romayê derket?
**4.** Çima Hanîbal derbasî Romayê nebû?

**Lêkolîn:**
Sedema belavbûna Ola Xiristiyaniyê di rêjeyeke bilind de, lêkolîn bike.

WANE 6

# ROMA Û BERXWEDANA GELAN (3)

## Şaristaniya Komagene:

Di dîrokê de şaristaniya Komagene, ne tenê ji bo kurdan, ji bo mirovahiyê jî mînakek gelek balkeş û birûmet e.

Imperatoriya Med-Persan, ji aliyê Iskenderê Mezin ve têk çûbû. Li ser vê kevneşopiyê, Qraltiya Komagene pêş ket. Qraltiya Komagene, di dîroka kurdan de ji aliyê çandê ve xwedî cihekî taybet e. Mînakeke gelek hêja û birûmet e. Lê mixabin, ta niha ji aliyê dîroknasan ve ev taybetî û girîngiya wê zêde nehatiye dîtin.

Komagene bi koka xwe, navlêkirineke Helenî be jî, lê wateya wê ya kurdî jî heye. Qraltiya Komagene, nêzî 250 B.Z. û 100 P.Z. li Semsûra îro jiyaye. Peyva 'kom' hîn jî, ji bo komên nîv-koçer û cihwarê wan bi wateya zom tê bikaranîn. Peyva 'gen' jî; bi wateya nijad, qebîle û êlan tê bikaranîn. Komagene, tê wateya cihê êlên nîvkoçer.

Qraltiya Komagene; li ser Çiyayê Nemrûdê ku ji aliyê dewlemendiya daristanên xwe, bi taybetî jî bi darên sedirê ve navdar e, ava dibe. Cihê ku lê ava bûye, cihekî stratejîk e. Ji Hatayê ta Pinarbaşî ya Kayseriyê, bakurê Toros, bakurê Dicle û Feratê dest pê dike, bajarê Semsûr, Meletî, Xarpût, Dîlok, Mereş û Rihayê ji erdnîgariyeke fireh û dewlemend pêk tê.

Şaristaniya Komagene, tenê di warê çand û hunerê de pêşketin bi dest nexistibû, heman pêşketin di warê bazirganiyê de jî bi dest xistibû.

Sentezeke çandî ya balkêş a rojhilat û rojava ye. Belgeya herî berbiçav û hêj zindî ya vê rastiyê, xirbeyê goristana Qralê

Komagene Antiochus a li Çiyayê Nemrûdê ye. Navenda vê qraltiya bihêz a wê demê, Semsûr e. Paytexta Komagene, bajarê Samosatê di binê ava Feratê de maye. Gora li Çiyayê Nemrûdê, yek ji heft newazeyên Cîhanê ye. Yekem car, senteza rojhilat-rojava tê pêşxistin. Ev dibe sedem ku bandora xwe li zanist, bawerî û şêweyê hizirê bike. Bilindbûn û mezinbûna Romayê, diyar e ku li ser van bingehên bawerî û hiziran xwe ava kiriye.

Li ser vê şopê meşiyaye û pêşketina xwe watedar kiriye. Qraltiya Komagene, di vê demê de bi hîmên şaristaniyên kurdan re di nava girêdan û têkiliyekê de bûn. Bi vî şêweyî, hem li hemberî Romayê li ber xwe didin, hem jî bi hin lihevkirinên serkeftî, tevgerên xwe yên bi zanebûn didomînin û bilind dikin. Tevgera zanista xiristiyanan, vê demê bi dawî dikin.

## Civaka Komagene:

Li gorî lêkolînên ku hatine kirin, tê dîtin ku civaka Komagene pir girîngiyê didin girêdana xwînê, malbat û klanan. Jiyaneke pir bi aramî dijîn. Karbendî, ji bav derbasî zarokan dibe. Zarok, perwerdeya xwe ya destpêkê, li cem dayîkên xwe dibînin. Dayîk, perwerdehiya wan dişopînin.

Di pergala Komagene de nêzîkatiya ji jinan re li ser bingeha wekheviyê ye. Jin û mêr, xwediyê heman mafan in. Ev rastî, namos (zagonên pîroz) bi şêweyekî vekirî hatiye xuyakirin. Di zagonên Komageneyê de ji bo dizî û tevgera ji derveyî zagonan, şensê bexşandinê tune ye. Civaka Komagene, ji aliyê hunermendî û oldarî ve civakeke xêrxwaz e û di navbera rojhilat û rojava de sentezeke nû ava dikin.

## Di dema Komageneyê de aborî:

Qraltiya Komagene, di navenda çarçetela rêyan de cih digire. Rêya ku diçe Rojava, rêya ku di ser Sûriyeyê re ber bi

şaristaniya Misirê ve diçe, rêya ku ber bi dewlemendiya Rojhilat ve ta Hindistanê diçe û li wir digihêjin hev.

Bazirganî, ji bo Komageneyê çavkaniyeke bingehîn e. Komagene, navendeke bazirganiyê bû. Komagene, çûnûhatina li ser Çemê Ferat û Çiyayê Torosan xistibû bin venêrîna xwe. Ji bazirganên ku ji derve dihatin û di wan deveran re derbas dibûn, bac kom dikirin. Bazirganên Komagene, bi hêsanî di ser axa Persan re derbasî Hindistan û Çînê dibûn û ji vir tiştên pir binirx û buha tanîn. Li cihekî bi navê Samatê, ev tişt difirotin Roma, Pers û Ereban. Di heman demê de li ser axên Komagene, daristanên sedîran hebûn. Ev dar, ji bo aboriya Komagene dewlemendiyeke mezin bû.

Nakokiyên di navbera Roma û Partan de bazirganiya di navbera Rojhilat û Rojava de asteng dikir. Di navbera van her du hêzên mezin de tenê Komagene serbixwe mabû û tenê bazirganên Komagene dikarîbûn bi hêsanî bi van her du hêzên mezin re bazirganiyê bikin.

## Di dema Komagene de huner:

Civaka Komageneyê, hunereke taybet ava kiriye. Ev huner, ji senteza hunera Med-Pers û Grekan pêk dihat. Huner, di bin venêrîna qraliyet û mirovên ku weke hevalên qral in de ji aliyê komeke hunermend û zanyaran ve dihatin pêşxistin û parastin.

Peykerên li Nemrûdê, hunera Komageneyê diyar dikin. Li Anatolyayê li ser girên bilind, perestgeh hatine avakirin. Di hemû şaristaniyan de cihên baweriyê; li ser çiya û girên bilind hatine avakirin. Cihên ku girên bilind û çiya lê nebe jî, bi xwe cihên weke gir bilind çêdikirin û li ser van giran jî perestgeh ava dikirin. Nemrûd, li ser rêzeçiyayên Torosan e û di bilindahiyeke 2150 metre de ye. Li ser rêyên Çemê Feratê, li ser deştan

desthilatdarî ava kiriye. Di vê wateyê de Nemrûd li Anatolyayê weke cihê baweriyê dikare were binavkirin. Li ser Çiyayê Nemrûdê, pûtên Xweda-qralan hatine çêkirin. Ev gir, derketina rokê-rojhilat û avabûna rokê-rojava, bi şêweyekî bedew nîşan dide.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima şaristaniya Komagene ji bo kurdan girîng e?
2. Şaristaniya Komagene, ji ku dest pê dike?
3. Şaristaniya Komagene, çend rêyên bazirganiyê di nava xwe de digire û çima girîng e?
4. Şaristaniya Komagene, di çi de xwe pêş xistibû?
5. Civaka Komagene, girîngî dida çi?

**Lêkolîn:**

Komagene, ji aliyê aborî, hunerî ve lêkolîn bike.

WANE 7

## IMPERATORIYA SASANÎ (226-651 P.Z.)

Imperatoriya Sasaniyan, ji aliyê Ardeşêrê yekem ve di 226 P.Z. de piştî dawîlêanîna rêveberiya Xanedaniya Arşakiyan hatiye damezirandin. Sînorên Imperatoriya Sasaniyan; ji Îran, Îraq, Ermenistan, Efganistan, Pakistan, Kurdistan, Kafkasya û beşeke Asyaya Navîn pêk tê. Demekê erdnîgariya Sûriye û Misirê jî dixe bin desthilatdariya xwe. Imperatoriyeke mezin a pêvajoya derbasbûna pergala axa û koledariyê ye. Ardeşêrê yekem, ji bo rûxandina xanedaniya Partan, ji êlên kurd û farisan alîkarî girtibû û yekîtî ava kiribû. Bi vê yekîtiyê re di sala 224'an de dawî li Imperatoriya Partan anîbû. Lê tevî hilweşandina xanedaniya Part, partan karîbûn cihê xwe yê di qadên dewletê de û payeyên xwe biparêzin.



Şerê ku di dema Partan de ji bo serweriyê li hemberî Imperatoriya Romayê dihat meşandin, di pêvajoya Sasaniyan de jî dewam kir. Di van şeran de jî, her du alî li hemberî hev nikarîbûn serkeftineke tam bi dest bixin. Herêmên ku ev şer li ser pêk dihat, erdên Kurdistanê bûn. Di van şeran de yên ku ziyana herî zêde gihîştiye wan, Kurdistanî bûn. Gelên Kurdistanê, di vî şerê ku 500 salî dom kiriye de zirar û ziyanên pir mezin dîtine.

Sasaniyan, di serdema Şapûrê yekem de karîne sazîbûna xwe pêk bînin. Yek ji pêvajoyên herî bihêz a Sasaniyan e. Sazûmaniya dewlet û artêşa ku ji dema Medan dihat, bi heman şêweyî berdewam kirine. Lê pêşketina herî mezin a vê pêvajoyê, ola Zerdeştî, weke ola fermî ya dewletê hat pejirandin. Lê Şapûrê ku ji kiryarên rahîbên Zerdeştî bêzar bûye, dikeve nava lêgeran. Ji ber berjewendiyan, xwe nêzikî Manî dike.

Plansaziyên Şapûr ên ji bo pêşketina Imperatoriya Sasaniyan pir bûn. Gelek bajar ava kirin. Beşeke koçberên Romayê li van bajaran hatin bicihkirin. Ev gelên ku derbasî van bajaran dibûn, li gorî baweriyên xwe tevger dikirin. Baweriyên xwe azad jiyan dikirin. Du bajarên bi navê Bîşapûr û Nîşapûr, bi navê Şapûr hatine binavkirin.

Şapûr; bi taybetî, pir girîngî dida Manî. Ew diparast û dihişt ku bi awayekî azad bîrdozîya xwe belav bike. Di heman demê de têkiliyên Şapûr ên bi cihuyan re jî baş bûn. Ev taybetmendî û rêbazên Şapûr, ji bo rêvebirina xanedaniya Sasaniyan, destkeftiyên mezin ava kirine.

Di dema Behramê yekem de rahîbên Zerdeştî, careke din bihêz dibin. Ji dema Behramê yekem 276'an, ta digihêje dema Hurmuzê duyem di pêşketina Sasaniyan de paşveçûnek tê jiyîn.

Li beramberî Romayê têk diçin û erdên wan ji dest wan diçin. Di dema Hurmuzê duyem de careke din bihêz dibin û têkoşîna serweriyê li hemberî Bîzansan dimeşînin. Dema herî bihêz a Sasaniyan, dema Behramê pêncem e.

Di vê pêvajoyê de li hemberî Bizansan, serkeftin pêk aniye û herêmên Asya Navîn û rojavayê Hindistanê dagir kiriye.

Piştî Behramê pêncem, di nava dewletê de rizîbûn tê jiyîn. Piraniya imperatoran; bi derbeyan, an jî bi bêbextî hatin guhertin. Ev dem, pêvajoya rawestîn û bi paş de çûyîna Sasaniyan e. Di pêvajoya şerê 300 salî yê ku Sasaniyan bi rê ve birine, di nava civakê de gelek hilweşîn û zirar pêk anîne. Di vê pêvajoyê de li herêmên cuda yên imperatoriyê, serhildan derketine.

## Li hemberî Sasaniyan Berxwedan:

### Manî:

Di xanedaniya Sasaniyan de ji bo karibin desthilatdariyeke xurt bimeşînin, rahîbên magî(mag, bawermendên Zerdeştî ne) bi navê ola Zerdeşt, desthilatdariya xwe zêde dikin. Ji bo ku Magî karibin pergala xwe bidin rûniştandin, hemû rê û rêbazan bi kar tînin. Baweriya Zerdeşt, weke ola fermî tê pejirandin. Di dema Sasaniyan de rahîbên olî, dibin xwediyê desthilatdariyeke mezin. Hemû nivîsên Zerdeşt, ji nû ve tên berhevkirin û nivîsandin. Lê belê ev rahib, dema ku nivîsan amede dikin û dinivîsin, li gorî berjewendiyên desthilatdariya Imperatoriya Sasaniyan, tên amedekirin.

Ev koma rahîbên magî, bi riya olê desthilatdariya Sasanîyan didin rûniştandin. Lê piştî demekê û bi derketina ola Manî re ola Sasaniyan a fermî hejandineke mezin jiyan dike.

Li hember êrîşên bîrdozî helwesta civakî ya ku  di nava kurdan de li pêş dikeve tevgera Manîtiyê ye. Wek helwesteke civakî di sedsala sêyem de li pêş dikeve û xwe li her deverên Kurdistanê belav dike. Heta sînorên Kurdistanê jî derbas dike. Manîtî mîna tevgereke him olî û him jî civakî li pêş ket; ji ber ku li hember karakterê şaristaniya navendperest, xwest ji nû ve moral û çanda civakî serwer bike.

Kevneşopiya ku Manîtî xwe dispêrê, kevneşopiya Mîtra û dûalîzma Zerdeşt, rêgezên sincî yên Bûdîzimê û hinekî jî nirxên xirîstyaniyê dihewîne.  Di vê pêkhatinê de rêgezên herî berbiçav şerê di navbera başî û xirabiyê de ye. Ji ber vê yekê hinek dîroknas Manîzmê wek oleke dûalîst dibînin. Ev felsefe him li Rojhilat him jî li Rojava gelekî bilez belav dibe.

Eger ne ji ber komkujiyên paşverûyên Sasanan bûya, Manîtî jî, wê weke ola xiristiyanî belav bûba. Zanyar di vê mijarê de hemraman in. Tê zanîn ku weke rêbaz belavî Ewrûpayê jî bûye û bandora xwe li Serdema Navîn kiriye. Dijberiya ola Manî ji hêla desthiladarên Sasanan ve tê kirin û bi rengekî hovane Manî tê kuştin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Berfirehbûn û belavbûna Imperatoriya sasanî, rave bike.
2. Çi hişt ku baweriya Zeredeşt ji rê derkeve?
3. Rêgezên felsefeya Manî rave bike.
4. Felsefeya Manî xwe dispêre kîjan kevneşopiyê?

WANE 8

## SERHILDANA MAZDEK

Dîroka jidayîkbûna Mazdek, tam nayê zanîn. Mazdek, ji Hemedanê ye. Tevgera Mazdek, li dijî sazûmaniya koledar a sasaniyan bû. Mazdek, li Îranê weke rêberekî olî û ramyarî derdikeve holê. Mazdek, ol weke çekekî, li dijî qralên sasaniyan bi kar aniye û wisa derketiye holê. Her wiha, dibe lêgervanekî felsefeya civaka bindest.

Mazdek, ji derveyî taybetmendiyên ramyarî, di heman demê de lêkolînvanekî olê ye jî. Tewratê dixwîne, nêrînên pêxemberên berê lêkolîn dike û dixwaze felsefeya Zerdeşt nû bike. Bi vî awayî, hewl daye aliyê paşverû yê vê baweriyê ku civakê bi paş de dihêle, biguherîne.

Ji nêrînên ku Mazdek diparêze re Mazdeîzm tê gotin. Mazdeîzm, xwe dispêre kevneşopiya baweriya Zerdeşt. Mazdek, her awayê heyînên aborî û dewlemendiyên kesî napejirîne û di nava civakê de tevgereke civakî ya ku her cureya mal û milk parve dike, dide destpêkirin. Li gorî nêrîna Mazdek, bingeha hemû newekheviyên ya di navbera mirovan de şer û pevçûnên di navbera dewlet û gelan de çêdibine.
Mazdek, li hemberî vê; di jiyana civakî û aborî de wekhevîbûnê diparêze. Rewşa civakên bindest û ya jinê, girêdayî hev bûn. Nêrînên Mazdek, di nava civakên kurd, faris û azerî de bi awayekî bilez belav dibûn. Nêrînên li dijî dewleta sasaniyan a ku li ser bingeha kolekirina mirovan hatibû sazkirin, girseyên gel li derdora Mazdek kom dikirin.
Dema ku ev raman, bi taybetmendiyên Mazdek ên bi rêxistinkirineke kêrhatî ya gelan re dibûn yek, hêzeke mezin derdiket holê. Vê hêzê, rêveberiyên sasaniyan ditirsandin. Rahîbên Zerdeşt jî li hemberî tevgara Mazdek helwest standin.

Tevgera Mazdek, di dawiya sedsala 5'an û destpêka sedsala 6'an de di xakên ku di bin desthilatdariya sasaniyan de ye, cihekî girîng digire. Mezinbûna tevgerê û tirsa rêveberên sasanî, rê li ber êrîşên dewletê vekirin. Artêşa sasaniyan, di pêvajoya qralê sasaniyan Qûbat de car caran êrîşî hêzên Mazdek kirine. Lê bê encam mane. Serhildana Mazdek, di dawiyê de bi alîkariya Akhûnan ve hatiye rawestandin. Mazdek, dikeve destê sasaniyan û di sala 499 'an de tê bidarvekirin.

## Felsefeya Mazdek:

Serhildana Mazdek, yek ji tevgerên komînal ên despêkê ya ku dîrokê jê re govanî kiriye, cihekî xwe yê girîng heye. Mazdek, bi pêşxistina feraseta felsefeya xwe ve li hemberî rahîbên Zerdeşt û aristokratên sasaniyan bi hev re pêş xistibûn, derketiye. Ji ber ku van sazûmaniyan civak xerab dikirin, li hemberî vê yekê, Mazdek sazûmaniyeke wekhev, hevbeş û azadîxwaz bi pêş dixe. Mazdek, bingeha felsefeya xwe di dualîzma Zerdeşt de rave kiriye. Di felsefeya Mazdek de ronahî û tarîtî, başî û xerabî her dem di nava şerekî de ne. Ev şer, ji derveyî cihê ku xweda lê heye, li her derê heye. Di felsefeya Mazdek de av, agir û ax xwedî girîngiyeke mezin in. Her wiha, weke Zerdeşt li hemberî mirovên ku kuştinê dikin û xwarina goştê lawiran derketiye. Bingeha hemû xerabiyan, weke; milkê taybet, tundî, hesûdî û çavbirçîtî pênase kirine.

## Sê xalên bingehîn ên felsefeya Mazdek:

1. Ji aliyê parvekirina mal û samanê ve hevparbûn.
2. Bingehgirtina wekheviya jin û zilam.
3. Parastina maf û nepejirandina zext û nêrînên desthilatdariyê yên li ser mirovan.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Tevgera Mazdek, li dijî kê bû?
2. Mazdek, li Îranê bi çi dihat naskirin?
3. Mazdek, bi piranî li ser çi dixebite?
4. Serhildana Mazdek, bi kîjan rêbazê hat rawestandin?
5. Felsefeya Mazdek, bi kurtasî veke.

# BEŞA DUYEM

- ❖ DEMA ISLAMÊ
- ❖ DEMA ÇAR XELÎFEYAN
- ❖ DERBASBÛNA ÎSLAMÊ YA NAVA KURDISTANÊ
- ❖ DEMA EMEWIYAN (661- 750)
- ❖ DEMA EBASIYAN (750-1258)
- ❖ EBÛ MUSLIMÊ XURESANÎ

WANE 1

# DEMA ISLAMÊ

## Jînameya Hz. Mihemed:

Hz. Muhemed di sala 571'ê de ji dayik dibe û weke xeleka dawî ya rêûresma Brahîmî tê pejrandin. Lê jiyan û gotina wî ji ya Hz. Brahîm, Mûsa, Îsa û pêxemberên din zelaltir in. Agahiyên der barê wî de berçavtir in. Mirov dikare diyarde û bûyerên jiyana wî bi pirranî bi awayekî berçav bişopîne.

Hz. Mihemed ji hoza Haşimî ya êla Qureyşî ye. Ji malmezinên Mekkeyê ye. Malbata wî bi bazirganiyê mijûl dibe. Ew kurek e ku ji Abdullah û Amîneyê çêbûye. Bav û diya wî bi xwe xizan bûn. Tê gotin ku Hz. Mihemed hê di zaroktiya xwe de hin derhozeyan nîşan dide. Di çanda Rojhilata Navîn de vegotinên bi vî rengî heta bi Sargonê Ekadî diçin û di derketina her kesayeteke girîng de van derhozeyan bi wan ve vedikin. Dibe ku wisa be!

Di 25 saliya xwe de dikeve xizmeta bazirgana wê demê ya bi bandor, Xedîceyê. Çend caran sefera Meke-Şamê dike. Di sefereke xwe de li ser rê li bajarê navdar ê Romayî Besrayê ji rahibê Nastûrî Buheyra gelekî agahiyan digire. Di wê demê de rahibên Nastûrî têra xwe bi bandor in. Koma herî girîng a pêşketinên îdeolojîk in.

Hz. Mihemed, di sala 610 P.Z. de ola Islamiyetê radigihîne. Bi qasî ku pêş dikeve û mezin dibe, bi aliyên din ên arîstokrasiya eşîra Qureyşiyan re nakokiyên wî zêde dibin. Di encama van nakokiyan de serdegirtin pêş dikeve, ji pêşketina ola Islamê ya li Mekeyê re dibe asteng. Di vê demê de Medîne, bawerî bi Hz. Mihemed tîne. Hz. Mihemed vedixwînin bajarê Medîneyê. Hz. Mihemed, di sala 622 P.Z. de koçberî Medîneyê dibe. Di


serdema Medîneyê de Mekeyî sê şeran dikin; Şerê Bedr 624, Şerê Uhud 625 û Şerê Xendeqê 627. Di sala 630'î de jî Meke tê vekirin. Hz. Mihemed di 8'ê Hezîrana 632'yan de dimire.

## Rewşa Mekkeyê:

Meke bajarekî girîng ê bazirganiyê ye. Bajarek e ku bazirganiyê ew derxistiye holê. Li Mekeyê gelek ol û çanda pûtperestiyê heye. Her wiha Henîf û Sabiyan ên ku propagandaya olên yekxwedayî jî dikin ne kêm in. Bi kurtî bajar bi mal, çand, ol û xwedayan tijî bûye.

Têkiliya Hz. Mihemed ya bi Xedîceyê re bi zewacê bi encam dibe û ev yek girîng e. Bi vê zewacê re ji çînekê derbasî çîneke din bûye. Bi vî awayî Hz. Mihemed xwe digihîne bûrjwaziya navîn.

Her ku mezin dibe û pêşde diçe, bi milên din ên Qureyşiyan re nakokiyên wî zêde dibin. Milên din ên Qureyşiyan jî arîstokrasên êlan in. Rê nadin ku Hz. Mihemed zêdetir pêşde biçe û her roj kelemên nû derdixin pêşiya wî. Ev şerekî çînî ye.



Di nava heman êlê de diqewime û pêş dikeve. Diyare ku Hz. Mihemed şervanekî ji çîna navîn a bazirganan e.

Ji sedî sed ew û Xedîce ji çîna bazirgan a li Mekeyê ku li ber derketinê ye, bi rola pêşengiyê radibin û hêza li hemberî wî arîstokrasiya êlan a kevneşopiyê ye. Ew bi xwe jî ji bazirganiyê kedxwariyê bi dest dixin. Lê rola wan a bingehîn bi desthilatdariya polîtîk re têkildar e.

Sîstema koledar li Mekeyê berfireh belav bûye, koletiya jinan hûrûkûr bûye, zarokên keç ewçend bê qîmet bûne ku wan bi saxî dixin bin erdê û ev hemû karektera koledar a rêveberiya arîstokrasiyê eşkere nîşan didin. Her wiha hebûna sê pûtên mezin (Lat, Menat û Uza) li panteona Mekeyê nîşan dide ku xwedayetiya sêber a di sîstema şaristaniya kevneşopiyê de milê xwe yê Mekeyê jî çêkiriye. Ev ji karektera rêveberiyê ya rêûresmî, hiyerarşîk û Sumerîk nîşan dide. Arîstokrasî weke ola fermî bi pûtperestiyê radibe û ev jî ji me re rave dike ka çima Hz. Mihemed evçend dijwar li dij pûtperestiyê ye. Di navbera arîstokrasiya jor û bazirganê nû yê çîna navîn de pevçûn û şer diqewimin. Hz. Mihemed neçar dimîne ku koçî Medîneyê bibe.

## Felsefeya Hz. Mihemed:

Dema Medîneyê pêkhatina peyman û sozgirêdana vê ya ramiyarî û civakî îfade dike. Ango peymana nû pêşnûmeya dewleteke nû ye.

Çawa ku di Peymana Medîneyê de em dibînin, cudahiya Hz. Mihemed ew e ku cara pêşî karîbû hozên Ereban ên mîna li ser êgir bin û destê bi hêz ê şaristaniyê hê negihiştibû wan, bi awayekî serkeftî bike hevparê peymanekê. Ya Hz. Mihemed dike bi tenê ew e ku karîbû ji hozên Ereb dewletê biafirîne.

Hostetiya mezin a Hz. Mihemed ew e ku karîbûye sê şaristaniyên mezin ên li dora hozan ango şaristaniya Sasanî, Bîzans û Hebeşistanê bibîne, pê bihise û fêhm bike ka çawa bi hezarên salan hozên Ereb ên li Erebistanê ji çar aliyan ve dorteng û tengav kirine. Xwedayê nû, ango Ellahê panteona ji Sumer û Misriyan ve dewam dikir, bi tevahî betal û qedexe dikir û bi vî awayî jî yek ji şoreşên herî mezin ê rewanî pêk anî.

Têkoşîna Hz. Mihemed a civakî, demokrasiya civaka çîna navîn e. Tu nîşan tune ne ku Hz. Mihemed dixwaze xanedantiyekê, yan jî qraltiyekê ava bike. Eger bixwesta, hêza wî ji bo wê hebû, dikarîbû di serî de ji avaniya xelîfetiyê re bibe asteng. Di sekna wî ya li mizgefta Medîneyê ya pêşî de bi awayekî giştî pirsgirêkên civakî tên guftûgokirin, ji civatê her kes di mijarên pirsgirêkên civakî de nêrînên xwe vedibêjin û pirs dikin.
Pêkhateya civînan û rêvebirina wan, bi misogerî demokratîk e. Ji jin û koleyan, ta ji netew û komên din dikarin tevlî bibin û mafê axaftinê werbigirin. Mînak; Bîlalê Hebeşî, koleyekî Efrîqayê ye. Selmanê Farisî, sehabiyekî ku bi koka xwe Farisî ye. Jin, bi zilaman re dikarin hevpar nimêj bikin, di destpêka derketina Islamê de diyar e ku şovenîzma netewî û zayendan tune ye.
Rastiya demokratîk a derketina Islamê, rastiyeke bêguftûgo ye. Wekî din, di civînên mizgeftan de rêvebir û fermandar tên diyarkirin. Ji bo bêdadî bên derbaskirin, bi hejmareke zêde biryar tên girtin. Derketina Islamê; ji dad û demokrasiya civakê re vekiribû, jixwe ev tevlibûna demokratîk nebûya, ne gengaz bû ew qas hoz, xizan û çîna navîn bi lez ketibana tevgerê. Rêxistinbûna Hz. Mihemed, ne li ser bingeha zorê ye, rêxistinbûneke li ser navê eşqa xweda hatiye pêşxistin e. Şerê wî jî wisa ye, şerekî ku li ser navê eşqa xweda hatiye pêşxistine.

Diyar e ku şoreşeke ramyarî, aborî, civakî û bîrdozî ya berfireh hatiye meşandin.
Lê hin kiryarên ku hatine kirin Hz. Mihemed bi xwe jê dudilî bûye û ev kiryar ji rexneyê re vekirî ne. Mîna kuştina mêrên hoza Cihû ya Benî Qureyza ev bûyer jî piştî Şerê Xendeqê çêdibe ji ber hevkariya wan a bi Mekeyiyan re. Cihû vê mijarê weke ceribandina 'qirkirina' pêşî şîrove dikin. Di vir de bi tevahî Cihû ne mijara gotinê ne, lê mêrên gihiştî ne. Ev çalakiya kuştinê sînorê xwe derbas kiriye û aliyekî neyinî yê Islamê ye ku paşê gelekî li hember Islamê tê bikaranîn.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hz. Mihemed di ciwantiya xwe de bi çi mijûl bûye?
2. Hz. Mihemed zanînê ji ku digre?
3. Rewşa Mekayê beriya Islamê, veke.
4. Çima Erîstokrasiya Qureyş rê nedida Hz. Mihemed ku pêşde biçe?
5. Armanca Hz. Mihemed ji peymana Medîneyê çi bû?
6. Hz. Mihemed çawa şoreşa rewanî pêk anî?
7. Şoreşa Islamê ya civakî binirxîne.

WANE 2

# DEMA ÇAR XELÎFEYAN

## 1. Dema Hz. Ebû Bekir (632-634):

Hz. Ebû Bekir, kesekî wisa ye ku her tim li gel Hz. Mihemed e. Lê belê dema ku Hz. Mihemed jiyana xwe ji dest dide, yê ku destpêkê ketiye nava şerê desthilatdariyê Hz. Ebû Bekir e. Li gel Hz. Umer, hîn termê pêxember li erdê bû, têkoşîn dikir ku kî bikeve şûna Hz. Mihemed. Ji ber ku Hz. Mihemed, kes ji bo cihê xwe destnîşan nekiribû, ku piştî mirina wî bikeve şûna wî. Lê belê ji aliyê pêşengên Medîneyê ve xelîfe hatin hilbijartin. Dema ku Hz. Mihemed jiyana xwe ji dest da, li cihên ku di bin bandoriya Islamê de ne, alozî derketin holê.

Hz. Ebû Bekir ev alozî çewisandin, weke avakerê yekem yê dewleta Islamê, tê pejirandin. Di destpêkê de hin hozên ku bi mirina Hz. Mihemed re ji rêka Islamê vegeriyan şerê wan kir. Her wiha, artêşek şand ser hozên ereban ên ku zikatên xwe nadin. Bi vê riyê, zikatdayîna wan hat pêkanîn. Piştî ku Hz. Ebû Bekir pirsgirêkên hundirîn çare kirin berê xwe da vekirinan ji bo berfirehkirina qada desthiladariya Islamê. Bi vî awayî di sala 634’an de bi şerê ku bi bîzansiyan re hat kirin, Ecnadîn li xaka Filistînê hat qezenckirin, lê hîn ev pirojeya wî di destpêkê de bû jiyana xwe ji dest dide.

Hz. Ebû Bekir, xelîfeyê ku bi fermana xwedê jiyana xwe ji dest daye ye. Ji beriya ku jiyana xwe ji dest bide, Hz. Umer li şûna xwe, weke xelîfe diyar kiriye.

## 2. Dema Hz. Umer (634-644):

Piştî Hz. Ebû Bekir, Hz. Umer dibe xelîfe. Di vê demê de bi şer û pevçûnên dijwar û rijandina xwînê pir zêde dibe bi navê fetihê pir cih têne dagirkirin, Kurdistan jî yek ji van cihan e.

Di dema Hz. Umer de ew pirojeya ku Hz. Ebû Bekir dest pê kiribû hate berdewamkirin êdî dewletê bi hemû hêza xwe ve dest bi şerê fethê kir.

Piştî şerê Ecnadînê Şam, Heleb, Humis, Hema, Bealbek û Latqiyê hatin vekirin û bi vî awayî vekirina Sûriyeyê hat temamkirin. Di şerê Yermûkê 636 'an de êdî Filistîn jî hat vekirin. Hz. Umer, çû bi xwe kilîla Qudsê vekir.

Bi şerê di sala 636’an de Qadisiye, 637’an de jî Celûla beşeke mezin a Îraqê hat standin. Bi şerê Nihawendê yê ku di sala 642’yan de hatiye kirin re dawî li Dewleta Sasaniyan hatiye anîn. Dema Hz. Umer, dema ku avaniya dewleta Islamê, xwe bi sazî kiriye. Hz. Umer, di sala 644’an de di encama reşkujiyê de tê kuştin.

## 3. Dema Hz. Osman (644-656):

Ji bo ku Hz. Osman bibe xelîfe, ji aliyê Hz. Umer ve encumenek şêwirdariyê tê avakirin û ji aliyê wê encumenê ve Osman wek xelîfe, tê dayîn. Hz. Osman di navbera salên (644-656) dibe xelîfe.

Hz. Osman, ji malbata Benî Umeye ye. Ji beriya malbata xwe, tevlî Islamê bûye. Di vê demê de dagirkeriyên Islamê pêş ketine. Aristokratiyê, di vê demê de cihê xwe yê di nava dewletê de bi sazî kiriye. Malbata emewiyan, di dema Hz. Osman de cihê xwe di nava dewletê de çêkiriye û hîmê desthilatdariya emewiyan

hatiye qayîmkirin. Di sala 656’an de Hz. Osman bi reşkujiyekê hatiye kuştin.

## 4. Dema Hz. Elî (656-661):

Piştî Hz. Osman, Hz. Elî di navbera salên (656-661) de dibe xelîfeyê islamê yê çarem. Tê gotin ku wî destpêkê xîlafet nedixwest lê ji bo parastina civaka mislmanan ji perçebûnê xîlafet pejirand.

Di dema wî de li ser desthilatdariya islamê nakokî kûrtir bûn û ev nakokî bûn bingehê şerên navxweyî. Di şerê Cemel û Sifînê de bi hezarên misilman hev û du kuştin û di encama şer de civaka misilmanan parçe bû.

### ❖ Şerê Cemel:

Bi behaneya ku tola Osman bê standin, ev şer di navbera Hz. Elî û Telha, Zubêr û Eyşe de diqewime. Di encamê de artêşa Hz. Elî bi ser dikeve û Telha û Zûbêr û bi hezaran misilman tên kuştin.

### ❖ Şerê Sifînê:

Ev şer bi sedema ku Mawiya Hz. Elî wekî xelîfe nepejirand, diqewime. Ji ber nepejrandina Mawiye ji Hz. Elî re û hewildana Sorkirina gel li dijî Hz. Elî bi hildana kirasê Hz. Osman yê bixwîn, Artêşa Hz. Elî ber bi Şamê ve diçe da ku Mawiye ji walîtiyê bixe. Herdu alî li Sifînê têne pêşberî hev û piştî heftiyekê ji şer, nîşana serkeftina Artêşa Hz. Elî diyar dibe, ji ber vê yekê Umer Ibnûlas bi şêweyekî xapînok pêşinyar dike ku artêşa Mawiye Quranan li ser riman hildin da ku artêşa Hz. Elî paş de vegere. Tevî ku Hz. Elî têgihiştibû ku ev kiryar xapînok e, lê piraniya artêşa wî biryara rawestîna şer da, û deriyê guftugoyê hilbijartin. Piştre ji her aliyekî ve nûnerek hat hilbijartin, ê Mûawiya Umer Ibnûlas yê ku bi fêlbazbûna xwe

navdar bû û Ebû Mûsa Eleşerî yê temen mezin û dilpak nûnerê Hz. Elî bû. Bi xapandinekê di mizgeftê de ji aliyê nûnerê Mûawiya ve hate ragihandin ku Mawiya wê bibe xelîfeyê Misilmanan. Ji ber vê yekê şer di navbera her du aliyan de berdewam kir ta ku tevgera Xaricî biryara dawîlêhatina van nakokiyan bi kuştina Elî, Mûawiya û Umer Ibnûlas da. Lê di kuştina Elî de bi ser ketin û di yên dîtir de tu encam negirtin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima Hz. Ebûbekir weke avakerê yekem ê dewleta Islamê tê pejrandin?
2. Çima dema Hz. Umer weke dema ku avaniya dewleta Islamê xwe bi sazî kiriye, tê pejrandin?
3. Di dema Hz. Osman de malbata Emewî hîmê desthiladariya xwe qayim kiriye, vê mijarê veke.
4. Di dema Hz. Elî de, çi bi civaka misilman hat?

WANE 3

# DERBASBÛNA ISLAMÊ YA NAVA KURDISTANÊ

Islam, şoreşa herî dawî ya li hemberî pergala koledariyê ye. Di heman demê de tê wateya bisazîbûna feodalîzmê jî. Ev, tê wateya bipergalkirin û nasnamekirina ereban.

Civaka ereb, nêzî 700 salî rewşeke tevlihev û parçe parçe jiyan dikir. Di nava vê tevliheviyê de bi civakê ve hizirên xwe dane pejirandin; li gorî dema xwe, şoreşeke herî pêşketî ye. Hz. Mihemed jî mînakeke ku pêşengtiyê ji vê şoreşê re dike û siberojê ava dike.

Gava yekem a Hz. Mihemed, dixwaze pergaleke şoreşgerî ava bike, ku civakê li hemberî desthilatdaran biparêze. Ji ber vê yekê, di nava bindestan de pêl bi pêl belav bû. Beşên desthilatdar jî xwestin ku bi êşkenceyên metirsîdar vê pêşketinê asteng bikin û desthilatdariya xwe biparêzin. Lê belê ev hizirên nû, têkçûna bîrdoziya ku rê li ber xerabûna li Rojhilata Navîn vekiriye ye. Wisa kir ku ev astengî bên derbaskirin û bi biryardariyeke mezin pêngavên belavbûna li nava civakê bavêje. Di dema Hz. Mihemed de Islam, li tevahiya nîvgirava Erebistanê belav bû û yekîtiyeke diyar di nava ereban de çêkir. Lê belê desthilatdarên ereb, ku Islam ji bo berjewendiyên xwe pejirandibûn, dixwazin ola Islamê ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin. Hz. Mihemed û beşên bindest ên nêzîkî wî, li dijî van desthilatdaran têkoşîna xwe didomînin. Ev dem, dema ku pirsgirêk di nava Islama rastiyê ya Hz. Mihemed de ku nêzîktirî gelan bû. Ango Islama çandî û Islama desthilatdar a ku xwe dispêre cudakariyên hişk û çewisîner a desthilatdariya sunî dest pê dikin. Ev pirsgirêk, li dij şoreşa dema emewiyan dijwartir dibin û ta roja me ya îro jî berdewam dikin. Piştî mirina Hz.

Mihemed, Hz. Ebû Bekir weke xelîfe dibe nûnerê Islamê. Ev dem, dema ku Islamê herî zêde hewl daye ku xwe li ser piyan ragire. Di vê demê de eger hin seferên derve çêbûbin jî, lê ne seferên pir bihêz in. Seferên vekirinê yên ji bo welatên derve, di dema Hz. Omer de pêk hatine. Seferên yekem, li ser Bîzans, Sasanî û Misirê kirine. Nasîna kurdan a Islamê, rastî van salan tê. Di sala 633'yan de cara yekem kurd bi Islamiyetê re rastî hev tên.

## Êrîşên Hz. Omer ên li ser Kurdistanê:

Di dema Hz. Omer de ji sê aliyan ve seferên derve hatine destpêkirin. Artêşa di bin fermandariya Omer Ibn Elas de ber bi Misirê ve diçe. Artêşa di bin fermandariya Xalid Bin Welîd de ber bi Bîzans û Kurdistanê ve diçe. Artêşa di bin fermandariya Se'ed Ibn Ebî Weqas de ber bi sasanî, Rojhilat û Başûrê Kurdistanê ve diçe. Bi vî awayî, seferên xwe dane destpêkirin.

Artêşa di bin fermandariya Se'ed Ibn Ebû Weqas di sala 636'an de li Qadisiyeyê bi artêşên sasaniyan re tên beramberî hev. Di vî şerî de sasanî bi bin dikevin. Piştre di sala 642'yan de di Şerê Nehawendê de sasanî dîsa bi bin dikevin û dewleta sasanî tê hilweşandin. Piştî vî şerî, tevahiya xakên sasaniyan dikevin nava sînorên dewleta Islamê. Rojhilat û Başûrê Kurdistanê jî ji aliyê artêşên Islame ve tên dagirkirin.

Artêşa di bin fermandariya Xalid Ibn Welîd de di şerê Yermûkê de Bîzansan bi bin dixe. Piştî vî şerî, Sûriye û Bakurê Kurdistanê tên dagirkirin. Eger piştî şerê Yermûkê Imperetoriya Bîzans têkneçûbe jî, êdî li ser Rojhilata Navîn bandora hêza serweriya wê nemaye. Xalid Ibn Welîd herêmên weke; Dîlok, Gûmgûm, Meletî, Semsûr, Xarpêt û Çewlikê dagir dike. Artêşa di bin fermandariya Xalid Ibn Welîd de berê xwe dide herêmên weke; Mûsil, Zaxo, Colemêrg, Wan, Mêrdîn, Amed û Sêrtê

dagir dike. Ketina Islamê ya Kurdistanê pir bi êş û zehmetiyan çêbûye. Bi taybetî, nêzîkatiyên Islama desthilatdar ên weke dagirkerî û mêtîngeriyê bûne xalên bingehîn ên vê êşê. Armanc kiribûn ku van talan û dagirkeriyan, bi têgeha têkoşînê binixumînin.

❖ Kurdan islam bi yek şêwazî pêşwazî nekirine; li her herêmekê bi rengên cuda cuda islam pêşwazî kirine:

1. Herêmên çiyayî radest nebûne û li ber xwe dane mîna Zeredeştî, Êzîdiyan,Elewî, Yarîsanî, kakayî û hwd.
2. Herêmên deştê jî li ber xwe nedane û neçar mane ku islamê bipejirînin.
3. Hinek herêman jî piştî ku bi sedsalan şer kirine, islam pejirandine.

Bi vî awayî li beramberî islamê bertekên cuda derketine.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima Hz. Mihemed, dixwest pergaleke şoreşgerî ava bike?
2. Çima desthiladarên Ereb ola Islamê pejirandine?
3. Di dema Hz. Umer de çend sefer hatine despêkirin? Navê wan binivîse.
4. Kurdan Islam bi çi şêwazî pêşwazî kirine?

**Lêkolîn:** Helbesta ku li Başûrê Kurdistanê li ser derbasbûna islamê di nava Kurdistanê de hatiye nivîsandin, rave bike.

WANE 4

# DEMA EMEWIYAN (661- 750)Z

Emewî, xanedaniyeke ku piştî çar xelîfeyan (632-661), bûne desthilatdarê dewleta ereban a misilman. Piştî mirina Hz. Elî, Mûawiye bûye xelîfeyê dewleta Islamê. Ji ber ku Mûawiye ji malbata Emewî bû, ji bo hemû demên xelîfeyên ku ji koka wî tên re dema Emewî tê gotin.




Mûawiye, tevî ku bûye xelîfe jî, zêde ne rehet e.  Ji ber ku kurê Hz. Elî, Hz. Hesen ketiye nava liv û tevgerekê, di navbera misilmanan de şerekî nû yê navxweyî rû dida. Ji ber ku Hz. Hesen nedixwest di navbera misilmanan de şer derkeve, hin şert dane pêşiya Mûawiye û xwe ji şer vekişand. Li gorî vê, dema ku Mûawiye bimire, li şûna wî birayê Hz. Hesen, Hz. Huseyn wê bibe xelîfe. Mûawiye, ev daxwaza wan pejirand. Muawiye sîstema ku xîlafet ji bav derbasî kur dibe a navenda wê li Şamê, bi lez ava kir.

Di dema Emewiyan de, islam weke nav xuya dike û tê parastin, lê di cewherê xwe de xinziyeke mezin lê hatiye kirin. Di sala 681'ê Z. de endamên malbata Hz. Mihemed ên mayî di kesayeta Huseyn de bi Komkujiya Kerbelayê ya trajîk bêyî ku rehmê li

jin û zarokan bikin tev kuştin û bi vî awayî tevgereke tolhildanê ya dilêşane temam bû. Ji vir û şûn ve ya li pey hatî ne Islam, ‘Dij-Islam’ e.

Di dema Emewiyan de ji aliyekî ve metirsiya hundir û ji aliyê din ve jî tevgerên vekirinê berdewam dikin. Ji bo giravên Rodos û Girîtê sefer çêbûn. Cara yekem Stenbol ji aliyên hêzên leşkerî yên Islamê ve hat dorpêçkirin. Lê belê, bi saya sûrên stûr ên Stenbolê, ji dorpêçê rizgar bûn. Axên emewiyan, li eyaletan hatin cudakirin û birêvebirin, lê ev eyalet girêdayî dewleta navendî ya li Şamê bûn.

Dewleta Emewî, ji dewleta Islamê zêdetir bûye dewleteke ereban. Emewiyan, misilmanên ereb û misilmanên neereb, ji hev cuda kirin. Ji misilmanên neereb re digotin: **Mewalî**. Sedemeke herî girîng a hilweşandina dewleta Emewî, ev cudakarî bû. Weke encameke ramyariya erebkirinê, erebî zimanê yekane yê fermî yê dewletê sepandin. Hatiniyên dewletê, bi bacên ku ji pêwîstiyên olî ve tên, ji xenîmetên ku ji fetihkirinê wergirtine, pêk dihat. Di dîroka Islamê de cara yekem pereyên zêr, di dema Ebdulmelik (685-705) de hatine bikaranîn.

Islam, bi giştî dikeve destê desthilatdarên Islama dijber. Her wiha, dîroka Islama dijber, bi vî awayî dest pê dike. Ev, wê bibe desthilatdariyeke wisa, ku wê ol, pêxember û malbata wî ku dibêjin em nûnerên wan in, hewl bidin ku koka wan biqelînin.

Emewiyan navenda şaristaniya Islamê aniye asta nûnertiya herî bilind, di dema wan de dewletên Islamê sînorên wan li Rojhilat ta Çemê Seyhûn, li Rojava ta Okyanosa Atlas, li Bakur jî ta Çiyayên Pîrenê û Rojhilata Navîn berfireh dibin. Islam, ji rewanî zêdetir, bi daringiyê ve derdiket pêş.  Xelîfetî, weke çandekê ji bav derbasî kur dibe. Di wê pêvajoyê de bi awayekî

diyar neteweperestiyeke kûr ku dijberî cewherê Islamê ye, pêş dikeve.

Li hemberî çewisandin û dagirkeriya Emewî; gelek serhildan û rêxistinên parastina nirxên demokratîk û komînal ên azadî, wekhevî û dadweriyê derdikevin û di encamê de li gel bidestxistina serkeftinên pir girîng, hilweşîna Emewiyan jî pêk anîne.

## Êrîşên Emewiyan ên li ser Kurdistanê:

Dema Emewî, dema herî zêde nijadperestiya ereb û pişaftin hatiye pêkanîne. Ew pişaftin û rêzanîna belavbûnê, bi awayekî dijwar pir tirsnak û sezakirinê ve dihat birêvebirin. Kurd û Kurdistanê jî desthilatdariya Emewiyan a çewisîner û rûxîner, bi awayekî giran jiyaye.

Emewî, bi sê seferên mezin ve bi ser Kurdistanê de hatin. Herêmên Bakurê Kurdistanê, bi tevahî hatin dagirkirin. Di sala 708'an de fermandarê Emewiyan ê bi navê Haccac, hemû zilamên şûrhilgir dikuje, yên mane jî dike xenîmeta şer. Ev dem, ji bo Kurdistanê; demeke tam a rûxandinê ye.

Emewiyan, ji ber rêbazên xwe yên nijadperest û zêde tund, gelên heremê ber bi rûxandineke mezin ve birin. Di nava vê navenda zextan de berxwedanên gel mezin dibin, gelên herêmê hem ji bo bîrdoziya Hz. Mihemed dixwestin xwe weke hebûn nîşan bidin, hem jî li hemberî dersthilatdariya emewiyan berxwedanê bikin.

Civakên Rojhilata Navîn, li hemberî vê serdestiya Emewiyan xwe birêxistin dikin. Bi taybetî, mezheb û derdorên dijber ên li Xuresanê, li derdora Ebû Muslimê Xuresanî ku pêşengekî kurd e, xwe birêxistin dikin. Ji ber dûrahiya Xuresanê ya ji navenda Emewiyan; hem ji ber ku bi çiyayên bilind ve tên parastin, hem

jî ji ber derfetên gihîştina gelek cihan, xwediyên derdorên dijber ên desthilatdariya Emewiyan dest bi kombûnê dikin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hz. Hesen çi merc dabû pêşiya Mûawiye ji bo rêgirtina şerên navxweyî?
2. Emewiyan bi çi rêbazî islam ji cewherê wê derxist?

## Lêkolîn:

Cûdabûna di navbera Islam û Islama dijber di vê tabletê de diyar bik:

| | **Islam** | **Islama dijber** |
|---|---|---|
| Nirxên komînal | | |
| Cûdakirina gelan | | |
| Dagirkerî | | |
| Awayê rêvebirinê | | |
| Rewşa jin û koleyan | | |

WANE 5

# DEMA EBASIYAN (750-1258)

Emewî, ji ber xwedî dewleteke zordar û klasîk bûn, ji aliyê her beşê civakê ve rastî nerazîbûn û bertekên mezin hatin. Herî zêde jî civakên Mewaliyan ên ku li Iraq û Îranê dijiyan, nerazîbûn nîşan didan.

Li rex berxwedaniya gelan, beşek ji misilmanên Ereban jî dixwestin xelîfetî ji malbata pêxember re bê dayîn, bi taybetî, piştî kuştina Hz. Huseyn, malbata Ebasî hewl didan xelîfetiyê ji destê Emewiyan derxînin, bi vî awayî bertekên civakên din û têkoşîna desthilatdariya Ebasiyan dibin yek û di encama wê de dawî li desthilatdariya Emewiyan tê.




Piştî ku Ebasî bûn desthilatdar, Ebû Muslimê Xuresanî ku pêşengiya berxwedana gel dikir, bi bêbextiyekê kuştin. Ji ber ku Ebasî ji bandoriya Ebû Muslim ditirsiyan. Bi vî aliyê xwe ve mirov dikare bêje; gelên din ji bo xwe ji stemkariya Emewî rizgar bikin, ebasî anîbûn ser rêveberiya dewletê. Lê belê ev rewş, ne li gorî hêviyên gelan bûn.

Gelên ku Emewî ji desthilatdariyê xistin û şoreş pêk anîn, wê careke din bi zordariyeke din re rû bi rû bimînin. Kuştina Ebû Mûslim di dema Mansûr xelîfeyê duyem de pêk hat. bi vê bûyerê re destnîşan dike ku Ebasî weke Emewiyan in.
Desthilatdariya Ebasiyan, li bajarê Bexdayê tê avakirin. Ji bilî Endulusê, li ser tevahiya cîhana Islamê bûne desthilatdar. Ta Xelîfeyê 9. daxwaza wan a bingehîn ew bû, ku dewletê bihêz bikin. Lê bi demê re her ku hêza dewletê lewaz dibû, hêza xelîfeyan jî lewaz dibû.
Bi demê re serweriya Ebasiyan lewaz dibe. Gelek dewletên serbixwe (Samanî, Fatimî, Buweyhî û hwd.) derdikevin holê. Di encamê de di sala 945'an de Buweyhî, paytexta Ebasiyan Bexdayê dagir dikin. Lê belê ji ber bandora olî û ramyarî, xanedaniya Ebasiyan hilnaweşînin. Li gorî berjewendiyên xwe, destûrê didin ku xelîfetî ji ebasiyan re bimîne. Serwerên ku demekê weke xelîfeyan bihêz bûn, wê niha jî bixwazin ku di bin parastina xelîfetiyê de bibin hêz. Xelîfetiya ku nûnertiya tevahiya cîhana Islamê dikir, wê bê dîtin ku weke Papatî û Vatîkanê deshilatdarî û hêza xwe rewa bikin.
Ebasî, li şûna ramyariyên hişk û zordestiyên ku Emewiyan dimeşandin, ramyariyeke nerm a pişaftinê bi rê ve dibin. Hem xwestine berxwedanên ku di dema Emewiyan de nerm bikin, hem jî Islama desthilat di rêjeyeke diyar de bidin pejirandin. Dema Ebasiyan, bi piranî bi hewldanên sazîkirina Islama desthilat ve derbas bûye.

Xelîfetiya Ebasiyan heya salên 1258`an berdewam dike û li ser destê Moxolan têk diçe.

## Dogmatîzim:

Dogmatîzim ew nêzîkbûnên ku ji guftûgo, lêpirsîn û rexneyan re girtî ne. Bi gotineke din, rêbaza ramanê ya li ser ragihandinê ye, ne li ser lêkolîn û mejî ye. Xanedaniya Ebasiyan a ku di salên 750-1250 Z de pêk hat bi awayekî mîna Babila nû bû. Bexda di sala 760 Z de weke Babila nû û paytextê hatibû avakirin. Di vê demê de tevgerek felsefîk û teolojîk a islamî geşbibû, lê bi temamî negihiştibû encama xwe. Guftûgo li ser mejiyê azad dihat kirin. EL Kindî, Farabî, EL Razî, Cabir IBin Heyan, Ibin Sîna û Ibin Ruşd kesayetên girîng ên vê pêvajoyê ne. Di guftûgoyên felsefîk de li derdora 800-1200 Z gelekî li pêşiya Ewropayê ne. Di pêşketina zanistî de jî li pêş in. Her wiha tevgerên weke Elmutezîla û Ixwan elsefa rola mejiyê mirov û zanistê didan pêş. Tevgera Elmutezîla digot "Bi raman û mejiyê xwe, mirov dikare çewtiyê û rastiyê ji hev û du derxîne".

Li ser vî bingehî, ev tevger dibêje "ji bo ku mirov tiştekî bipejirîne û mejiyê wî qebûl bike, divê çi pêwîst be em wê bikin. Divê felsefe bê wergerandin, ji ber ku tenê teolojî têrê nake. Hinek tişt tenê bi zanistê tên diyarkirin. Divê bîrkarî, kîmiya, fîzîk û hwd bên ragihandin. Ji ber vê yekê di derbarê felsefeya Yewnan de, di derbarê agahiyên zanistî de jî, lêkolîn bên kirin. Tevgera Ixwan Elsefa digot; bi zanistê Îsa bûye kurê Xweda. Bi zanistê tariya Ehrîman ji holê radibe û ronahiya Yezdan derdikeve holê. Bi vî awayî her tiştê baş di bingeha xwe de bi zanistî, lêgerîn û lêkolînê pêk tê. Lê tevahiya lêgrrînên felsefî û hewildanên ku Islamê di guhertinan re derbas bikin, Xezalî ew bi tevahî weke kafirî ragihandin û xwestiye bîrdoziya Dewletê serwer bike. Farabî û Ibn Sîna bi xwedênenasiyê tewenbar kirin. Her wiha Ibnruşd ji ber ku ev nêzîkatî, nepejirandiye, pirtûkên wî hatin şewtandin û bi her cureyên zext û îşkenceyê re, rû bi rû maye. Bi heman awayî, Ibn Bacê Ereb feylesofekî ku di sala

1138’an de jiyana xwe ji dest daye, weke bêol(bêdîn) hatiye gunehbarkirin û weke ku xwedê nas nake, hatiye ragihadin. Gotinaên Xezalî yên herî balkêş, ev in:

"Ê ku bi vacê (mentiq) biaxive ew ji rêya xweda, derdikeve". her wiha dibêje: "xweda tiştên herî baş û ji bo mirovan pêwîst nivîsandiye, tiştên ku di Quranê de nehatiye nivîsandin pêximber bi suneta xwe ji me re gotiye. Her wiha tiştên ku di sunetê de tune ne zaniyaran bi ictîhadê ravekirine, êdî tiştê ku mirov nizanibe nemaye. Ji ber vê yekê pêwîstiya mirov bi ictîhadê nemaye, lê belê divê mirov tenê bêk bîne". Bi vî rêbazî deriyê ictîhadê jî digre. Ev bi giştî daxwaza serweran bû, ku di nava civakê de her tiştî bixin bin serweriya xwe. Ji ber ku civakên zana dibin, pêwîstî bi serweran nabînin. Serweran her tim xwestine ku zanînê bixin bin destên xwe. Şaristaniya islamê ji sedsala 12'an û pê de ji hundir ve ji ber girtina deriyên hizirê û ji derve jî, ji ber êrîşên Moxol û Xaçperestan, ketiye pêvajoyeke rawestîn û lipaşketinê.  Êdî nayê rewşa xwe ya berê û wê felsefe û zanist li hemberî dogmatîzma olî têk biçin. Deriyên ramanê bi temamî tên girtin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Ew gelên ku xwe li derdora Ebasiyan kom kiribûn û Emewî rûxandin hêviyên wan pêk nehatin, çima?
2. Sedemên lewazbûna Ebasiyan, rave bike.
3. Çima despêkirina serdema Ebasiyan mîna Babila nû tê naskirin?
4. Girtina deriyê hizrînê rê li pêşiya çi vekir?

**Lêkolîn:** Tevgera Elmûtezîle, lêkolîn bike.

WANE 6

# EBÛ MUSLIMÊ XURESANÎ

Piştî ku Ebasiyan xelîfetî wergirt, paytexta dewleta Islamê bû Bexda. Karê destpêkê yê ku xanedaniya Ebasiyan kiriye, kuştina Ebû Muslimê Xuresanî bû. Ebû Muslim, li Kurdistan û Rojhilata Navîn kesayetekî girîng û hêzdar bû. Ebû Muslim, weke hêvî û pêşengê gelan derket ser dika dîrokê. Her wiha, bi pêşengiyeke rast, ji bo gelan têkoşîn meşand. Ebû Muslim, di sala 718'an de ji dayîk dibe. Ciwantiya wî, li Kûfeyê derbas dibe. Wê demê Kûfe, cihekî ku bi tevgerên xwe yên ramyarî li dijî Emewiyan jiyan dikir. Ji ber vê sedemê, weke dijberekî Emewiyan mezin bû. Pir bala mezinên Ebasiyan dikişand.

Ebû Muslim, di demeke kin de li rojhilat bi tevahî bû kesayetekî hezkirî. Bi taybetî, piştî sala 747'an Ebû Muslimê Xuresanî li dijî Emewiyan dest bi kar û xebatên bangaşeyê dike. Li derdorê digere û di nava mirovan de xebatên xwe dewam dike. Piştî qonaxekê, hêdî hêdî zelal û diyar bû ku wê kengî raperîn çêbibe û kengî dest bi tevgerê bike.

Emewî ji pêşketinên li Xuresanê agahdar in û dikevin nava liv û tevgerê. Dibêjin; herî kêm hevalbendî û yekîtiya Ereban çêke û bi hev re tevbigerin. Lê belê, tu encam negirtin. Ji ber ku Ebû Muslim ketiye nava liv û tevgerê, bajaran yek bi yek digire û li herêmê serdest dibe. Yekîneyên Emewiyan ên ku bi ser wan de dişînin, têk diçin. Bi vê binketinê re desthiladariya Emewiyan a li Xuresanê hema bêje bi tevahî ji holê rabû. Serdestiya Emewiyan a li vê derê bi dawî dibe.

Serdestiya Ebasiyan ava dibe. Ebû Ebas Elsefah, xelîfetiyê werdigire. Ebû Muslim jî ji bo avakirina rêxistinê, ji nû ve li Xuresanê weke parêzger tê erkdarkirin. Ebû Muslim, di

jiholêrakirina xanedaniya Emewiyan de xwediyê kedeke mezin e.

Di avakirina dewleta Ebasiyan de, di rêzên pêş de cih girtiye. Her ku diçe hêzê bi dest dixe. Bandor û hêza wî ya li herêmê her ku diçe zêde dibe. Ev jî dibe sedem ku rêveberiya Ebasiyan jê ne aram û gumandar be. Bi rêya hin karker û parêzgerên Xuresanê, di şikandina hêza wî de hewildanên wan çêbûn. Ebû Muslim, pêşî li van hewldanan girt. Giranî û bandoriya wî ya di nava dewletê de zêdetir bû.

Ebû Ce'fer El Mensûr ku bûye xelîfe, ji ber vê rewşê; bi ne rihetî jiyan dikir. Dihizirî ku divê ev kesayet ji holê rabe, li hemberî wî hewldan bên destpêkirin. Ebasiyên ku bi saya Ebû Muslim li şûna Emewiyan derbasî xelîfetiyê bûne, dizanîbûn ku Ebû Muslim hêviya hemû kesên bindest û kesayetek pir bihêz e. Ev rewş, li pêşiya desthiladariyê astengiyek e. Ji bo wê, Ebû Muslim vedixwînin Bexdayê.

Li wir, bi bêbextiyekê Ebû Muslim tê kuştin. Di heman demê de derdorên nêzîkî wî jî, bi dar vedikin. Bi darvekirina Ebû Muslim re Rojhilata Navîn şêweyekî nû digire. Derdorên ku bawerî bi Ehlibeyt tanîn, ji ber ku Ebasî nêzîkî malbata pêxember didîtin, piştgirî didan wan. Lê belê piştî van bêbextiyan, baweriya bawermendan a ji bo wan lewaz dibe. Li hemberî vê rewşê, gel û mezhebên dijber rêxistinbûna xwe bihêz dikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Piştî ku Ebasî bûn xelîfe, di destpêkê de çi kirin? Veke.
2. Bi kurtasî, li ser jiyana Ebû Muslimê Xuresanî binivîse.
3. Ebû Muslim, bi kîjan rêbazê li hemberî Emewiyan derketiye? Veke.
4. Ebû Muslim, Emewî li ku şikandin?
5. Ebû Muslim, bi çi awayî tê kuştin?

# BEŞA SÊYEM

- ❖ TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (1)
- ❖ TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (2)
- ❖ TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (3)
- ❖ MÎRNIŞÎNÊN KURD (1)
- ❖ MÎRNIŞÎNÊN KURD (2)
- ❖ MÎRNIŞÎNÊN KURD (3)

WANE 1

# TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (1)

Dema ku Islam hat Kurdistanê, kurdan xweradest nekirin; hinek ji wan, demekê şer kirin û xwe radest kirin, hinek ji wan qet radest nebûn û hinek ji wan, rêbazên xwe guhertin û berxwedana xwe berdewam kirin. Gelek awayên berxwedanê li hemberî deshilatdariya Islamê li pêş ketin. Çend ji wan awayên bingehîn jî, ev in:

1. Huremî
2. Babek
3. Yarisanî
4. Qermatî

## ❖ Huremî:

Çandên gelan, tevî zor û perçiqandinê, bi temamî winda nabin. Dibe ku zordar çandên gelan heya astekê windayî bikin, bidin aliyekî û çepel jî bikin, lê bingehên wê di kûrahiya bîrweriya niştimanî de zindî dimînin û li hêviya mercên ku ji nû ve bêne vejandin dimînin. Di dîrokê de rewşa şaxên çanda Zeredeştiyê jî bi vî awayî bû. Tevî wan şerên ku Dewleta Xîlafeta Islamî li dijî wê dane destpêkirin, dîsa jî hin hêmanên Zeredeştiyê di kûrahiya hişmendiya civakî ya Aryenî de zindî man. Serhildanên Huremiyan di Serdema Xîlafeta Islamî de nimûneyên herî diyar in.

Huremî piştî ku Sasaniyan serhildana Mazdek têk bir, êdî tu kesî ji wan newêrîbû li dijî Sasaniyan rabe. Lê belê kevaniya Mazdek bi du alîgirên Mazdek re çûn bajarê Elrey. Li wir, bi rengekî veşartî baweriya xwe belav kir û piştî demekê gelek kesan ev bawerî wergirt. Gelê herêmê navê Huremî li wan kir. Huremiyan rengê sor weke sembol ji bo al, cil û bergên xwe bi

kar tanîn, lewra di jêderên Islamî de bi navê (Elmuhmera) ango xwediyên rengê sor hatine naskirin. Sembola rengê sor careke din di sedsala 14-15 an de li gel Kurdên Elewî hate dîtin. Bi Turkî ji wan re (Qizilbaşî) hate gotin ev jî tê wateya xwediyên seriyên sor ji ber ku wan şalên sor didan serê xwe.

Huremiyan weke Mazdekiyan bi dijbertiya xêrxwaziyê û şerxwaziyê bawer dikir. Xwedî rêbazeke civakî û şoreşgerî bûn. Doza belavkirina zeviyan li cotkaran dikirin. Di milk, saman û alavên berhemê de alîgirên hevbeşbûnê bûn. Doza rakirina jinê ji wê asta nizim ku gihaştiyê dikirin. Doza berxwedanê li dijî zordarî û çewsandinê dikirin. Her wiha alîgirên rakirina cûdahiyên çînî û civakî bûn.

Huremiyan ev gilî û gazinên xwe bi zincîreke raprîn û serhildanên gelemper diyar kirin.

## * Serhildana Sunbad:

Vê serhildanê di sala 755 an Z. de, li Xuresanê û Rojhilatê Kurdistanê dest pê kir. Birêveberê vê serhildanê Sunbad ê ku hevalekî pir nêzîk ê Ebû Muslim bû. Serhildanek cemawerî û civakî bû. Armanca wê tolhildana Ebû Muslim bû. Alîgirên vê serhildanê bawer dikirin ku Ebû Muslim nemiriye, lê hilkişiyaye asîman û hîn zindî ye. Xelîfeyê Ebasî Ebû Cafer El Mensûr ev serhildan di xwînê de perçiqand û derdora 6000 serhildêr dane kuştin. Hemû jin û zarokên wan kirin kole û cêrî û Sunbad jî hat kuştin.

## * Serhildana Ustazîs:

Vê serhildanê di sala 766 an de, li Xuresanê bi rêveberiya Ustazîs dest pê kir. Ev jî tevgereke cemawerî û civakî bû, lê piştî şerên giran bi hezaran serhildêr hatin kuştin û dîlgirtin û di encamê de serhldan têk çû. Her wiha Ustazîs jî hat dalqandin.

## * Serhildana El Muqene:

Vê serhildanê di sala 776 an de li Xuresanê dest pê kir. Ev serhildan gelêrî û mezin bû; bi rêveberiya Haşim Ibin Hekîm bû. Bi navê Elmuqene dihat nasîn ji ber ku maskek dida ber rûyê xwe. Piştî pir şeran, ev serhildan jî di sala 779 an de hat şkestin. Dema ku serhildan hat şkestin, Elmuqene di keleha xwe de hat dorpêçkirin. Êdî ji bo ku xwe radest neke, agirek gur dada û wî û malbata xwe û hin alîgirên wî xwe avêtin nava agir. Ev helwesta qehremanî di bîrweriya gelêrî de çend sedsalan zindî ma.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Huremî kî ne û xwe dispêrin kîjan kevneşopiyê?
2. Pîvanên civakî yên Huremiyan rave bike.
3. Bi çi armancê serhildana Sunbad rabû?
4. Tu ji awayê bidawîkirina jiyana Elmûqene, çi têdighêjî?

WANE 2

# TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (2)

## ❖ Serhildana Babek:

Serhildana Babek yek ji serhildanên Huremiyan a herî demdirêj bû. Vê serhildanê di sala 816 an de, di dema Xelîfe Elmamûn de dest pê kir. Serhildêr li hember leşkerên Dewleta Ebasî yên herî hêzdar rawestiyan. Vê serhildanê herêmên gelekî fireh girtin nava xwe weke; Ezerbêcan, beşê mezin ji rojhilatê Kurdistanê û rojavayê Ermîniyayê. Piraniya niştecihên wan herêman Kurd û Deylem bûn. Rola çiyayan di serkeftina serhildêran de pir mezin bû. Serhildêran xwe di çiyayên asê yên tijî daristan diparastin û bi êrîşên lêde û vegere, li gorî şerê gerîlatî şer dikirin. Êrîş dibirin ser kerwanên xurdemenî yên leşkerên Ebasî û dixistin dest xwe. Bi vî awayî leşkerên Ebasiyan pir caran ji ber wan direviyan û di gelek şeran de têk çûn. Ta ku Xelîfe Elmamûn mir, Babek jê re bibû weke kulekê.

Lê di dema Elmutesim Billah de, Dewleta Ebasî tektîkên nû bi kar anîn.

1. Hêzên taybet ku ji wan re Kohbanî ango çiyayî dihat gotin ava kirin. Ev hêz, ji bo şerên çiyayî, dakirkirina cihên bilind û asê, avakirina kelehan û kolandina xendeqan, hatibûn perwerdekirin.
2. Belavkirina sîxur û qelawuzan li herêmên serhildêran ji bo ku nûçe û agahiyên derewîn belav bikin û wijdanê derbegan bi diravan bikirin. Ev çîna derbegan ji ber bernameyên civakî yê serhildanê li dijî wê bû.

Bi vî awayî leşkerên Ebasiyan di şerê Hemezanê yê sala 833 an de Huremî di qada şer de şkandin û bi hezaran Huremî hatin kuştin. Ên ku man jî derbasî nava axa Bîzensiyan bûn û li bakurê

Kurdistanê hatin bicihkirin. Bi vî rengî, piştî kuştina hin mezinên serhildanê bi îxanetî, leşkerên Xîlafeta Ebasî serkeftin pêk anîn, gelek Huremî kuştin û pir kes jî dîl girtin. Di sala 837 an de navenda serhildanê **keleha Bez** jî dagir kir. Wê demê Babek bi rengekî veşartî çû herêmên bakurê kurdistanê yên ku di bin serweriya Bîzansiyan de bûn da ku imperatorê Bîzansî Teyofîl destekê bide Babek û dîsa vegere û serhildanê ji nû ve berdewam bike. Dema ku Babek derbasî Ermîniyayê dibû, xwediyê keleha (Şakî) Suhêl Bin Sunbad pêşwaziya wî bi dilxweşî kir û ew kire mêvanê xwe. Lê belê, bi dizî peywendiyan li gel Efşîn, birêveberê leşkerên Ebasiyan dike da ku Babek radestî wî bike. Suhêl Babek vexwend nêçîrê li geliyekî ji geliyên wê herêmê. Efşîn jî, li gor peymana wî bi Suhêl re, li wî gelî kemînek vegirtibû û wisa Babek dîl hat girtin. Piştre Babek tînin bajarê Samerayê li Îraqê. Xelîfeyê Ebasî ferman dide ku Babek li pêşiya wî bikujin. Ferman da celadan ku pêşî dest û piyên wî bibirin û şûr têxin nav parsûyên wî de da ku bêhtir biêşe. Lê belê Babekê qehreman her li ber xwe da, ne naliya û ne jî kir hewar û gazî. Bi parçeyên ku ji destên wî mabûn xwîna ku diherikî li rûyê xwe dida. Xelîfe jê pirsî ku çima ew wisa dike? Got; ez wisa dikim da ku nebêjin Babek ji mirinê tirsiyaye.

Ev gotûbêj wisa di jêderan de hatiye. Wisa jî jê tê têgihiştin ku Babek rêveberekî qehreman bû û nimûneyeke bê hempa bû. Wî dest ji durişmeya serhildanê (rengê sor) heya kêliya dawî ji jiyana xwe berneda. Bi vî awayî serhildana dawî ya Huremiyan li dijî Dewleta Xîlafeta Ebasî têk diçe.

## ❖ Yarîsan:

Ev tevger li Loristanê di sedsala heftem de li pêş dikeve û ji wê de belavî Şehrezûr û Huremanê dibe. Li ser bingehê parastina

çanda Zerdeştî, wekî helwestekê li dijî Islama dijber li pêş dikeve. Ji xwe re **Ehlulheq** jî dibêjin; ango gelê rastiyê yan jî mirovê rast. Yarîsan tê wateya civaka dost.

## Gelek taybetmendiyên Yarîsaniya hene wekî:

1. Perestina bi rêya mûzîkê.
2. Di civatên olî de nan û goştê kelandî li ser bawermendan belav dikin.
3. Veguhestina giyanan li ser bingehê ku yê başiyê bike wê bighêje asta **pîr** û wê giyanî wî here esîmanê bilind, lê yê ku kirêtiyê bike wê ji nû ve di rewşin xirab de bê vejandin ji bo hisabxwestinê.
4. Sîstema biratiyê di navbera zilam û zilaman û jin û jinan de li pêş bû.
5. Jin di nava civakê de, hem di rêveberiya civakî de, hem jî di rêveberiya olê de cih digire.

Heya roja îro jî ev bawerî li Rohilat û Başûrê Kurdistanê berdewam dike û di nava kurdan de şaxekî herî bihêz yê ku li hember Islama dijber, li ber xwe dide. Gelek dîroknasên kurd, Yarîsaniyan weke pêşengê wêjeya kurdî digirin dest. Heman dîroknas dibêjin ku “Eger Yarîsanî nebana wêjeya kurdî wê ew qasî pêşneketiba”. Tişta balkêş jî di Yarîsaniyê de ew e ku hejmareke mezin ji wêjevanên jin tê de hene, mirov dikare bêje ji hemû wêjevanên jin yên Kurdistanê û yên di hemû serdeman de bêtirin. Pêşengên ola Yarîsaniyan Pîr Şalyar û Behlûlê Mahî ne. Navê pirtûka wan ya pîroz **Ser Encam** e, ew jî tê wateya **çarenûs** a ku bi zimanê Kurdî û bi zaravayê Goranî hatiye nivîsîn.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Serhildana Babek li kîjan herêman belav bû?
2. Serhildana Babek çawa bi hêz dibe?
3. Tektîkên ku dewleta Ebasî li dijî serhildana Babek bi kar anîn, bîne ziman.
4. Hin taybetmendiyên Yarîsaniyan, şîrove bike.

WANE 3

# TEVGERÊN LI DIJÎ ISLAMA DIJBER (3)

## ❖ Qermatî:

Ev tevger di sedsala 9`an de li pêş dikeve. Serokê wê Hemdan Eleşes e yê ku bi bejina xwe ya kin dihat nasîn, ji bo vê yekê Qurmit jê re dihat gotin. Tevgereke komînal e, li ser bingehê wekheviyê ava bûye û li dijî du tiştan derketiye:

1. Rûxandina pergala ramyarî di Imperatoriya Ebasî de.
2. Tunebûna dadweriya civakî di sîstema Ebasî de.

Li hemberî Imperatoriya Ebasî şer dikin û li gelek cihan bandora wan çêdibe. Di bingehê xwe de li Behrên û piştre li hemû welatên kendavê belav bûn. Di heman demê de, nêzî 30 salî li welatên Şamê û beşeke ji Iraqê jî serwerî kirine.

Şerên Qermatiya pirr balkêş bûn. Mînakên vê jî hene wekî hin şer di navbera Qermatî û Ebasiyan de rûdaye. Şervanên Qermatiyan hejmara wan 2 hezar bûn, yên Ebasiyan 80 hezar bûn. Lê tevî wiha jî Ebasî dişkestin ji ber baweriya Qermatiyan bi sîstema xwe ya civakî.

Li gorî Qermatiyan hin tişt hene pûç û bê wate ne mîna çûna hecê li gorî wan, ku mirov hin kesên sêwî an jî hejar xwedî bike wê baştir be. Ji ber vê yekê Islam ji nû ve şîrove kirin, rexne kirin û li şûna wê sîstema elternatîf ava kirin weke hêzeke sincî, çandî li ser bingehê wekheviya civakî dipejirandin. Ne dijberî xweda û pêximber bûn. Ola islamê dipejrandin, nimêj dikirin û rojî digirtin lê hin tiştên din jî bingeh nedigirtin weke sîstema fermî.

Lê belê, di dîroka fermî de wan pir reş dikin û wan bi rengekî xirab dane nîşandan. Dibêjin her tiştên xwe li hev û du parve

dikirin û mijarên sincî dikin rojevê, xwedêgiravî wiha dibêjin: (têkilî di navbera bav û qîzan de kur û dayikan de hene) ango bi vî rengî wan rûreş dikin, lê ev yek ne rast e. Reşkirina ku li dijî wan hat kirin û êrîşên tund ên Dewleta Ebasiyan, bi alîkariya turkan, bû sedema têkçûna tevgera Qermatî.

## ❖ Tevgera Zincî:

Tu carî xelîfeta Ebasî guman nedikir ku şoreşek bi vî rengî li dijî wan wê ji aliyê koleyan bê lidarxistin. Ne tenê ji aliyê koleyên Efrîkayê yên ku di karên giran de tên bikaranîn, lê belê ji aliyê hemû kesên ku ji stemkariya Ebasiyan bêzar mabûn. Van koleyan bajarê Mûxtara yê li Başûrê Besrayê dikeve, ji xwe re kirin paytext.

Armanca vê tevgerê ku stemkariya li ser koleyan dihat meşandin, ji holê rake. Li hember desthilatdariya Ebasiyan serî hildan. Dema dewletê dît ku hêza wan zêde dibe, artêşek bi ser wan de şand, lê ev beramberî ne hêsan bû û di gelek şeran de, tevî hejmara koleyan a kêm bi bin ketin.

Bi fermandariya kesayetekê bi navê Elî kurê Mihemed ev raperîn li dar ket. Hewildanên Elî yên li Behrênê hatin valaderxistin, lewma bi komkirina hêza koleyan û bi hezaran kesên şoreşger ji nû ve raperînek li himber Ebasiyan vejand.

Elî biryara derbasbûna Besrayê digre û ji hêla başûr rojhilat êrîş birin  ser leşkeran. Vê rewşê dewleta Ebasî xiste metirsiyê. Ji bo têkbirina wan bi artêşeke mezin bi ser tevgerê de çûn. Di encamê de zêdetirî 250 hezar mirov hatin kuştin. Ji destpêka vê tevgerê heta jiholêrakirina wê zêdetirî 14 salan rêveberiyeke komînal di herêmê de dan meşandin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Tevgera Qermatî li himberî çi derket?
2. Şîrovekirina Islamê li gorî Qermatiyan bi çi awayî bû?
3. Ji bo rûxandina Tevgera Qermatî çi rêbaz hatin bikaranîn? Şîrove bike.
4. Tevgera Zinciyan li ku û li himberî çi derket?

**Lêkolîn:**

Awayê dawîlêhatina tevgera Zincî, lêkolîn bike.

# MÎRNIŞÎNÊN KURD (1)

## MERWANÎ (DOSTIKÎ) 983-1085

Gelê Kurd jî weke hemû gelên din bi guherînên ramiyarî yên ku di dewleta Ebasî de çêbûn, bandor dibûn. Di sedsala 9 an de dewleta Ebasî lewaz bibû, sîstema wê ya aborî xerab bibû. Parêzgerên wê stemkarî û çewsandin li ser gel dimeşandin. Şarezatî li paş ketibû û çavdêrî nemabû, lewra rê li ber pêvajoyeke nû vebû. Herêmên rojihilatê dewleta Ebasî jê cûda dibin û dewlet û mîrnişîn li wir ava dibin. Lê ev dewlet û mîrnişîn neçar bûn ku binfermanî û dilsoziya xapînok ji Xelîfeyên Ebasî re pêşkêş bikirana. Lewma pêşbirkî û hevrikî di nava gelên herêmê de çêbibûn da ku ji dewleta Ebasî cûda bibin.

Gelê Kurd ji sedsala 10 an û pê de li her aliyê Kurdistanê dest bi serhildanê kir. Di encama van serhildanan de dewlet û



mîrnişînên serbixwe derketin holê. Yek ji wan mîrnişînên serbixwe yên di Kurdistanê de hatin damezrandin mîrnişîna Merwaniyan e.

## Damezrandina Dewleta Merwaniyan:

Damezrînerê dewleta Merwaniyan **Bazê kurê Dostik** e. Baz li dijî deshilatdariya Hemdaniyan a ku beşeke girîng ji bakurê Kurdistanê di destê xwe de digirtin, serhildan da despêkirin. Di vê serhildanê de gelê Kurd yê li herêma Amed û Meyafarqînê herî zêde li rex Baz cih girtin. Bi vî awayî bajarê Meyafarqînê ku navendeke girîng a dewleta Hemdaniyan bû, ji wan hat standin. Piştî girtina bajarê Meyafarqînê artêşên ji Helebê ji bo sezakirina Baz, ji aliyê rêveberên Hemdaniyan ve hatin şandin, lê bi ser neketin. Têkçûna Hemdaniyan bû sedema jidestçûyîna bajarê Amedê jî. Bi vî awayî her ku çû deshilatdariya Baz belavî herêmê bû.

Di sala 985’an de Baz serxwebûna xwe da diyarkirin. Weke navenda mîrnişînê jî bajarê Meyafarqîn hat pejirandin. Baz, xebatên berfirehkirina sînorên mîrnişîna xwe ji vir da meşandin. Bandora Hemdaniyan her ku çû lewaz bû. Di demekê kin de herêmên Riha, Amed, Xarpût heya Cizîr û Nisêbînê di nava sînorên dewleta Merwaniyan de cih girtin.

Berdewamiya deshilatdariyê û parastina sînorên mîrnişînê girêdayî rêveberiyeke xurt û artêşeke bi displîn bû. Bi vê boneyê Baz, girîngiyeke mezin dida xebatên rêveberiyê û artêşê. Birayê xwe weke parêzgerê Meyafarqînê dabû diyarkirin. Wî bi xwe jî bi artêşa xwe ve ji bo destxistina herêmên din têkoşîn dimeşandin.

Serkeftinên Baz, rêveberiya Hemdaniyan û xelîfeyê Bexda jî ditirsand. Ji ber vê sedemê hêzên Ebbasî û Hemdaniyan bi hev re êrişî welatê Baz kirin. Baz ji bo parastina welatê xwe berxwedaneke bi nirx da nîşandan. Herwiha di vî şerî de jiyana xwe ji dest da.

Dema Baz hat kuştin, xwarziyê wî yê mezin **Hesenê Kurê Merwan** gelê Kurd li derdora xwe da komkirin. Dijminê xwe şopand û piraniya wan kuştin. Piştî vê bûyerê çû Hesenkeyfê, ji vir jî berê xwe da Meyafarqînê. Li vê derê di sala 991'ê de rêveberiya xwe da diyarkirin. Bi vî awayî rêveberî ket destê Merwaniyan.

Di vê pêvajoyê de Bîzansiyan leşker şandin derdora Xelat, Melazgir û Ercîşê. Hesenê bavê Elî êrîşî wan kir û ew têkbirin. Bîzansiyan aşitî xwestin li ser vê yekê di navbera wan de Peymana Aşitiyê hat imzekirin. Bi sînorkirina metirsiya Bîzansiyan re, di welatê wan de aramî pêk hat. Di sala 997 an de Hesen bi reşkujiyekê tê kuştin, lewra birayê wî **Ebû Seîd Elmensûr** dikeve şûna wî. Lê Ebû Seîd jî di sala 1011 an de tê kuştin û birayê wî **Nasirûldewla** şûna wî digire. Nasirûldewla bi qasî 50 salî mîrnişîna Merwanî bi awayekî serkeftî bi rê ve bir û di dema wî de mîrnişîna Merwanî serdema xwe ya herî geşbûyî jiyan kir. Nasirûldewla zanîn û zanist belav kirin. Girîngî dida avahîsaziyê; keleh, nexweşxane, serşok, mizgeft û pirtûkxane li Meyafarqînê dan avakirin. Qenalên avê kişandin nava bajar, her wiha baxên giştî jî ava kirin.

## Lewazbûn û Hilweşîna Dewleta Merwanî:

Dewlemendî û jiyana pêşketî ya mîrnişîna Merwaniyan bala rêveberên Selçûqî pir zû kişand ser xwe. Ji bo dagirkirina herêmên di bin destê Merwaniyan de Wezîrê imperatoriya Selçûqiyan Nizamûlmûlk ketibû tevgerê.

Êdî mîrnişîna Merwaniyan demeke dirêj di bin gefên Selçûqiyan de dimîne. Carnan bi şer, carnan jî bi dayîna bacan welatê xwe ji êrişên wan parastin. Lê êrişên wan bi hişkbûneke mezin bê navber berdewam dikirin. Mîrnişîna Merwaniyan di sala 1086’an de bi êrîşeke mezin a Selçûqiyan re rû bi rû dimîne. Di vê salê de Amed û Meyafarqîn hatin dorpêçkirin. Dorpêça wan her du bajaran salekê berdewam kir. Di sala 1087’an de li

derdora Amedê şerekî mezin pêkhat. Di encama vî şerî de bajarê Amedê ket destê Selçûqiyan de. Bi heman awayî şerê li ser navenda Merwaniyan jî pir dijwar derbasbû. Li hember êrîşên hovane yên Selçûqiyan bajêr hew karî xwe biparêze û ket destê wan de. Bi ketina Amedê re, bajarên din yên Merwaniyan jî yek bi yek ketin destê Selçûqiyan de. Rêveberê Merwaniyan Mensûr, li bakurê Bexda gundekî bi navê Herbe hat bicihkirin. Mîrnişîna Merwaniyan biqasê sed salan jiyan kiribû, bi vî awayî ji holê hatibû rakirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çi bû sedem ku dewlet û mîrinşînên serbixwe di serdema Ebasiyan de derkevin holê?
2. Geşbûna mîrnişîna Merwanî di serdema kîjan mîrî de bû? Veke.
3. Kê mîrinşîna Merwanî ji holê rakir û çima?

**Lêkolîn:**

Avahîsaziya ku di dema Merwaniyan de pêk hat lêkolîn bik.

WANE 5

# MÎRNIŞÎNÊN KURD (2)

# LORISTAN

Loristan herêmeke girîng ji herêmên Kurdistanê ye, tê de du mîrnişîn çêbûne (Loristana Mezin û Loristana Biçûk). Ev herêm li Rojhilatê Kurdistanê li aliyê başûr dikeve. Hemû niştecihên wê ji Kurdên şî'a ne û bi zaravayê Behlewî yê bi koka xwe ji Medî tê, diaxivin.

Di sala 1106 'an de û bi sedema şerên hundirîn ji aliyê Çiyayê Leylûnê (herêma Efrînê) zêdetirî 400 malbatî koçî Loristanê dibin û bi demê re du mîrnişînan ava dikin.

## 1. Loristana Mezin:

Ev mîrnişîn bi navên cuda dihat naskirin ew jî girêdayî kesên ku rêveberiya wê kirine mîna Mîrnişîna **Fedlewî** girêdayî **Serdar Ebû Tahirê Fedlewî** damezrînerê vê mîrnişînê. Her wiha navê **Hezar Esp** jî lê tê kirin ew jî girêdayî rêveberê wê yê duyem Hezar Esp ê ku asta mîrnişînê ya leşkerî, aborî û avahîsazî gihand lûtkeyê bi saya rêveberiyeke bi rêk û pêk û bi sedema hatina pêlên êl û malbatên kurd û bicihbûna wan li Loristanê. Vê yekê bi xwe re pêşketinên jiyanî ji aliyê çandinyî, ewlehî û bazirganiyê ve anîn. Bi vî awayî Xelîfê Ebasî jê re diyarî rêkirin û ew weke parêzgere li ser mîrnişîna Loristanê pejirand. Ev rêveberî di sala 1257 'an de bi mirina wî bi dawî dibe.

Piştî mirina Hezar Esp kurê wî yê bi navê **Tîkle** dikeve şûna wî Tîkle hewl da ku li hember êrîşên Ebasiyan raweste û di vê yekê de bi ser ket. Her wiha di navbera têkilî û dijminatiya bi Holako re vê mîrnişînê ziyanên mezin xwarin ta ku li ser destê Tîmorleng têk diçe.

## 2. Loristana Biçûk:

Ev mîrnişîn li aliyê bakur rojavayî Loristanê li ser destê malbata Xorşîdî çêbûye.

Loristana Biçûk di bin serweriya Selcûqiyan de bû û bi parêzgerê selcûqiyan **Husam Eldîn Suhlî** re di nava hevkariyê de bûn. Di sala 1174 'an de Serdarê Malbata Xorşîdî Şûca Eldîn Xorşîd weke parêzger li Loristanê hate erkdarkirin û bajarê **Xirmadê** weke paytext ji xwe re hilbijart.

Xorşîd, gelek êrîş ji ser welatê xwe vegerandin û bêtirî 100 salî temenê wî dirêj kir heta ku welatê xwe gihand asteke bilind. vê yekê hişt ku gelê wî, wî bi êş  oxir bike û gora wî bike ziyaretgeh.

Vê mîrnişînê, bi salan dewam kir û gelek rêveber di ser re derbas bûn heta sala 1840'î  şahê Sefewî Rida Behlewî serxwebûna Loristanê nepejirand û ew girêdayî Îranê kir.

# ŞEDADÎ

**Mihemed Şedadî** ji êla rewandiyan bû. Di sala 951`ê de, vê mîrnişînê dadimezrîne. Selehedînê Eyûbî jî ji êla rewandiyan bû.

Şedadiyan, biqasî sed salî welatê xwe bi rengekî serkeftî bi rê ve bir. Bermayên dîrokî yên ji vê demê mane, pêşketin û dewlemendiya vê mîrnişîna kurd, destnîşan dikin. Rêveberên Şedadiyan, girîngiyeke mezin didan hozanvan, nivîskar û mirovên zana.

Mîrnişîna Şedadiyan, piştî demekê weke mîrnişînên din ên Kurdistanê rastî êrîşên Selçûqiyan hat. Di sala 1064`an de, Sultanê Selçûqî Melikşah, êrîşî welatê Şedadiyan dike û dawî li deshilatdariya wan tîne. Lê tê xuyakirin ku heya demekê, ew girêdayî Selçûqiyan mane û di welatê xwe de birêveberî meşandine.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çawa Loristana Mezin têk çû?
2. Çima gelê Loristana Biçûk, nirxeke mezin dida mîr Xorşîd?
3. Çima Selcûqiyan, her dem hewil didan ku mîrenşînên kurd, birûxînin?

WANE 6

# MÎRNIŞÎNÊN KURD (3)

## DEWLETA EYÛBÎ

Ev dewlet ji aliyê fermandarê kurd **Selahedînê Eyûbî** ve, hat avakirin. Selahedînê Eyûbî di sala 1138`an de, li Tekrîtê ji dayîk bûye. Bavê Selahedîn ( Eyûb) û mamê wî Şêrko di xizmeta mîrê Mûsilê (Îmad Eldîn Zengî) de bûn. Selahedîn, bi saya bav û mamê xwe, hunera birêvebirin û artêşê qezenc kirin.

Selahedîn, di 14 saliya xwe de, tev li artêşê bû. Piştî ku Selahedîn û mamê xwe Şêrko li Şamê demeke diyar di artêşê de xizmet kirin, bi fermana Nûredîn Zengî weke serfermandar bi artêşekê re ber bi dewleta Fatimî ya Misrê ve bi rê ketin. Dewleta Fatimî ji şerkirina bi vê artêşê re ditirsiya, ji ber vê yekê rêya lihevhatinê hilbijart. Şêrko bû wezîrê dewleta Fatimî. Piştî demeke kurt Şêrko mir û Selahedîn hat cihê wî. Di sala 1171`ê de Selahedîn, dawî li dewleta Fatimî anî.



Demekê bi navê Nûredîn Zengî desthilatdarî bi rê ve bir. Di sala 1174`an de, serxwebûna xwe diyar kir. Li vir, li dijî xaçperestan kete nava amadekariyeke mezin. Artêşek ji hemû gelên Rojhilata Navîn (kurd, turk, pers, ereb…) ava kir. Gewdeyê bingehîn û hêza lêdanê ya artêşê ji kurdan pêk dihat. Vê artêşê, pirê caran bi xaçperestan re şer kiriye, herî dawî di şerê Hetînê de (1187 'an) xaçperest rastî binketineke berçav hatin û Selahedîn derbasî Qudsê bû. Piştî vê rizgarkirinê Misir, Sûrye, Yemen û Iraq ketin bin kontrola Selahedîn. Piştî van serkeftinên Selahedînê Eyûbî, êrîşa sêyem a xaçperestan, dest pê kir. Ev êrîşa ku ji artêşên sê dewletan pêk dihat, bi bin xist û di 1193`an de li Şamê weke fermandarê Rojhilata Navîn, hat nasîn.

Selahedînê Eyûbî, weke kesayeteke kurd di aliyê hişmendî de rêya Şafi'î ji xwe re bingeh girtibû, lewma hemû zana, fîlozof û kesayetên dûrî vê rêbazê li ser destê wî hatin bêbandorkirin, mîna Sehrewerdî yê ku weke fîlozof di wê demê de dijiya û bi dehan pirtûk çêkiribûn, lê bi xwedanenasiyê hate tewanbarkirin û bi biryara Selahedîn hat kuştin.

Selahedînê Eyûbî, çavên xwe li Şamê, li jiyanê girt û li wê derê hat oxirkirin. Berî mirina xwe, dewleta Eyûbî di nava malbata xwe de dabeş kir. Lê di nava zarokên wî de pirsgirêk derketin. Ji ber vê yekê birayê wî (Eladil) hemû ji text xistin û yekîtiya malbata Eyûbî ji nû ve saz kir. Piştî wê mîna birayê xwe (Selahedîn) dewlet di navbera zarokên xwe de dabeş kir. Lê dîsa nakokî di nava zarokên wî de derketin, lewma di demeke kurt de Memlûkiyên ku wekî kole dihatin bikaranîn, dewlet rûxandin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Taybetmendiyên Selaheldîn çi bûn?
2. Selaheldîn çawa bû desthiladarê Misrê?
3. Çi hiştiye ku selaheldîn di dîrokê de ewqasî bi nav û deng be?
4. Dewleta Eyûbî çawa ji holê rabû?

**Lêkolîn:**

Çima Sehrewerdî bi xwedanenasiyê hat tewanbarkirin? Veke.

# BEŞA ÇAREM

- IMPERATORIYA SELÇÛQÎ
- SEFERÊN XAÇPERESTAN
- DAGIRKERIYA MOXOLAN
- SERDEMA OSMANIYAN
- SERHILDANÊN GEL LI HEMBER OSMANIYAN
- DEWLETA SEFEWÎ
- ŞERÊN SEFEWÎ Û OSMANIYAN LI SER KURDISTANÊ
- IDRÎSÊ BEDLÎSÎ Û BERBELAVBÛNA OSMANÎ DI KURDISTANÊ DE
- SERHILDANA KELEHA DIMDIMÊ
- PEYMANA QESRA ŞÊRÎN

WANE 1

# IMPERATORIYA SELÇÛQÎ

## Hatina Tirkan a Rojhilata Navîn:

Dema ku ereban di sala 751'ê de Çîn li Talasa Asyaya Navîn bi bin xistin, tirkan Islam û şaristaniya Rojhilata Navîn nas kirin.

Pejirandina Islamê ya tirkan, di destpêka salên 900'î de ye. Di dema Ebasiyan de li aliyê Îran û Xuresanê, dewletên tirk hatin avakirin. Dewletên weke; Harzemşah, Xeznewî û Karahaniyan, di navbera Asyaya Navîn û Rojhilata Navîn de weke pirekê hatin avakirin. Di vê demê de bi taybetî, di hilweşîna Dewleta Buweyhan de bandora van hêzan hebû. Bi taybetî, Dewleta Selçûqî ya mezin ku bi Şerê Dandanaqanê yê di sala 1040'î de hat damezirandin, ji bo ku berbelavî Rojava bibe; di sala 1055'an de dewleta Buweyhî ji holê rakir.

Di wê demê de tirkan her çi qas dewlet û rêxistinên xwe yên avanî û desteya jor pêş xistibin jî, lê di çîn û beşên civakê û nava



gel de desthilatdariya xwe bi cih nekiribûn. Di dema hatina tirkan a ji bo Rojhilata Navîn de şaristaniyên ku li pêşberî xwe dîtin, di asteke pir bilind de şaristaniya wan a koçber ku bi koçberiyê jiyan dikirin, derbas dikir. Ji bo ku di nava vê şaristaniyê de bi cih bibin, çînên desthilatdar ên tirk, bi taybetî şîrove û riya sunîtiyê ya Islamê hilbijartin.

Bi vê hilbijartinê re, di Rojhilata Navîn de bi taybetî, li derdorên nêzî sînorên Îran û Asyaya Navîn dest bi berdewamkirina jiyana xwe kirin, lê nekarîne zêde biketana nava herêmên hundir ên Rojhilata Navîn. Her çiqas ev dewlet weke şaristaniyên tirk tên bilêvkirin jî, lê ev rewş tenê di asta navlêkirinê de dimîne û taybetmendiyên şaristaniyên Rojhilata Navîn girtin. Tirk, li Asyaya Navîn ji ber zextên Çîn û Moxolan nedikarîn jiyan bikin. Ji ber vê yekê, neçar man û berê xwe dan Rojhilata Navîn.

## Berfirehbûna Imparatoriya Selçûqî:

Tirk, di destpêka sedsala 9'an de ji ber sedemên cur bi cur koçberî Rojhilata Navîn bûne. Yek ji van hoz û êlên tirkan a ku koçber bû, hoza Oxûzî ye. Oxûzî, li hundirê Îranê bi cih bûn. Di wê demê de, li wir du Dewletên bihêz; Karahanî û Xeznewî hebûn. Oxûziyan hewl didan ku di navbera van her du dewletan de cihekî ji xwe re bibînin , ji ber vê yekê jî, bi lihevdanan ji xwe re cihek bi dest xistin. Oxûziyên ku tim bi Xeznewiyan re di nava dijberiyekê de bûn, di bin pêşengiya Tûxrûl û Çaxrî Beg di sala 1040’î de bi şerê li Dandanaqanê re Xeznewî bi bin xistin û Imperetoriya Selçûqî ya Mezin ava kirin. Piştî avakirina Imperetoriya Selçûqî ya Mezin, bi awayekî pir bilez berbelav bû. Qada desthilatdariya Xeznewiyan, bi tevahî bi dest xistin. Lê hîn jî ji wê hêza berbelavbûn û xwegihandina Rojhilata Navîn dûr bûn. Xelîfetiya Ebasî lewaz bibû û pêwîstiya wan bi xwîn û hêza nû hebû. Bi taybetî, xelîfetiya Ebasî ya ku li başûr

di bin zexta Fatimiyan û li Rojhilat jî di bin êrîşên Buweyhan de mabû, selçûqî ji xwe re weke rizgariyekê didîtin. Ji ber vê yekê, alîkarî ji selçûqiyan xwest. Selçûqiyên ku nikarîbûn xwe bigihînin Rojhilat, ji bo bicihbûneke bingehîn a li Rojhilata Navîn, weke derfeteke zêrîn nêzîkatî li vê pêşniyar û daxwazê kirin. Di sala 1055'an de selçûqî ketin Bexdayê. Bi vî awayî, Dewleta Buweyhan bi giştî hilweşiya.

## Şerê Melazgirê:

Bi hatina turkan a Rojhilata Navînê re, di herêmê de rewşeke aloz dest pê kir. Turkan bi talankirina civakên herêmê jiyana xwe didomand. Ji bo ku karibin di Rojhilata Navînê de cih bigirin, islam ji milê ramyarî ve pejirand. Ev ji bo wan derfeteke mezin bû. Bi navê islamê heyînên civakên herêmê ji destên wan derdixistin. Vê jî, rê li ber hejariya mirovan vekir. Lê, hem misilmanbûna civakên herêmê, hem jî xurtbûna ziman û çanda wan, pêşî li daxwazên turkan ên talanker digirtin.  Ji ber vê sedemê berê xwe dan herêmên di destê Bîzansan de.

Sultanê Selçûqan Alpaslan di sala 1070`yî de li ser daxwaza xelîfeyê Ebasî ji Xurasanê kete rê da ku Misrê dagir bike û wê ji xelîfetiya Ebasî re vegerîne, lê Sultanê Selcûqî negihaşt ermanca xwe û piştî di dagirkirina riha û Helebê de bi bin ket, biryar da ku vegere Xurasanê û dev ji dagirkirina Misrê berde. Lê dema ku amadekariyên xwe dikir ji bo ku vegere Xurasanê, dibihîze ku Imperetorê Pîzansî Roman Diyojên bi artêşeke mezin ber bi xaka Misilmanan ve hatiye. Ji ber vê yekê rêya xwe diguhere û li Melazgirê hatin pêşberî hev.

Bi vî awayî artêşên Selçûq û Bîzansan li Melazgirê di sala 1071`ê de hatin hemberî hev. Di şer de hejmarek mezin ji turkên Oxûz û şaxek ji artêşa Romen Diyojen veqetiyan û tev li Selçûqan bûn. Vê rewşê bandoreke neyênî li Bîzansan kir.

Şerê ku di vê rewşê de dest pê kir, bi serkeftina Selçûqan bi encam bû. Romen Diyojen bi birîndarî ket destê Selçûqan û artêşa wî belav bû. Ev şerê ku bi alîkariya kurdan hat biserxistin, di peywendiyên her du civakan de, bû gava yekem. Ji vî şerî û pê de deriyên Anatolê ji bo turkan vebûn. Kom bi kom turk derbasî Anatolê bûn û ev herêm bû welatê wan. Lê Selçûqên ku îdyolojiya islama sunî ji xwe re kiribûn mertal, gelên herêmê bertek û nerazîbûnên xwe di rêya serhildanan re, li dij wan nîşan dan.

## Serhildana Baba Îshaq 1239:

Serhildaneke xwedî bingeheke civakî û olî bû. Baba Îshaq mirîdê Baba Ilyas bû. Di ramanên xwe de dibêje: "Hemû mirov weke hev in, lê hin kesan desthilatdarî di destê xwe de girtine û pêwîst e ev yek ji holê rabe". Li ser van nêzîkatiyên azad, Selçûqan Baba Ilyas avêt zindanê. Ji bo rizgarkirina wî, Baba Îshaq xizan li derdora xwe kom kirin û kesên ku Selçûqan erdên wan bi darê zorê ji wan stendibûn, tev li serhildanê bûn. Her wiha gelên Aşûr û Ermen jî tev li serhildanê bûn. Bi vî awayî, serhildanê di 1239`an de dest pê kir. Serhildana Babayî li Meletî, Koçgirî, Mereş û Rihayê belav bû û di demeke kin de Semsur jî bi dest xistin û heta Amasyayê çûn.

Dema ku serhildan belav bû û gelek serkeftin bi dest xistin, Selçûqîyan rêbazên xapînok meşandin. Soz didan xwediyê erdan ku wê erdên wan ji wan re vegerînin, heger dev ji serhildanê berdin. Li ser vê çendê xwediyên erdan, dev ji serhildanê berda û xwe spartin Selcûqiyan. Lê Baba Îshaq bi leşkerên xizan serhildan berdewam kir û gelek serkeftin bi dest xistin. Li hember vê yekê, Selçûqîyan çete bi peran ji Ewrûpayê anîn. Ev çete bi tundî bi ser serhildanê ve çûn û hemû çek û cebilxaneyên pêşketî bi kar anîn, lewma serhildan bi bin ket.

Baba Îshaq û Baba Ilyas serjê kirin û ew bi rojan li keleha Amasyayê hilawestî hiştin.

Piştî ku serhildan hat şkandin û Baba Îshaq hat kuştin û bi şûn de, Babayan cardin êrîşî Qonyayê kirin, lê Selçuqan ew hewildana dawiyê jî bi komkujiyeke dijwar perçiqandin. Lê belê serhildana Babayan dewleta Selçûqî di navbera sê salan de pir ji hêz xistibû. Ji ber vê yekê, li hember êrişên Moxolan nikarîbûn zêde li ber xwe bidin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Turk çawa derbasî Rojhilata Navîn bûn û bi çi awayî xwe bi cih kirin?
2. Desthiladarên Turk, kîjan rê hilbijartin? Veke.
3. Şerê Melazgirê di nava kîjan hêzan de pêk hat û di encama şer de çi guhertin çêbûn?
4. Çima Turkan berê xwe da herêmên Bîzansiyan?
5. Sedema serhildana Baba Ishaq, rave bike.
6. Bi çi awayî serhildana Baba Ishaq bi dawî bû?

WANE 2

# SEFERÊN XAÇPERESTAN

Di dema ku wê şerên Xaçperestan dest pê bike, Ewrûpa di nava tarîtiyê de jiyan dikir. Ji dema Grek û Romayê ve tu derketin pêk neaniye. Xirîstiyanî, di rewşa ol û saziya bîrdozî ya desthilatdar de bû. Di nava xwe de girtî bû û li rêyeke derketinê digeriya. Ji ber van sedeman, Ewrûpa êrîşkirina li ser Rojhilata Navîn, weke yekem rêya derketinê ya ji vê tarîtiyê didît. Ji ber vê yekê jî, seferên xaçperestan li dar xistin. Ji ber ku li ser cil û mertalên kesên tevlî vê seferê bûne, xaç hebû; jê re seferên xaçperestan dihat gotin. Nasnameya bîrdozî ya vî şerî, şaristaniya Islam û xirîstiyaniyê bû. Di navbera salên 1095-1272'yan de bi giştî heşt seferên xaçperestan, hatin lidarxistin.




## Sedemên Seferên Xaçperestan:

1. Nakokiyên dîrokî yên di navbera Rojhilat û Rojava de.
2. Rojava, dixwest rêyên hevrîşim û biharatê bixe bin venêrîna xwe.
3. Ji ber xwesteka wan a bidestxistina Quds, Antakya, Riha û

Filistînê ku ji aliyê xirîstiyanan ve pîroz dihat dîtin.

4. Xwesteka zêdekirina hêza papatiyê û soza bihiştê ya ji bo kesên ku tevlî seferê bûne hatibû dayîn.
5. Xwesteka zêdekirina xakê ya xanedanên xwedî xak û xwesteka bidestxistina erd û dewlemendiyan a xanedaniyên bê'erd û gundiyan.
6. Xwesteka talankirina dewlemendiyên Rojhilata Navîn û bidestxistina wan.
7. Piştî lewazketina bîzansan, hat xwestin ku ola xiristiyanî di bin mezhebê katolîk de bibe yek.
8. Xwesteka peydakirina riyeke derketinê ya şaristaniya Ewrûpayê, ku bi awayê tarîtî û xitimînê jiyan dikir.

## Sefera Yekem a Xaçperestan (1096-1099):

Sefera yekem a xaçperestan ku gihaştiye armanca xwe, ji sê qonaxan pêk hatiye.

**Qonaxa yekem:** Ji gel kesên bi dilxwazî tevlî seferê bûn. Yên ku tevlî vê seferê bûn, bê ezmûn û bê rêxistinbûn, di rêjeyeke mezin de ji aliyê selçûqiyên Anatolyayê ve ji holê hatin rakirin.
**Qonaxa duyem:** ketina tevgerê ya hêza ji yekîneyên taybet ên xanedanan, pêk dihat. Ev yekîne, ta sînorê Bîzansê hatin û li benda artêşa bingehîn rawestiyan.

**Qonaxa sêyem:** artêşa birêkûpêk û bidîsîplîn a ku ji artêşên qraltî û imparatoriyê ve pêk dihat. Ev artêş, bi hêza xanedanan û yên ji qonaxa yekem mane re bû yek û ket tevgerê. Artêşeke pir mezin bû. Tê gotin ku zêdeyî sed hezar leşkerî derbas kiribû. Ev sefera xaçperestan, bi piranî di bejahiyê de pêk hatibû. Cara yekem ket sînorê Dewleta Selçûqî ya Anatolyayê. Li vir li cihê ku selçûqî rasterast li hemberî wan derketin, ketin nava şerekî bêmoralkirin û ji hev belavkirinê. Her çi qas artêşa xaçperestan

windahiyeke mezin dabû jî, gihaşt Qudsê. Artêşa xaçperestan her cihê ku tê re derbas dibû; xerab, talan û wêran dikir.

Bi navê şerê olî kesên ne xirîstiyan di komkujiyan re derbas kirin. Rojhilata Navîn, ji sefereke bi vî awayî re ne amade bû. Her wiha, ji ber ku dewlet û mîrtiyên parçeparçeyî bi hev re di nava şer de bûn, aramiya ramyarî û civakî tune bû. Ji ber van sedeman, di Rojhilata Navîn de ji derveyî Dewleta Selçûqiyan, Anatolyayê tu berxwedanên ji dil pêş nexistin.

## Encamên Sefera Yekem a Xaçperestan:

1. Tevahiya Anatolyaya Rojava, ket bin desthilatdariya bîzansan.
2. Xaçperest derbasî Qudsê bûn û li wir qraltiya latîn a xirîstiyan ava kirin. Li Yafa, Antakya, Riha, Trablûs, Şam û Nablusê; mîrtiyên katolîk ên xirîstiyan hatin avakirin.

## Sefera Duyem a Xaçperestan (1147 -1149):

Mîrê Mûsilê Îmadedîn Zengî, di sala 1144’an de Riha, Heleb û Şam bi dest xist. Li ser vê têkçûnê, qiralê Qudsê yê xirîstiyan ji papa alîkarî xwest.

Li ser bangawaziya papa, imperatorê Elman û Qralê Fransî artêşeke mezin kom kirin. vê artêşê, dixwest di ser rêya Anatolyayê re derbasî Rojhilata Navîn bibe. Lê belê selçûqiyên Anatolyayê, ev artêşa xaçperestan bi giştî têk birin. Bermahiyên artêşa xaçperestan, êrîşî Şamê kirin, lê bi ser neketin.

## Sefera Sêyem a Xaçperestan (1189 -1192):

Selahedînê Eyûbî, di 2’yê Cotmeha sala 1187’an de bi Şerê Hetîn, desthilatdariya xirîstiyanan bi şêweyekî diyar têk bir û Quds ji xaçperestan stend. Ji ber vê binketina xirîstiyanan û ketina Qudsê, imperatorê Elman bi artêşeke ku ji 100.000 kesî

pêk dihat ket ser rê. Lê belê ev artêşa mezin, ji aliyê Selahedînê Eyûbî ve hat têkbirin. Qralê Îngilîstanê, dîl ket destê artêşa Selahedîn, lê paşê hat lêborandin û ew şandin welatê wî. Seferên din ên xaçperestan hem ji aliyê cewher, hem jî ji aliyê armancê ve nebûn xwediyê bandoreke girîng.

## Seferên din, ev in:

- Sefera çarem a xaçperestan (1200-1204)
- Sefera pêncem a xaçperestan (1217-1221)
- Sefera şeşem a xaçperestan (1228-1229)
- Sefera heftem a xaçperestan (1248-1254)
- Sefera heştem a xaçperestan (1268-1270)

## Encamên seferên xaçperestan:

1. Tevî sozên serketin û dagirkirinên Papa û dêrê, ev sefer bi binketinê bi dawî bûn. Bawerî û girêdana bi Papa û dêrê ve kêm bû.
2. Pirsgirêka di navbera mezhebên katolîk û Ortodoksê de germtir bû.
3. Desthilatdariya navendî ya feodalîzma Ewropayê, bi hêztir bû.
4. Bi rêjeyek bilind di nava hev de pişaftina çandan çêbû.
5. Bi ezmûnên qada aborî û hilberînê yên Rojhilata Navîn re li Ewropayê di asteke bilind de hilberîn hat pêşxistin.
6. Bermahî û ezmûnên di qada felsefe, bijîşkî, astronomî û fîzîkê de birin Ewropayê.

## Bandorên Seferên Xaçperestan Ên Li Ser Rojhilata Navîn:

Rojhilata Navîn, di encama van şer û seferan de ket dema xwe ya bi paş ve çûyînê. Di hundir de qedexekirina derfetên

guftûgokirin û felsefeyê, ji derve jî seferên xaçperestan û êrîşên Moxoliyan; nehiştin ku Rojhilata Navîn êdî bi serxwe ve were û bûn sedem ku paşdemayînê jiyan bike. Rojhilata Navîn ku şaristaniya navendî ya wê demê bû, qat bi qat Ewropa derbas dikir. Rojhilata Navîn a ku di her qadê de (ramyarî, leşkerî, zanistî) pêşketîtir bû, pêwîstî bi pêşketineke nû nedidît. Di encamê de paş de ma.

Ewropa, têgihîşt ku bi seferên xaçperestan, nikare Rojhilata Navîn bi bin bixe û derbas bike. Vê rewşê, Ewropa neçar kir ku pêngaveke nû bavêje. Piştî vê demê, Ewropaya ku ketibû nava lêgerînên taybet, karîbû ramyariyeke nû ya aboriyê biafirîne. Di qonaxa herî dawî de osmaniyan hewl da, Islam û şaristaniya feodal a Rojhilata Navîn bi zorê li ser piyan ragirin.

Ev rewş, li pêşiya peydakirina rêya derketinê ya Rojhilata Navîn bû asteng. Seferên xaçperestan, ne tenê talan û dagirkeriyek bû, di heman demê de veguhastineke çandî bû. Veguhastina rêxistinbûn, ramyarî, zanist, çand û hunerê bû jî. Ewropa, ev li gorî taybetmendiyên xwe bi kar anî.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Nasnameya bîrdozî ya şerê xaçperestan çi bû û çend sefer hatin lidarxistin?
2. Sedemên seferên xaçperestan bîne ziman?
3. Sefera yekem a Xaçperestan ji çend qonaxan pêk tê? Veke.
4. Bandorên seferên xaçperestan ên li ser Rojhilata Navîn û Ewropayê, veke.

# DAGIRKERIYA MOXOLAN

## Imperatoriya Moxolî:

Damezrînerê imperatoriya Moxolê, Cengîzxan bû. Ev nav, piştî sazkirina dewletê stend. Navê wî yê yekem, Tîmocîn bû. Imperatoriya Moxolê di navbera salên (1206-1268)z de berdewam kir. Sînorên vê imperatoriyê, ji Kendava Besrayê heta Sîbîryayê, ji Deryaya Japonyayê heta rojhilatê Ewrûpayê dirêj bû.




Di heman demê de hovtirîn û zordartirîn Imperetoriya dîroka cîhanê bû. Di mejiyê gelan de bi tirsa xwe  bi cih bû. Artêşa Moxol, di jiyana Cengîzxan de tu carî bi bin neket. Hemû welatên ku ketinê; talan û qir kirin. Ev Imperatorî, ji çanda koçberiyê zêdetir tiştekî din nizanî bû.

Rêbazê Moxolan ji yê dagirkerên din cuda bû; welatê ku li ber xwe bida, zilamên wî welatî dikuştin, jin û pîşekar weke dîl ji Asyaya Navîn re dişandin û ew welat serûbin dikirin. Ger welatek li ber xwe nedida, tevahiya gel derdixistin derveyî

bajêr, bajar talan dikirin û dest li gelê bajêr nedihat dayîn. Bi van rêbazan, tirs belavî nava gelan dibû, bi vê re di her dagirkirinê de berxwedana gel dihat astengkirin.

## Êrîşên Cengîz Xan:

Cengîz Xan, di 1206'an de moxol û hozên li Asyaya Navîn gihandin hev û imperatorî ava kir. Di sala 1215'an de tevahiya Çînê dagir kir. Moxolan, di sala 1218'an de jî bi binxistina Harzemşahan re ketin Rojhilata Navîn. Di sala 1220'î de beşeke mezin a Kurdistanê dagir kirin. Bajarên weke; Şarezor, Amed, Xelat û Wan serûbin kirin û bi hezaran mirovan kuştin. Li hemberî vê talan û dagirkeriyê, kurd neçar man ku xwe vekişînin çiyayan.

Ên li bajaran dijiyan jî, di bin her cure zext û stemkariyê de jiyana xwe berdewam dikirin. Moxolî, tevahiya pirtûkên ku kombûna bi hezarê salan in, şewitandin û pirtûkxaneyên girîng ên wê demê ku li bajarên weke; Bexdad, Semerkand, Amed, Rey û hwd… bûn, bi giştî şewitandin. Civakên Rojhilata Navîn ji her cureyê vebûn û pêşveçûnê qut bûn.

Rojhilata Navîn, bi giştî dest bi jiyîna pêvajoyeke tarî kir. Vê navenda zextê, bi her awayî jiyana zanistî û civakî, bi giştî rawestand.

Êrîşên moxoliyan ên li ser Kurdistanê, bûn sedemên ziyan û êşên mayînde. Seranserî xaka Kurdistanê, rastî talan û dagirkirinê hat. Vê talanê, di heman demê de civak jî şkand. Dema ku Cengîz Xan mir, Imperatorî di navbera kurên wî de hat parvekirin.

## Êrîşên Holako:

Holako neviyê Cengîz Xan, di sala 1256’an de Dewleta Îlhaniyan saz kir. Paytexta wê, Tebrîz bû. Di nava sînorên vê dewletê de Anatolya, Îran, Azerbeycan û Kurdistan cih digirtin. Di serdema Îlhaniyan de jî zext û qirkirinê berdewam kir. Di despêkê de axa Loranê dagir kirin. Piştre, berê xwe dan Keleha Alamûtê. Keleha Alamûtê pirê caran hat dorpêçkirin, lê nehat bidestxistin. Bi çêkirina coyan û dagirtina wan bi petrolê û teqandina wê re, hat bidestxistin û hemû kesên di kelehê de hatin tunekirin.

Piştî Keleha Alamûtê hat bidestxistin, Holako berê xwe da Bexdadê. Artêşa Ebasiyan di du-sê pevçûnên destpêkê de bi ser diket. Ji ber vê sedemê, bi xwe bawer bûn. Bi vê baweriyê ve ji derveyî bircên bajêr xwe bi cih kirin. Amadekariyên xwe nekirin, ji ber vê sedemê, di pevçûnên piştî wê de winda kirin. A ji vê girîngtir, piştî ku artêşên moxolan bendavên li ser çemên Dîcleyê şkandin, beşeke girîng a artêşê ya ji derveyî bircan bi cih bibû, di avê de fetisî. Piştî wê, Holako daxwaza lihevhatinê ya xelîfe Mu'tesim nepejirand û di nava çend rojan de hemû bircên bajêr xistin bin kontrola xwe. Yên ku ji artêşa Ebasiyan man jî, hemû kuştin.

Di 13’ê Sibata 1258’an de Bexdad bi tevahî hat bidestxistin û hemû mirovên li wê derê hatin kuştin. Mirov nikare texmîn bike, ku li vir çend mirov hatin kuştin.

Holako yê ku ji kuştina mirovan, talankirina bajêr, şewitandin û xerabkirinê têr nedibû; hemû pirtûkên pirtûkxaneya navdar a Bexdadê, ku wê demê navenda zanistê bû, her wiha nivîsên ku bi dest hatibûn nivîsandin avêtin Çemê Dicleyê û bi vê re mînakeke mezin a vandalîzmê nîşan da. Di heman salê de Kermanşah talan û serûbin kir û mirovên wê qir kirin.

Di sala 1259'an de li herêma Colemêrgê, reşkujî û rûxandineke mezin pêk anî.

## Dawîlêhatina Moxoliyan:

Piştî van şeran, Dewleta Îlhanî dest bi rawestîn û paşvemayînê kir. Memlûkî, di sala 1250'î de li ser mîrateya Dewleta Eyûbiyan, hat damezirandin. Rêkûpêkî, sazîbûna leşkerî û dewletî ya Eyûbiyan, bi heman awayî hatibû berdewamkirin. Artêşa Memlûkiyan, bi hozekê ve nemabû; pir gel di nava wê de cih digirtin. Bi taybetî, di têkoşîna bi moxoliyan re pir gel ji dil û weke bi xwe bawer tevlî vê artêşê bibûn. Kurdan jî, di nava vê artêşê de cih girt. Di vê navberê de li ser desthilatdariya Moxolê jî, şer çêdibû. Holako serleşker li şûn xwe hiştin û vegeriya Qafqasyayê. Dema ku Holako ji heremê çû, di sala 1260`î de di navbera artêşa Moxol û Memlûkiyan de, li Eyncalûtê, şer qewimî. Di encamê de artêşa Moxolan têk çû û xaka Filistîn û Sûryeyê ji destê wan derket. Yekîtiya Moxolan, bû çar parçe û Holako dixwest artêşa Moxolan careke din vegerîne Rojhilata Navîn, lê Holako bi artêşên ku ji bermahiya perçebûna Moxolan mabûn, ket nava şer û di encamê de têk çû. Di sala 1265`an de Holako mir.

## Tîmûrleng:

Dewleta Moxolê, di sala 1365`an de ji aliyê Tîmûr ve hat avakirin. Ji ber ku lingê wî seqet bû, jê re Tîmûrleng dihat gotin. Tîmûr, ji bo avakirina Dewleta Moxolê, xebitî û heta ku mir jî (1405) Z li ser vê rêyê ma.

Sînorên dewletê, ji Hîndistanê heta Deraya Egeyê berfireh kir. Di sala 1401`ê de, Kurdistan dagir kir û bajarên weke: Amed, Wan, Kermanşah, Sine û Zaxo xistin bin destên xwe û qirkirineke mezin pêk anî. Di serê sala 1402`yan de, bajarê

Sêwasê dagir kir û çi mirovê ku di bajar de bûn, hemû bi saxî binax kirin. Kurdistan, ji nû ve bi seranserî hat şewitandin, hilweşandin û talankirin. Tîmûr di sala 1402`yan de, li Enqereyê bi Osmaniyan re şer kir û di wî şerî de bi ser ket. Piştî mirina Tîmûrleng dewleta wî di nava zarokên wî de parçe bû û di sala 1507`an de ji aliyê paşayê Ozbek ve hat hilweşandin.

## Bandorên dagirkeriya moxolan ên li ser Rojhilata Navîn û Kurdistanê:

1. Rojhilata Navîn û Kurdistan, bi giştî hatin talankirin û rûxandin.
2. Di Rojhilata Navîn de pêşveçûnên zanistî û yên din, bi giştî rawestiyan.
3. Rojhilata Navîn û gelê kurd, ji derveyî têkoşîna hebûna xwe, tu pêşketinên din çênekirin.
4. Pirtûkxaneyên ku jêdera kombûnên pir girîng bûn, hatin rûxandin û pirtûkên wan hatin tunekirin.
5. Kurdan, xwe vekişandin çiyayan û hewl dan ku xwe biparêzin. Vê rewşê, pêşveçûna kurdan berovajî kir.
6. Di bîranînên civakan de şopên tirsnak hiştin ku gelên li Rojhilata Navîn û cihên din, vê şopê demeke dirêj bi tirs jiyan bikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Moxolî, çawa derbasî Rojhilata Navîn bûn û ku dagir kirin?
2. Imperetoriya Moxolan, bi kîjan rêbazê gel tirsand?
3. Cengîz Xan, împaratorî çawa ava kir?
4. Derbasbûna Holako ya Bexdadê, şîrove bike.
5. Bandora êrîşên Moxolan li ser Kurdistan û Rojhilata Navîn, diyar bike.

WANE 4

# SERDEMA OSMANIYAN

## Berbelavbûna Imperatoriya Osmaniyan:

Piştî şerê Melazgirê, tirk li Anatolyayê bi şêweyê mîrtiyan, dest bi cihbûn û berbelavbûnê kirin. Her mîrtî, li ser axa xwe rêveberiyek saz kir. Yek ji wan jî ku navê xwe, ji pêşkêşê xwe Osman Beg digirt; Xanedaniya Osmaniyan bû. Piştî Mîrtiya Osmanî ku li Anatolyayê bi cih bû, ber bi axên ku koka wan yewnan û mîrtiyên ku koka wan tirk ve berfireh bû û şerê berbelavbûnê bi rê ve birin. Osmaniyên ku li navçeya Soxut a Bûrsayê bi cih bûbûn, di demeke kin de hoz û êlên li derdorên xwe xistin bin desthilatdariya xwe û bûn dewlet.




## Avabûna Mîrtiya Osmaniyan:

Li hemberî êrîşên moxolan ên ku zêde dibûn, mîrtiya di bin rêveberiya Silêman Şah, di sala 1224'an de bi şêniyeke ji 50 hezarî pêk dihat, di ser Xuresanê re hat Anatolyayê. Piştî heft salan dema ku xwestin vegerin, Silêman Şah mir û nîvê hoza wî bi şûn de vegeriya. Nîvê dimînin jî, di bin rêveberiya Ertûxrûl Gazî de ber bi Anatolya Navîn ve pêş ketin. Ertûxrûl ê ku li

hemberî moxolan, alîkarî dida Dewleta Selçûqiyan, piştî şer, ket bin parastina Elaedîn Keykûbadê Sêyem. Ew, li Soxut û Domanîçê ku ji aliyê Elaedîn Keykûbad ve xelat girtin, bi cih bûn. Vê mîrtiyê, di dema Ertûxrûl de dest bi berbelavbûnê kir. Ev berbelavbûn, di dema kurê wî yê mezin ê bi navê Osman de bilez pêk hat.

Osmaniyên ku bi şêweyê mîrtiya girêdayî selçûqiyan, di sala 1299'an piştî şikestina Elaedîn Keykûbatê Sêyem de serxwebûna xwe ragihandin. Damezirandina mîrtiya ku wê piştre bigihêje rewşa Imperatoriyê jî, di vê dîrokê de dest pê kir. Berbelavbûn û pêşketin, piştî vê dîrokê bilez berdewam dikir. Dewletbûyîna di 1326'an de ji aliyê Orhan Gaziyê kurê Osman Beg ve hat sergihayîkirin û Bûrsa bû paytext.

## Dewletbûyîna Osmaniyan:

Di dema Orhan Gazî de gavên destpêkê yên dewletbûyînê hatin avêtin. Piştî ku mir, Muradê yekem, ket şûna wî. Wî jî, ax û qadên ku xistibûn bin desthilatdariya xwe berfireh kir. Edirne, bi dest xist û kir paytext. Artêşa osmaniyan; ta Makedonya, Bosna û Sibiryayê belav bû. Muradê yekem, di şerê Kosova yê yekem de hat kuştin. Di vê pêvajoyê de pêngavên dewletbûnê, ber bi sergihayîbûnê ve diçûn. Mîrtiya osmaniyan, vediguherî dewletê.

Artêşa Yenîçerî ya di dewletbûna osmaniyan de rista diyarker dilîst, di vê pêvajoyê de hat damezirandin. Ji ber ku di vê qada berfireh bûbû de, rêveberiya navendî tengav bûbû, pergala eyaletan hat damezirandin. Muradê Yekem li şûna rêgeza; "Dewlet, malê hevbeş ê rayedar û xêzana wê ye", rêgeza; "Dewlet, malê hevbeş ê rayedar û kurên wî ne" bi cih kir û guhartineke girîng pêk anî. Bi vê guhartinê re pêşî li parçebûna desthilatdariyê û pevçûnên cuda girt. Yildirim Beyazîdê kurê

Muradê yekem şûna wî girt û seferên ber bi mîrtiyên tirkmenan ve pêk anîn. Hemû ji holê rakirin û axa wan bi dest xwe ve xist. Sînorên dewletê, ta Çemê Feratê berfireh bû.

Di sala 1453`yan de, Osmaniyan paytexta Bîzansan Qestentîniya (Stenbol) dagir kir û bûn imperatorî.

## Şerên navxweyî yên Osmaniyan:

Di nava malbata Osman de, nirxên biratî, xizm, bav û kur tune bûn. Ji bo xwegihandina desthilatdariyê, hemû kiryarên nemirovî dikirin, ango yek ji wan dikarîbû malbata xwe ji bo desthilatdariyê tune bike.

Mînakên wê jî pir in, mîna: Sultan Muradê Yekem yê ku kurê xwe kuşt, ew jî, ji bo ku kurê wî li hember wî ranebe. Sultan Mihemedê Sêyem yê ku ji bo parastina desthilatdariya xwe 11 birayên xwe di zarokatiya wan de fetisandin, bi heman hişmendiyê Beyazîdê Duyem bavê xwe jar kir û piştre bi destê kurê xwe bi jarê mir. Ev ji bilî kesên ku di zindanan de ji tenêtî û xemgîniyê dimirin û yên ku bi bêhişbûnê tewanbar dibûn ji bo ku wan ji dika desthilatdariyê bixin.

Ev sîstema hov di nava Osmaniyan de bû çand, heta asta ku Mihemedê duyem fermanek ragihand ku" Ji bo parastina yekîtiya imperatoriyê, ji mafê sultan e birayê xwe bikuje "

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Dema ku mîrnişînên Osmaniyan, xwe li Anatoliyayê bi cih kirin, dest bi çi kirin?
2. Osmanî çawa bûn xwedî dewlet? Veke.
3. Rewakirina kuştinê di nava malbatên osmanî de digihêje kîjan astê? Rave bike.

WANE 5

# SERHILDANÊN GEL LI HEMBER OSMANIYAN

Hewildanên Osmaniyan ji bo desthilatdariya xwe li herêmê bidin rûniştandin û imperatoriya xwe ava bikin, bi gelek rêbazan pêk hat. Lewma di herêmê de çi miletên ku dijiyan, di qirkirinan re derbas dikirin û kesên ku li ser xaka Kurdistanê dijiyan, ji xwe re dikirin armanc. Mîna gelên: cihû, turkmen, belûç û kudên ne sunî.

Osmaniyan ev hişmendî li ser sê pêlan pêk anî:

1. Gelên ne misilman.
2. Gelên ne turk.
3. Kurdên ne sunî (piştî hêza imperatoriyê xurt bû, kurd bi tevahî armanc girtin).

Sedemên ku Osmaniyan kurdên elewî armanc digirtin ew bû ku ne li ser rêya islama sunî bûn, him jî ji ber piştgiriya wan ji dewleta Sefewî re hebû. Ji ber vê yekê dest avêtin nirxên gelan û mal û milkên wan ji wan digirtin. Li ser vê yekê pir serhildan çêbûn ku vê hişmendiyê nepejirînin û yê herî bibandor ku imperatoriya Osmaniyan xistibû metirsiyê de, serhildanên Elewiyan bûn.

## 1. Serhildana Şêx Bedredîn 1412 - 1420:

Şêx Bedredîn di sala 1359`an de ji dayik bû. Di warê zanist û felsefeyê de li pêş ketibû û bibû şêxê keleha Ezmîrê. Sîstema ku Şêx Bedredîn dimeşand, li ser bingehê jiyaneke wekhev û komînal bû; ango wekhevî di navbera mêr û jinê de û stemkarî tu carî nedipejirand.

Ji ber helwestên dewleta Osmanî tevahî gelên herêmê yên wekî rûm, cihû, belûç û turkmen li dij Osmaniyan serî hilda û 8 salan berxwedan meşand. Serhildanê ji bajarên Eydin û Manîsa dest

pê kir û ji sê cihan êrîş bi ser Osmaniyan de birin. Lê sultanê Osmanî, Mihemedê Yekem artêşek bi fermandariya wezîrê xwe Beyazîd Paşa bi ser wan de şand û hemû mirîdên Şêx Bedredîn bi awayekî hovane û nemirovî kuştin. Şêx Bedredîn vegeriya Uremanê (li Bolxariyaya îro cihê ku piştî serhildana wan li dijî Selcûqiyan, mirîdên Baba Îshaq xwe lê bicih kiribûn) lê şêx hat girtin, ew tazî kirin û bi dar ve kirin. Her wiha mirîdên Şêx Bedredîn li hemû gundên herêmê gerandin û doza poşmaniyê li pêşiya gel ji wan dikirin û yê ku ev yek nedipejirand beşek ji laşê wî bi rengekî hovane dihat jêkirin heta ku jiyana xwe ji dest dida.

## 2. Serhildana Nûr Elî 1510 - 1512:

Li Erzincan, Sîwas, Toqat û Dêrsimê li pêş ket. Du salan berdewam kir û piştre serokê wê hat kuştin û serhildan hat perçiqandin.

## 3. Serhildana Şêx Qulun 1517:

Serhildaneke qizilbaşiyan bû, li derdora Îcê (Ege) û Deriyaya Spî, li pêş ket, xwe wekî mirîdê Şah Ismaîl didîtin û li dijî Osmaniyan tev digeriyan.

## 4. Serhildana Celaliyan 1519:

Derdora Yozqat, Çûrûm, Toqat û Sîwasê, li pêş ket. Pir kes tev lê bûn, mîna gundiyên bê'erd, kesên ku bac li wan giran bû, kesên ku erdên wan ji wan hatibû standin û kesên ku desthilatdariya wan ya herêmî ji destê wan derketibû. Ev hêza gelêrî bi pêşengiya Şêx Celal xwe bi Sefewiyan re da girêdan û li dijî Osmaniyan şer kirin. Lê dema ku êrîşên dijwar ji hêla Osmaniyan ve dest pê kirin, tevahî kesên ku tev li wê bûbûn, dest jê berdidan û di sala 1519`an de, Şêx Celal hat kuştin. Piştî wî çi serhildanên ku li pêş diketin di herêmê de navê serhildanên Celalî li wan dihat kirin.

## 5. Serhildana Baba Zenûn 1526:

Derdora Yozqat, Toqat dest pê kir û li Qeyserî û Mereşê belav bû, lê di 26`ê Îlona 1526`an de Baba Zenûn hat kuştin û serhildan bi dawî bû.

## 6. Serhildana Qelender Çelebî 1527:

Li Toqat, Yozqat û Sîwasê dest pê kir û li Qeyserî, Meleltî û Semsûrê belav bû. Di 22`yê pûşbera 1527`an de, Çelebî û hevalên wî hatin kuştin û serehildan têk çû. Lê mirîdê wan carcaran serhildan berdewam dikirin. Serhildana Pîr Sultan Evdal berdewamiya wan bû.

**7. Serhildanên Qereyazî 1600 - 1601:** Li Riha, Mereş û Sîwasê dest pê kir û belav bû.

**8. Serhildana Canpolat Oxlo 1605 - 1607:** Li derdora Sîwas û Meleltîyê belav bû.

**9. Serhildana Qelender Oxlo 1605 - 1608:** Li Sîwas, Mereş û Yozqatê belav bû.

Ev serhildanên gel di sedsalên 16 û 17`an de û di cihên ku kurdên Elewî tê de dijiyan gur dibûn. Bi armanca valakirina desthilatdariya Osmaniyan li ser herêmê, ev serhildanên gel tu caran ranewestiyan. Bi dehan serhildan di demên cuda de agirê wan gûr dibû, mîna: Serhildanên di salên *1526-1528-1595-1610-1654-1655-1658-1659*`an de û rewşa imperatoriyê her dem dixist metirsiyê. Li hember vê yekê pir kumkujî, talankirin û gelek rêbazên hovane, hatin bikaranîn.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Osmaniyan kîjan gel ji xwe re dikirin armanc?
2. Şêx Bedredîn sîstema xwe li ser çi bingehî ava kir?
3. Bi çi awayî Osmaniyan serhildanên Elewiyan perçiqandin?

WANE 6

# DEWLETA SEFEWÎ

Dewleta Sefewî, li ser axa Îranê hat damezirandin. Di dîrokê de Sefewî weke faris dihatin nasîn. Li gorî rêola Şîatiyê hatibû avakirin. Damezrînerê wê şah Ismaîlê sefewî bû. Hêza ku piştgirî dida Şah Ismaîl ji êlên Turkmen pêk dihat. Êlên weke: Romelo, Şamelo, Estaclo, Tekelo, Qaçar, Efşar û hwd. Di sala 1500 'î de Şah Ismaîl Ferex Yesar serwerê navçeya şêrwan a ku li rojavayê Deriyaya xezer dikeve, têk bir. Piştre şah Ismaîl bi serwerê dewleta Akkoyûnî Elwend Mîrza yê li herêma Ezerbeycanê re şer kir. Di encama şer de, Şah Ismaîl Ezerbeycan desteser kir û di sala 1501'ê de ket Tebrîzê û damezirandina dewleta sefewî ragihand. Piştî zincîreke şeran Şah Ismaîl tevahiya Îranê kontrol kir. Êdî ji ber hewildanên wî yên berfirehbûnê şer û pevçûn di navbera wî û dewleta Akkoyûnî de derdiketin holê. Ev şer û pevçûn bi dagirkirina Şah Ismaîl a Bexdadê ya di sala 1508 'an bi dawî bûn.



## Derbasbûna Kurdistanê:

Dagirkirina Kurdistanê jî rastî van salan tê. Herêmên kurdî ji dewleta Sefewî ya ku nû hatibû damezirandin re pêwîst bûn. Ji ber ku Kurdistan di hêla aborî û leşkerî de pir girîng bû, her wiha cihekî stratîjî digire. Kurdistan li ser rêyên bazirganiyê yên sereke yên ku Îranê û Deriyaya spî digihînin hev, dikeve.

Di wê demê de, hin beşên Kurdistanê bi nav girêdayî dewleta Akkoyûnî bûn, lê hêzeke wê ya hevgirtî tune bû da ku li dijî Şah Ismaîl bisekine. Kurdistan wê demê ji mîrnişînên parçe parçe pêk dihat. Her mîrnişînek xwe berpirsyarê sînorê xwe didît û hewil dida ku cihên xwe û destkeftiyên xwe yên feodal biparêzin. Tevî vê rewşê jî, despêka dagirkirina Şah Ismaîl a Kurdistanê ne serkeftî bû. Di sala 1506 an de, Şah gelek kampanî şandin da ku mîrnişîna Mukrî dagir bike, lê Mîrê wê Sarim kurê Seyfeldînê Mukrî mîrnişîna xwe parast û du caran artêşa Sefewî bi bin xist. Lê piştre şah Ismaîl çend serkeftin di Kurdistanê de pêk anîn. Di sala 1507 an de serkêşiya artêşê kir û êrîş  bi ser Erzincan, Amed û Mûsilê de bir. Di sala 1508 an de berê xwe da Bexdadê û di Loristanê re vegeriya paytexta xwe Tebrîzê. Di vê kampaniyê de Şah Ismaîl gelek deskeftî bi dest xistin; gelek mîrnişînan binfermanî bi tirsandinê an jî bi liberşêrînkirinê jê re diyar kirin, mîna mîrnişîna Hekariyayê, cemşîkeskê, Akîlê, Balankan û Bazûkî ku şah Ismaîl desteser kirin û rêveberiya wan da Qizilbaşiyên Turkmen. Her wiha bajarên Wan û Amedê jî desteser kirin lê şah Ismîl di vê kampaniyê de rastî berxwedaneke tund ji hêla hin mîrnişînan ve ku binfermanî jê re nepejirandin, hat. Mîna mîrnişîna Botanê, lê dema Ku Şah Ismaîl giha Loristanê (1508) Şah Rustemê Lorî neçar ma ku binfermaniyê jê re diyar bike. Her wiha mîrnişîna Bedlîsê jî binfermanî jê re diyar kir. Lê Şah Ismaîl bi van deskeftiyan tenê razî nebû û sê kampanî şandin ser mîrinşîna Botanê, lê her sê kampanî bi ser neketin. Ji aliyekî din ve, ew binfermaniyên bi nav ku mîrên Kurd ji Şah Ismaîl re diyar

kiribûn, aqilê wî jê nebirî û xwest ku mîrnişîn û herêmên kurdî di bin kontrola wî de bin û ji hêla zilamên wî yên qizilbaşî bêne birêvebirin. Ji ber vê yekê, ew mîrên Kurd ên ku çûbûn bajarê Xoyê da ku binfermaniyê jê re diyar bikin, xistin zindanê. Hin ji van mîran hîn neketibûn bin desthiladariya şah Ismaîl de, mîna mîrê Botanê Elî Beg û hin jî ketibûn bin serweriya wî de, mîna mîrê Bedlîsê Şeref Beg. Ev yek ji me re diyar dike ku şah Ismaîl li ser biryara dagirkirina kurdistanê rijd bû û hemû mîrên Kurd ji xwe re weke dijmin didîtin.

## Ramiyariya Sefewiyan Li Kurdistanê:

Di despêka dagirkirina Kurdistanê de, Sefewî tevlî karên hundirîn ên mîrnişînên kurd nedibûn. Di despêkê de Şah Ismaîl mîrên ku binfermanî jê re diyar dikirin, li ser textê mîrnişînê dihiştin, mîna mîrê Hekariyayê Zahid Begê Kurê Yezdan Şêr û mîrê Bedlîsê Şeref Beg. Lê ev ramiyarî ne bi rengekî giştî bi hemû mîrên Kurd re dihat meşandin. Mînaka vê yekê jî Hacî Rustem Beg mîrê Cemşîkeskê bû; dema ku vî mîrî binfermanî ji Şah ismaîl re diyar kir û hemû kelehên xwe radestî wî kirin, Şah Ismaîl ew ji textê mîrîtiyê xist û ew li ser hin herêmên girêdayî Eyaleta Iraqê danî. Tevî vê yekê jî, ew ramiyariya ku Şah Ismaîl bi mîrên kurd re dimeşand berdewam nekir û guhertina ramiyariya Şah Ismaîl bi mîrên Kurd re bi avêtina wan a zindanê û erkdarkirina mîrên Turkmen di şûna wan de, dest pê kir. Em dikarin ramiyariya Sefewiyan di Kurdistanê de bi van xalan diyar bikin:

1. Di karê birêvebirina herêmên kurdî de, erkedarkirina Tukmenên qizilbaşî.
2. Di herêmên kurdî yên ku Sefewiyan dagir kiribûn de, sepandina rêola Şîatiyê.
3. Bikaranîna hemû cureyên işkenceyê ji bo tirsandina gel û çewsandina hemû tevgerên ku li dijî wan derdiketin.

4. Bindestkirina hemû derfetên aborî û leşkerî yên gelê kurd û bikaranîna wan di xizmeta dewleta Sefewî û şerên wê de.

Em dikarin sedemên ku hiştin Şah Ismaîlê Sefewî vê ramiyariyê li dijî Kurdan bi kar bîne, di van xalan de diyar bikin:

1. Perestina Şah Ismaîlê Sefewî ji bo rêola Şîatiyê, nemaze piraniya Kurdan sûnî bûn.
2. Daxwaziya Kurdan a azadiyê û nepejrandina wan ji desthiladariya biyanî re, hiştin ku Şah Ismaîl bi çavên metirsiyê li wan binêre.
3. Kurdistan herêmeke sînorî bû, ji bo dewleta Sefewî ya ku nû hatibû avakirin. Her wiha dewleta Sefewî dijbertiya Imperatoriya osmanî ya hêzdar dikir û Şah Ismaîl tekez bû ku wê pê re têkeve pevçûnê, êdî wê Kurdistan xala herî lewaz di çepera wî de be. Ev jî ji ber ku Şah Ismaîl ji binfermaniyên nû yên mîrên kurd ne bawer bû, nemaze piraniya wan weke osamaniyan sûnî bûn û tu girêdana wan bi dewleta Sefewî re tune bû.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Şah Ismaîl çawa bingehê dewleta Sefewî ava kir?
2. Çima herêmên Kurdî ji dewleta Sefewî re pêwîst bûn?
3. Rewşa Kurdistanê Beriya derbasbûna Sefewiyan, rave bike.
4. Di kampaniya ku Şah Ismaîl, di sala 1507'an de, bi rê ve bir, çi deskeftî bidest xistin?
5. Ramiyariya dewleta Sefewî di Kurdistanê de diyar bike û sedemên wê jî bîne Ziman.

WANE 7

# ŞERÊN SEFEWÎ Û OSMANIYAN

# LI SER KURDISTANÊ

Dema ku dewleta Sefewî şerê desthiladarî û berfirehbûnê li Kurdistan û Asyaya navîn dikir, dewleta Osmanî bi şerên xwe yên di Ewropayê de mijûl bû. lê Dewleta Osmanî pêşveçûnên ramiyarî û leşkerî yên ku di herêmê de çêdibûn ji nêz ve dişopandin. Êdî berfirehbûnên Sefewî yên li ser sînorên wan ên rojhilat bala wan kişand û biryara ketina qada şer da. Despêka şerê Osmanî û Sefewiyan vedigere serdema Beyazîdê Duyem, nemaze dema ku Sefewî ji bo kontrolkirina herêma istratîjîk û girîng a ku ji Ermenistanê dest pê dike heta Kurdistan, Enatolya Rojhilat û  Iraqê diçe, tev digeriyan, her wiha vedgere hewldanên sefewî yên ji bo qezenckirina herêm û alîgiran di nava niştecihên rojhilat û nîveka Enatolyê de. Di wê demê de Şah Ismaîl hin kes ji wan deveran bi aliyê xwe ve kişandin û beriya ku Dewleta Sefewî li Ezrebîcanê bê damezrandin piştgiriya tevgera sefewî dikirin. Vê yekê jî metirsî li ser sînorên dewleta Osmanî  yên Rojhilat diafirand. Êdî Beyazîdê duyem, di sala 1502 'yan de nameyek ji mîrekî Kurd re şand û daxwaza agahiyan li ser encama şerê Sefewî û Akkoyûnan kir. Her wiha gelek niştecihên şî'a yên li Enatoliyayê koçî Bîlobonîzê kirin. Lê dema ku Selîmê Yekem hat ser textê desthiladariyê, istratîjiya dewleta Osmanî hat guhertin û şerê Osmanî û Sefewiyan ket qonaxeke kutaker.

## Sedemên Şer:

Nêrînên dîrokzanan ji bo vê pevçûna ku bi sedsalan berdewam kiriye, cur bi cur in. Piraniya wan, sedema pevçûnan vedigerînin cudabûna rêolî, ji ber ku Sefewî Şî'aprest bûn û hewl didan ku vê rêolê di heremê de bi darê zorê belav bikin. Her wiha komkujiya ku şah Ismaîl  derheqê Suniyên Bexdadê de pêk

anîbû, hişt ku Osmanî xwe weke parêzvanên Suniyan pêşkêş bikin. Hin jî dibêjin; kînek di navbera Selîmê Yekem û şah Ismaîl de hebû. Hin jî dibêjin ji ber ku Sefewiyan, mîrên Osmanî yên ku şerê desthilatdariyê bi Selîmê yekem re dikirin, li gel xwe diparastin.

Em dikarin bêjin ku herdu sedemên dawî lawaz û ne bes in ji bo şerekî wisa dijwar û demdirêj biafirînin.  Tevî ku sedema rêolî roleke diyarker di gurkirina agirê şer de dilîst, lê belê bi tena serê xwe têrê nedikir; dibe ku ramiyariya rêolperestî û mebestên berfirehbûnê yên Şah Ismaîl û Selîmê yekem pev re dimeşiyan.

Lê sedema sereke ew herêma stratêjîk a di navbera herdu dewletan de bû, nemaze Kurdistan. Piraniya qonaxên pevçûnê li derdor û nava Kurdistanê pêk hatin. Ji ber girîngiya kurdistanê ya aborî, zengîniya wê bi berhemên çandiniyê, girîngiya wê ya bazirganî (Kurdistan li ser rêyên bazirganiyê yên ku Îranê bi Deriyaya reş û Spî ve girê didin, dikeve) û girîngiya wê ya leşkerî, herdu dewletan dixwest kurdistanê tevlî dewleta xwe bikin.


## Şerê Çaldêranê:

Di serdema Selîmê yekem de, dewletên Ewropî yên bihêz derketibûn holê û imperatoriya Osmanî nema dikarîbû di Ewropayê de berfirehbûnê pêk bîne, êdî Selîmê Yekem derfetê dibîne ku berê xwe ji Rojava biguherîne û ber bi Rojhilat ve biçe.

Beriya ku Selîmê Yekem şer li dijî Sefewiyan ragihîne, fetweyek bi Şêxê Islamê da derxistin. Ev fetwe dibêje; şerê li dijî Şah Ismaîl pîroz e, ji ber ku ew Xewda nenas e. Bi vê yekê Selîmê yekem rengekî olî da şer.

Ji bo ku Selîmê Yekem pişta artêşa xwe biparêze, biriyara tunekirina Şî'iyan li Anatolyê da. Êdî hejmara wan bi rengekî

veşartî dişopand û piştre fermana kuştina wan dida. Di gelek jêderan de hejmara kuştiyan digihêje 40 hezarî.




Di vî şerî de herdu aliyan dixwest Kurdan bikişînin aliyê xwe; Sefweî di vê hêlê de bi ser neketin û hejmarek biçûk ji mîrên kurd li gel wan şer kirin mîna Hacî Rustem Beg Mîrê Cemşîkezkê, lê Osmaniyan piraniya mîrên kurd bi aliyê xwe ve kişandin. Osmaniyan ji sîstema feodal a Kurdistanê, her wiha ji Idrîsê Bedlîsî yê ku giraniyeke wî ya olî di nava Kurdan de hebû, sûd wergit. Ji aliyekî din ve jî, ji ber ramiyariya Sefewiyan a xedar, piraniya mîrên kurd li gel Osmaniyan şer kirin, mîna Cemşîd Beg mîrê Paloyê û Şeref Beg mîrê Bedlîsê. Lê hin mîran jî destek nedan Osmaniyan, ji ber ku ji serkeftina wan biguman bûn.

Piştî van amedekariyan, Osmanî û Sefewî li deşta Çaldêranê ya ku li bakur rojhilatê Gola Wanê dikeve, hatin pêşberî hev. Şer bi serkeftina Osmaniyan bi dawî bû. Şah Ismaîl bi birîndarî ji qada şer reviya û gelek leşkerên wî hatin kuştin. Piraniya jêderan tekez dikin ku topbarana Osmaniyan roleke sereke di encama şer de lîst, lê rola Kurdan jî di serkeftina Osmaniyan de girîng bû, ji ber ku 16 mîrên kurd li gel Osmaniyan şer kirin.

Piştî serkeftina çaldêranê rêya Tebrîzê ji Selîmê Yekem re vebû û Idrîsê Bedlîsî şand wê derê da ku tedbîran ji bo pêşwazkirina Sultan bistîne. Piştî derbasbûna Selîmê yekem a Tebrîzê xwest ku hêza xwe kom bike û li pey Şah Ismaîl ê reviyaye Derkzîn bikeve, lê dijbertiya Artêşa Yenîçerî, kêmbûna mûnetê û sermaya zivistanê, ew neçar kir ku ji Tebrîzê vekişe. Tevî ku Şah Ismaîl paşê vegeriya Tebrîzê jî, lê encamên binketinê li ser dewleta Sefewî giran bûn û serdestiya xwe li ser rojavayê Çiyayê Zagrosê winda kir. Piştî şerê Çaldêranê, di Rojhilata Navînê de, bandora Osmaniyan roj bi roj zêde dibû. Di encama şerên Mercîdabiq (1516) û Reydaniyê (1517) de, dawî li deshilatdariya Memlûkiyên Misrê anîn. Bi vî awayî deshilatdariya wan li herêmeke berfireh belav bû.

## Encamên şerê Çaldêranê li ser Kurdistanê:

Şerê Çaldêranê û serkeftina Osmaniyan xaleke guhertinê ya girîng bû ji bo Rojhilata Navîn bi giştî û nemaze ji bo Kurdistanê, ji ber ku Kurd bi awayekî piratîkî di navbera herdu dewletan de hatin parçekirin; beşê herî mezin ket bin serdestiya Osmaniyan  û herêmên din jî di bin serdestiya Sefewî de man.

Piştî şerê Çaldêranê, kurdan di piraniya herêmên Kurdistanê yên ku Sefewî lê mabûn de, serî hildan û hewl dan ku wan bi darê zorê biqewitînin. Êdî xelkên Amedê serî hildan û mîrê Sefewî qewitand. Li Bedlîsê Şeref beg, mîrê Sefewî ji ser textê mîrnişîna xwe, anî xwar. Mîr Xelîl li Hesenkêfê li dijî Sefewiyan serî hilda, lê nikarîbû mîrnişîna xwe ji destê Qerexanê Sefewî derxîne. Mîrê Sasonê Mihemed Beg mîrnişîna xwe bi darê zorê ji Sefewiyan stand. Cemşîd Beg ê Mirdasî Paloyê desteser kir, Qasim Beg keleha Akîlê vegerand û gelê Amedê destek dan Ehmedê Zerakî ji bo vegerandina Hetax û Meyafarqînê. Her wiha mîrê Soran Sîdî Beg kurê Şah Elî, Kerkûk û Hewlêr ji destê Sefewiyan, derxistin. Lê hin bajar û kelehên kurdî di destê Sefewiyan de man, ji ber ku parastgehên Sefewî li wan deveran bihêz bûn.

Ev tevgerên paqijkirinê weke destpêka rizgarkirina beşê Kurdistanê yê mezin ji serdestiya Sefewî bû, lê di heman demê de destpêka ketina van herêman û hin herêmên din a di bin serdestiya Osmaniyan de bû.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima destpêkê Osmaniyan destêwerdana pêşketinên Sefewiyan li Rojhilat nedikir?
2. Sedema Bingehîn a şerê di navbera Sefewî û Osmaniyan de, çi bû û ji boyî çi?
3. Amedekariyên Selîmê Yekem ji bo Şerê bi Sefewiyan re, bîne ziman.
4. Encamê şerê Çaldêranê li ser Sefewî û Osmaniyan, binivîse.

**Lêkolîn:**

Di bin kirasê Olî de, Osmaniyan mîrên Kurd bi aliyê xwe ve kişandin, vê yekê bi roja me ya îro ve girê bide.

WANE 8

# IDRÎSÊ BEDLÎSÎ Û BERBELAVBÛNA OSMANÎ DI KURDISTANÊ DE

Kesayeteke kurd, roleke diyarker di bûyerên ku di sedsala 16'an de li Kurdistanê çêbûbûn, dikir. Vê kesayetê, berî û piştî şerê Çaldêranê rola navbeynkariyê di navbera mîrên kurd û Sultanê Osmaniyan de, dilîst. Ev kesayet Idrîsê Bedlîsî bû. Wî cihê xwe yê olî û rêbazên diplomasî di nava Kurdan de bi kar dianî, da ku mîrên kurd li dijî dewleta Sefewî destekê bidin dewleta Osmanî.

Idrîsê Bedlîsî kurê Hûsameldîn kurê Elî bû. Ew bi Bdlîsî navdar bû, ji ber ku ji Bedlîsê bû. Bedlîsî di jîngehke olî û zanistî de mezin bû. Bavê wî Hûsameldîn yek ji rêveberên terîqeta Nûrbexşî bû. Bedlîsî xwendina xwe ya bilind li Îranê temam kir. Li gel zimanê kurdî, zimanê erebî, farisî û tirkî jî dizanî. Wî di gelek cihên girîng ên qesrên dewleta Akkoyûnî, Sefewî û Osmanî de kar kir. Di dema Sultan Yaqûb kurê Hesen Eltewîl ê Akkoyûnî de weke nîviskar kar dikir, piştre bû nîşançî ango xwediyê muhrê. Dema ku Şah Ismaîl, Tebrîz dagir kir û dewleta Akkoyûnî hilweşand, li gel Sefewiyan weke muhirdar ango xwediyê muhrê kar dikir, lê ji ber ramiyariya Şah Ismaîl a rêolî, çû li gel Osmaniyan kar kir. Beyazîdê Dyem Bedlîsî weke dîroknivîs di qesra Osmaniyan de erkedar kir. Bedlîsî, jiyana her heşt padîşahên dsetpêkê yên Osmaniyan, di bin navê (Heşt Buhiştan) de, nivîsand. Piştî ku Selîmê Yekem bû desthilatdar, Bedlîsî kir şêwirmendê ramiyariya Rojhilat ê Sultan.

## Hevpeymana Çaldêranê:

Beriya ku şerê Çaldêranê dest pê bike, Bedlîsî li nava mîrên kurdan  digeriya, da ku li dijî Sefewiyan hevkariya Osmaniyan bikin. Bedlîsî, soz û peyman didan mîrên kurd ku li gel Osmaniyan şer bikin, wê mîrnişînên wan ji wan re bên vegerandin. Bedlîsî bi hemû awayan hewl dida ku mîrên kurd serweriya Osmanî bipejirînin. Bedlîsî ji wan re digot; ev proje

bandorê li ser azadî û xweseriya mîrinîşan nake û wê tenê bi nav girêdayî Osmaniyan bin. Di dawiyê de, Bedlîsî piraniya mîran bi vê projeyê dan qayilkirin. Lê hin herêm û mîrên kurd projeya Bedlîsî û serdestiya Osmaniyan nepejirandin, nemaze herêma Dersimê ya ku piraniya niştecihên wê ji Kurdên Elewî û Êzîdî bûn. Mîrnişîna Cemşkezkê ya ku herêma Dêrsimê pê ve girêdayî bû, li gel Şah Ismaîlê Sefewî şer kir.

Idrîsê Bedlîsî li nav mîrên kurdan demekê geriya û xwest ku yekî ji wan bike mîrê mîran, lê belê ji ber ku mîrên kurdan hev nedipejirandin, kurdan ji nava xwe tu kes dernexist. Osmaniyan ji nav xwe mîrê mîran ê bi navê Biyîqlim Mihemed Paşa şand Kurdistanê.

Idrîsê Bedlîsî li ser vê rewşê ji bo birêvebirina Kurdistanê sîstemek çêkir û pêşkêşî padîşah kir, padîşah jî pejirand. Li gorî vê sîstemê hinek erkên ku kurd û hinek erkên ku Osmanî pêk bînin, diyar dibûn. Li gorî vê:

## Erkên kurdan:

1. Di dema şer de wê leşkeran bidin artêşa Osmaniyan.
2. Li gorî mezinahiya xwe her mîrnişîn wê salane baca xwe bidin Osmaniyan.
3. Mîrnêşînên kurdan wê sînorên ji wan re hatine diyarkirin, derbas nekin, ango wê êrîşî mîrnişînekeke din ya kurdan nekin.
4. Dema şerê seltenetê di nav Osmaniyan de çêbibe wê kurd tu aliyan negirin.

## Erkên Osmaniyan:

1. Li kîjan mîrnişînê wê kî bibe mîr, Osmanî dê destwerdanê nekin. Mîrîtî wê ji bav derbasî kur bibe, heke kur tune be wê ji aliyê rûspiyên wê mîrîtiyê ve were diyarkirin.
2. Li hember mîrîtiya kurdan dema êrîş pêk werin, wê Osmanî wan biparêzin.
3. Mîrnişînên kurdan dê weke herêmên serbixwe werin birêxistinkirin, wê Osmanî destwerdana kar û barên hundirîn (dibistan, dadgeh, bac û hwd) nekin.

Idrîsê Bedlîsî li gorî şert û mercên wê demê, ew peyman çêkir û sîstema ku wî ava kir nêzî sêsed salî (hin pirsgirêkên biçûk derketibin jî) hat meşandin.
Rewşa kurdan li Rojhilatê Kurdistanê cuda bû. Li Rojhilatê Kurditanê dewleta Îranê sîstema ilxanetiyê pêş xist. Dixwest ku li Kurdistanê sîstemeke weke ya Osmaniyan ava bike, lê weke Osmaniyan sîstema xwesertiyê nedan kurdan. Dewletê derfet neda ku kurd bi awayekî xweser xwe birêxistin bikin. Ev sîstem heya sala 1799'an meşiya.
Ku car caran pirsgirêk derketibin jî (1655'an li Bidlîsê şerê di navbera Osmanî û kurdan de – 1606'an di navbera Sefewî û kurdan de) bi giştî ev sîstem heya hatina kapîtalîzmê ya Kurdistanê (1800) meşiyaye.
Bi hatina modêrnîteya kapîtalîst re, ev dîrok wê were guhertin. Ji bo kurdan û neteweyên Rojhilata Navîn serdema felaketê wê dest pê bike.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Idrîsê Bedlîsî kî ye?
2. Çima hin mîrên kurd bi projeya Idrîsê Bedlîsî razî nebûn?
3. Li gorî peymana di navbera kurd û Osmaniyan de, erkên her du aliyan, zelal bike.

**Lêkolîn:**

Li gorî şert û mercên wê demê, peyman û tevgera Idrîsê Bedlîsî gaveke erênî an neyînî bû, lêkolîn bike.

WANE 9

# SERHILDANA KELEHA DIMDIMÊ

Serhildana Keleha Dimdimê destaneke kurdan e ku di navbera 1606 û 1610`an de, li dar ket. Di dema nakokî û şerên di navbera Osmanî û Sefewîyan de derbas dibe. Serpêhatiya Dimdimê bûyer û berxwedana kurdan bi rêbertiya Emîrxanê Biradostî li hemberî dagirkerên Sefewî, şîrove dike.

Çiyayê Dimdimê ji demên berê de li dijî êrîşên ereban bûbû wargeha rêveberiya Îraniyan, lê piştî fetha îslamê keleha Dimdim hat xerabkirin. Piştre bû cihê mîrnişîna Rewadiyan.

Emîrxan jî li ser vê keleha kevn a kurdan keleha xwe ji nû ve ava kir. Navê keleha wî jî di nav kurdan de wek navê keleha kevn ango Dimdim dimîne.

Keleha Dimdim li ser çîyayekî hatibû avakirin. Ji aliyên bakur û başûrê kelehê ve geliyekî pir kûr û bilind hebû ku kes nikare ji ber bilindahiya wê, têkeve kelehê û pêwistî bi dîwaran tune bû. Bi biryara Xanêlepzêrîn kevirek weke enbara avê hatibû çêkirin ku ava berf û baranê li wir kom dibû û bi vî awayî pêdiviya avê ya kesên di kelehê de, misoger dibû.

Sefewîyan jî Xanêlepzêrîn weke mîr nas kiribû û devera Ûrmiye weke mîrnişîna wî nas dikir. Piştî mirina Şah Tahmasp, Osmaniyan xwestin herêma Ûrmiyê têxin bin desthilatdariya xwe. Lê Emîrxan hem li dijî Osmaniyan û hem li dijî hêzên din ên deverê rawestiya û di encama şerekî de destekî Emîrxan jêbû. Ji ber vê yekê, navê wî pir caran wek “Emîrxanê yekdest” dihat bikaranîn.

Dema Şah Ebas êrîş bir ser herêmên Azerbeycan, Nexcewan û Rewanê ji boyî ku wan ji destê Osmanîyan derxe, Emîrxan xwe gihand Şah Ebas û li dijî Osmaniyan şer kir û hêzên Osmanî têkşikandin. Li ser vê yekê Şah Ebas Emîrxan wek mîrê Biradostê da naskirin. Şah Ebas zanîbû ku destê Emîrxan di şer

de hatiye jêkirin, lewma ferman da ku destekî zêrîn ku bi yaqût û elmasan xemilandî ji Emîrxan re, bê çêkirin. Ji vê demê û şûn de Emîrxan wek "lepzêrîn" jî hat binavkirin. Emîrxan bi dadwerî û jîrbûna xwe gelek nav û deng bixwe xist. Hinek hozên kurd ên ku di bin desthilatdariya Osmanî de bûn, xistin bin destê xwe. Bi vî awayî qada desthilatdariya xwe jî fireh kir. Bi vê zanebûna xwe roj bi roj di nava kurdan de hat naskirin û xelkên ji bilî kurdan wek xiristiyanan ku ji ber stemkariya Sefewî û Osmaniyan direviyan xwe li mîrnişîna Biradostan digirtin û bi serbilindî dijiyan, Emîrxan ew hemû bi awayekî rêzdar dihewandin.

Di heman demê de Şah Ebas hêdî hêdî ket dijberiya kurdan, û dest bi kuştina kurdan kir. Di demeke kin de êrîş bi ser keleha Makûyê û Kurdkavil de bir û piştre kurdên vê herêmê koçî alîyê Xurasanê kirin. Her wiha êrîş bir ser mîrnşîna Mehmûdî ya bajarê Xoyê û piraniya wan kuştin û yên mayî ajotin Xelxalê. Piştre Sefewiyan êrîş birin ser êlên Bilbas, Mengur, Mameş û hwd û komkujiyên mezin li dijî kurdan pêk anîn. Bi bihîstna van nûçeyan û kuştina rojane ya kurdan re, Emîrxanê lepzêrîn têgihişt ku wê Şah êrîşî herêma wî jî bike, lewra ket hizra berxwedaniyê.
Emîrxan bi hozên qizilbaşî re ket bazirganiya sînor û dixwest serxwebûna xwe bi dest bixe. Wî baş nas dikir ku bê yekgirtin nikarin li hemberî Sefewîyan rawestin, lewra dema ku Şah Ebas êrîş bir ser êla Şkakan, Emîrxan hêzek 500 kes bi rêveberiya kurê xwe şand ser hêzên Sefewî û bi vî awayî Şkakan ji dest hêzên Sefewî rizgar dike û hêzên Şah Ebas têk dişkîne. Her wiha Emîrxan dema ku Osmaniyan êrîşî mîrê Şemzînan kir, hêzek şand şerê Osmaniyan û ew têk şikandin. Piştî wî karê Emîrxan, Şah Ebas ku li pey behaneyekê digeriya, hin kes erkedar kirin da ku bizanin hêza Emîrxan çiqasî heye û keleha wî li çi cihî ye, da ku piştre êrîşî ser kelehê bike. lê her car sîxurên Şah ji alîyê hevalên Emîrxan ve dihatin gitin û kuştin. Sefewîyan bi hemû awayan dixwastin hêza Dimdimê bibînin û

hêzên xwe şandin nêzîkî kelehê. lewra dema hêzên Hesen Xan nêzîkî keleha Emîrxan dibûn, hêzên Emîrxanê Biradostî ji kelehê dibeziyan û êrîşî hêzên Hesen xan dikir. Di vî şerî de 2 celalî ji hêzên Hesen Xan hatin kuştin û çendên din birîndar bûn. Dema Emîrxan agahdarî şer bû, ferman da ku şer bê rawestandin. Hesen Xan jî konên xwe ji bo bêhnvedanê nêzî kelehê danîbûn û piştre hêzên wî carekê din êrîşî kelehê kir. Kurdan ji gelek hêlan konên Hesen Xan û civata wî bi top û tifingan gullebaran dikir. li ser pirsiyara Hesen Xan, "gelo Emîrxan bo çi wisa dike", Emîrxan dibêje: li vir karê me bi kesî nîn e, ev der xaka kurdan e.

Fermana kurdan derdikeve û Şah Ebas dibêje êrîşî ser keleha Dimdimê bikin û wir li gel axê bikin yek. Iskender Munşî dibêje "li ser van êrîşan şer her diçû geş dibû û Mihemed Xan, serokê Celalîyan li ser bingeha fermana hemû kurdan serî hilda û Ûrmîye xist destê xwe ".

Li ser nameya hesen xan, Şah Ebas Hetem Beg dişîne Ûrmiye û ji wî re dibêje, lêkolînekê bike, gelo ev mesela derdora Emîrxan çi ye? Şah Ebas ferman dide ku êrîşî ser Emîrxan bikin û keleha wî hilweşîne û bi erdê re bike yek. Herêm û mulkên Emîrxan di nav qizilbaşan de parve bike. lê bi mercê ku hemû kurd bên qirkirin. Şah Ebas li ser axaftina xwe berdewam dike: heke tu bi vî awayî bi ser neketî, (ango te nekarî kurdan qir bikî), hewla xwe bide ku tu Emîrxan bixapîne da ku dîsan rêz û rûmetê ji min bigire. Eger rêz û rumet ji min re girt, wê demê qizilbaşan bişîne cihên wan ê zivistanê û li wir niştecî bike". Şah Ebas hindek pere û çek û tiştên din dide Hetem Beg û Iskender Munşî wek bûyernivîs li gel wî dişîne. Bi vî awayî Îskender Munşî dibe Şahidê dagirkirin û hilweşandina keleha Dimdimê û kuştina kurdan û li pirtuka "Elemarayê Ebasî" de dinivîse. Hêzên sefewî ku ji gêylanî, îsfehanî, erdebîlî, celalî û çendîn hêz û eşîrên din pêk hatibûn, êrîşî ser keleha Dimdim kirin û şervanên Emîrxan jî berevanî ji kelehê re dikirin. Di heman demê de nêzîkî 400

kes ji şervanên Mihemed Paşa ku ji kurdên Celalî bûn ji hêza wî cuda dibin û tevlî şorşgerên Dimdimê dibin. Xan û hemû hevalên wî çûn şerê hêzên dijmin û bi mêranî şer dikirin û yek li dû yekî hatin şehîdkirin. Piştî şehîdbûna Xanê lepzêrîn û hevalên wî, jin û zarokên li nava kelehê bi dîtina wan dîmenên nexweş re û ji bo parastina xwe yek li pey yekê xwe ji bilindtirîn beşa kelehê avêtin xwarê û gihaştin kerwanê şehîdên Dimdimê. Serpêhatiya Dimdim û berxwedana Dimdimiyan, serpêhatiya Kurdistanê bû, serpêhatiya mêrxasiyekê ku dengbêjên kurd ew bi zindî hiştiye. Ew serpêhatiya rastîn, bi çendîn zaravayên kurdî û bi çend awayan hatiye xwendin ku bi giştî behsa mêrxasî, berxwedan, bindestiya kurdan û hovîtiya dagirkerên Kurdistanê dike. Dimdim, keleha kurdan, keleha mêraniyê, keleha berxwedan û keleha keçên bêtirs, ji bo ku nekevin destê dagirker û mirovkujan, bi can û dil ber bi pêşwaziya mirinê ve çûn.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Cihê kelha Dimdimê li ku derê dikeve?
2. Çima navê Emîrxan bû Lepzêrîn?
3. Berxwedaniya keleha Dimdimê çawa bi dawî dibe û mirov çi jê fam dike?

WANE 10

# PEYMANA QESRA ŞÊRÎN

Şerê Çaldêranê bû destpêka pevçûneke dirêj û domdar di navbera dewleta Osmanî û dewletên ku bi rêzê desthilatdariya Îranê kirin. Ev pevçûn zêdeyî 300 salî bi şeran berdewam kir. Weke me berê jî diyar kiribû, sedema vê pevçûnê hewldana herdu aliyan a desteserkirina Kurdistanê an jî hin herêmên wê bû. Sefewiyan bi hemû hêza xwe hewl didan ku ji nû ve herêmên kurdî yên rojavayê çiyayê Zagrosê û bakurê Kurdistanê desteser bikin. Osmaniyan jî dixwestin destkeftiyên xwe di Kurdistanê de zêdetir bikin.

Tevî ku beşeke mezin ji Kurdistanê piştî şerê Çaldêranê,her wiha di dema Suleyman Qnûnî de hin beşên din jî ketibûn bin desthilatdariya Osmaniyan de, lê Osmanî bi vê yekê razî nedibûn û hewl didan ku beşê di bin desthilatdariya Sefewiyan de, bixin bin desthilatdariya xwe. Bi vî awayî dema ku yek ji her du dewletan bêhêz dibû û nîşaneyên serkeftinê di xwe de didît û nemaze dema ku ya din di rewşeke tevlihev, nearamiya ramiyarî û lawazbûna leşkerî de bûya, şer li dijî wê radighand da ku hin deskeftiyan bi dest bixe. Êdî dema ku Şah Tehmasebê Yekem di sala 1576'an de mir, tevlihevî li Îranê çêbûn û Sefewî lewaz bûn. Osmanî jî vê yekê ji bo xwe wekî derfetekê dibînin, şer li dijî Sefewiyan radighînin û gelek herêmên Îranê dagir dikin. Ev şer bi peymana sala 1590'î bi dawî dibe. Ev peyman li ser daxwaza Şah Ebasê Yekem çêbû, ji ber ku dixwest aramî li çepera Rojava çêbibe da ku ji êlên ozbekî yên ku êrîşî herêmên Sefewî yên Rojhilat dikirin re, vala bibe. Bi vê peymanê Şah Ebas herêmên Tebrîz, Şêrwan, Corciya, Loristan û Şehrezûr dan Osmaniyan. Lê dema ku Şah Ebas pirsgirêkên rojhilatê Îranê çare kirin û hêza leşkerî xurt kir, amedekariya tolhildanê ji Osmaniyan kir û di sala 1602 'yan de şer li dijî Osmaniyan ragihand. Di sala 1603 'yan de Tebrîz ji destê wan derxist. Piştre Êrîvan û Qerebax jî rizgar kirin. Di sala 1607'an de hemû

herêmên Îranê ji bin destê Osmaniyan derxistin. Lê xwesteka Şah Ebas a berfirehbûnê hişt ku hin xakên din jî tevlî dewleta xwe bike, êdî gelek kampanî bi ser Osmaniyan de şandin û nemaze bi ser herêmên Kurdî de heta ku di sala 1617 'an de gihişt derdora Wanê. Di sala 1623 'an de artêşa Sefewî Bexdad dagir kir, lê Osmaniyan dev ji Bexdadê bernedan û her dem di hewldana vegerandina wê de bûn. Di sala 1638 'an de Muradê Çarem serleşkeriya Kampaniyekê kir û careke din Bexdad ji destê Sefewiyan derxist û dagir kir. Piştî ku Osmanî di şer de bi ser ketin, dewleta Sefewî neçar ma ku daxwaza lihevhatinê bi Osmaniyan re bike û şerê di navbera xwe de rawestînin. Êdî her du aliyan, di sala 1639'an de, li Qesra Şêrîn peymanek muhir kirin. Di encamê de xaka Kurdistanê hat parçekirin.

Ev parçebûn ne tenê fîzîkî û erdnîgarî bû, di heman demê de çandî û ramanî bû jî, ji ber ku parçeyê herî bibandor ê çanda kurdî jê hat qutkirin. Ango mejiyê civaka kurd hat parçekirin.

## Xalên girîng ên hevpeymanê, ev in:

1. Wê dawî li şerê di navbera her du aliyan de bê.
2. Wê Ahiska û Rewanê ji dewleta Sefewiyan re bimînin.
3. Wê Bexdad û Besrayê ji Osmaniyan re bimînin.
4. Wê kelehên wekî Zencîr, Kûtûr, Mako û Mexazberd bên rûxandin.
5. Wê her du alî destêwerdana kar û barên hundirîn ên hev nekin.
6. Wê sînorên her du dewletan her dem weke xwe bimînin.

**Ehmedê Xanî** bandora peymana Qesra Şêrîn a li ser jiyana kurdan bi vê helbestê tîne ziman:

Tasek ji vê ava zelal

Nadim bi hewza Kewserê

Lihevhatina Qesra Şêrîn

Lê nabînim tu meferê

Piştî roja me bû tarî

Mirin xweş e ji emberê.




Kurdistan di encama peymana Qesra Şêrîn de

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima piştî şerê Çaldêranê dewleta Sefewî û Osmanî di nava şer de bûn?
2. Çima Şah Ebas peymana sala 1590'î bi Osmaniyan re muhr kir?
3. Xalên peymana Qesra Şêrîn binivîse.
4. Bandora peymana Qesra Şêrîn li ser gelê Kurd rave bike.

**Lêkolîn:** Peymana Qesra Şêrîn, bû bingehê rêzepeymanan, vê yekê bi mînakan lêkolîn bike.

# Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Iskender + Helenîzim | Roma |
| Cotmeh | Roma û Berxwedana Gelan (1) | Roma û Berxwedana Gelan (2) | Roma û Berxwedana Gelan (3) | Sasanî |
| Mijdar | Mazdek | Islam | Dema Çar Xelîfeyan | Derbasbûna Islamê ya navan Kurdistanê |
| Berfanbar | Emewî | Ebasî | Ebû Muslimê Xoresanî | Tevgerên li dijî Islama dijber (1) |
| Rêbendan | Tevgerên li dijî Islama dijber (2) | Nirxandin | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Tevgerên li dijî Islama dijber (3) | Mîrnişînên Kurd (1) | Mîrnişînên Kurd (2) | Mîrnişînên Kurd (3) |
| Avdar | Selçûqî | Xaçperest | Moxol | Osmanî |
| Cotan | Serhildanên gel li hember Osmaniyan | Sefewî+ Şerên Sefewî û Osmaniyan | Idrîsê Bedlîsî | Keleha Dimdimê |
| Gulan | Qesra Şêrîn | Nirxandin | | |